



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA
AMEDÊ

Kovara Dumehane
Hejmar - 22
Rezber - Kewçer 2008

Xwedî û Bêpîrsiyariya Nivîsaran:
Semra OZBEY

Editor:
Enise Şirin ÇAGER - Azad ZAL

Sererastkirin:
Semra OZBEY - Serwet DENİZ

Mizanpaj û Berg
Enstituya Kurdi ya Amedê

Wêneyê Berga Pêşin:
Mihemed Şêxo

Wêneyê Berga Paşin:
Ahmet Bilge

Şewirmendê Hîqûqê:
Av. Muharrem Erbey

Çapxane:
Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi C
Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan:
Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri
Kayapınar/DIYARBAKIR

Tlf:
(0412) 237 43 16

E-Mail:
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB:
www.kovaraw.com

Şertên Abonetiye:
Nava Welat, salek: 25 YTL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê:
Semra OZBEY
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakir
YTL: 8300 195 27 89
EURO: 8300 071 16 47
USD: 8300 071 16 52

Nimroya Hesabê PTT'ê:
Semra Ozbey - 5426215

■ *Nivîsên ku ji bo
weşanê ji kovarê re
tên şandin, li
xwediyên wan nayên
vegerandin.*

■ *Her nivîskar ji
nivîsa xwe*

NAVEROK

■ Ji Editor.....	2
■ Apê Mûsa / <i>Abdurrahman BAKIR</i>	3
■ Birîna Reş / <i>Arjen ARÎ</i>	6
■ Êvar / <i>Nesrîn NAVDAR</i>	7
■ Ji dîroka Amedê çar rûpelên wendayî / <i>Receb DILDAR</i>	8
■ Destpêka felsefeyê û taybetmendiyên erdnîgariya Îyonyayê / <i>Alî GURDİLÎ</i>	12
■ Kengî mirim / <i>Tewfîq YAŞLI</i>	15
■ Mizgefta Mishefa Reş / <i>Bahadîn ROBAR</i>	16
■ Deştênazê xemrevîna dilê azadîxwazan / <i>Mehmûd Badilî</i>	17
■ Başûrê Biçûk / <i>Rizoyê XERZÎ</i>	19
■ Standardên jiyane / <i>Dorothy Rothschild Parker</i>	20
■ Tol zava ye mirin bûk e / <i>Selmet GULER</i>	24
■ Rotişê yewbanî / <i>Mehmûd NÊŞITE</i>	28
■ Şorê / <i>Ronî WAR</i>	32
■ Tirs / <i>Behlûl ZELAL</i>	33
■ Çiroka evîne / <i>Omer Fîdan</i>	35
■ Niha di koçberiyê de / <i>Mehmûd Derwêş</i>	38
■ Ciwan ji muzîka populer hez dikin / <i>Hevpeyvîn: Sedran C NEWADAR</i>	39
■ Peşkên şeva bilome / <i>Berken BEREH</i>	42
■ Nexşeya min / <i>Îlhamî OZER</i>	43
■ Mastê koçeran / <i>Dilkanî</i>	44
■ Mirad / <i>Mehmet DEVÎREN</i>	45
■ Xatûn / <i>Sîpan XIZAN</i>	46
■ Mistefayê Bohtî û strana "Were Dîne" / <i>Hilmî AKYOL</i>	47
■ Pirtûkxane	80

Dosye:
Evîndarê Gulê
MIHEMED ŞÊXO

■ Destpêk û zelalkirina çend xalan / <i>Azad ZAL - Dîlan AYDIN</i>	50
■ Jiyana Mihemed Şêxo û hunera wî / <i>Îbrahîm EBDÎ û Mişelê OSMAN</i>	53
■ Stran sînoran nas nakin / <i>Qado ŞÊRÎN</i>	57
■ Mamosteyê ola Îslamê û hunermendê gelê xwe; Mihemed Şêxo / <i>Îkram Balekanî</i>	61
■ Kurtejiyana Mihemed Şêxo / <i>Sedran C. NEWADAR</i>	63
■ Mihemed Şêxo û hîlbijartina gotinan / <i>Konê Reş</i>	66
■ Dema bilbil bo gulê dixwîne Bavê Felek tê bîra mirov / <i>Tayîp TEMEL</i>	67
■ Nefela çarpel / <i>Rêwar Evîndar</i>	68
■ Hevpeyvîn bi kurê Mihemed Şêxo Birûsk re / <i>Hevpeyvîn: Mustafa Gazî</i>	69
■ Nameya Mihemed Şêxo ya destnivîskî / <i>M. Xelef - S. F. Moctevî</i>	71
■ Nalîna axa bi şewat; Mihemed Şêxo / <i>Mehdî Mutlu</i>	72
■ Awaza evîndarî û dengê yekîtiyê Mihemed Şêxo / <i>Mizgîn DÎLAN</i>	73
■ Xwedîderketina li miriyan / <i>Rizoyê Xerzî</i>	75
■ Çend stranên Mihemed Şêxo digel notayan / <i>Amadekar: Sedran C. NEWADAR</i>	76

Ji edîtor...

Xwendevanên hêja û delal,

Di havîna îsal a germ û xelabarî de em bi hejmareke din a Kovara W(e) li pêşberî we ne.

Gelî xwendevanan,

Dîsa jî em bi dosyeyeke xweser û taybet dertên hemberî we. Me di vê hejmarê de mijara dosyeya xwe Bavê Felekê hunermendê me yê nemir Mihemed Şêxo hîlbijart.

Gelek alim, hunermend, nivîskarên hêja û delal ji nava kurdan rabûne. Lê kurd li wan kesan xwedî derneketine, heta dema ku jiyana xwe ji dest dane, ji aliyê xelkên din ve hatine payebilindkirin û xwedî li wan hatiye derketin; paşê wekî ku hişê kurdan hatibe serê wan hêna xwestine li wan xwedî derkevin. Yek ji wan kesên ku di jiyana xwe de qedr û qîmet nedîtiye nemir Mihemed Şêxo ye. Mihemed Şêxoyê ku di jiyana xwe de her tim derdê feqîrî û hejariyê kişandiye; bi halê xwe yê belengaz zor û zextên neyaran li ser xwe dîtiye û her li ber xwe daye. Lê heta ku li ser rûyê dinyayê jiyaye kes lê xwedî derneketiye. Lê piştî ku li “Nexweşxaneyê Dewletê Ya Sûriyeyê” jiyana xwe ji dest daye bi deh-hezaran kes li hev civiyane û darbesta Mihemed Şêxo dane ser milê xwe û ew verê kirine. Nêzî bîst salan e ku wî wefat kiriye. Me jî xwest ku em dîsa wî bi bîr bînin.

Her wiha ji derveyê dosyeyê çîrok, werger, pexşan û helbestên balkêş di vê hejmarê de cihê xwe girtine.

Xwendevanên hêja,

Divê ku em vê yekê jî bibêjin, gelek nivîs û helbest hatine ber destê me, lê mixabin ji ber ku rûpelên kovarê bi sînor in, me hinek berhemên ku hatine hişt ji hejmarên paşê re. Bi vê bal û eleqeya nivîskar û helbestvanên me em gelek kêfxweş û bextewar in.

Di hejmara beriya niha de ji bo Kovara Wyê Zana Farqînî bi Aramê Dîkran re hevpeyvînek pêk anîbû. Di vê hevpeyvînê de navên gundan çewt hatine nivîsandin. Navê gundê “Bamdê” wek “Bamda” navên gundên Farqînê “Tewerz” û “Zinzin”ê jî bi dorê mîna “Tawernê” û “Zimzimê” hatine nivîsandin. Em van çewtîyan sererast dikin û ji xwendevanan lêborînê dixwazin.

Heta hejmareke din bimînin di xweşiyê de....

Apê Mûsa

Abdûrrahman BAKIR

Apê me, kalê me, rênîş û pêşengê me, karker û feylesofê me, Apê Mûsa; ku navê te tê gotin mirov nizane qala kîjan aliyê te bike. Tu ew qas piralî bûyî ku her aliyekî te ji aliyê te yê dîtir wêdetir bû. Ew hemû bedewî û xweşikiya te wê rojê ji nav me birin.

Va ye dîsa ew roja ku dilê me şewitand hat. Di ser wê rojê re 16 sal derbas bûn. 16 sal e kezeba me dişewite. Ew şewat hê bi wê germahiya xwe ya wê rojê didome. Nizanim wê ew roj kezeba çend nîfşên din bişewitîne. Wisa dixuyê ku wê her kezeba me bişewite.

Piralîbûna Apê Mûsa, bandora xwe li her çîn û civatan dikir. Wî di jiyane de pêdivî û tîkiliyên mirovan bi çi hene û di derbarê wan de divê mirov xwedî çi xisletan be, şîrove dikir û rê nîşanî mirov û civatê dida.

Ew di warê şarezatîyê de, di asta herî bilind de bû. Ew di warê ramyariyê de tîgihîştî bû. Ew di warê hawirdorparêziyê de tîr û tije bû. Ew hevalbendê zarokan bû. Ew rêhavalê jin û mezinan bû. Bi kurtasî bi zarokan re zarok û bi mezinan re mezin bû.

Wî, qet serê xwe li ber pêkûtî û zordariyê netewand. Ew ji ya xwe nema. Her tim ji bo rastiyê û aştiyê temî û derzî li pergala berpirsiyaran dikir û didan. Ji bo kar û barên civakî mînakên balkêş û watedar didan ber me. Da ku em riya rast bibînin û jiyaneke bi rûmet bijîn. Têkoşerekî bêhempa bû. Ez bawer im ku şert û merc hebûna wî yê wek pêşengê hîndûyan Gandî, bida pêşiya gelê xwe û wî yê di warê demokratîkbûnê de neqebek vekira û wê neqebek olîgarşîk ji bixitimanda. Apê Mûsa Ghandiyê kurdan bû.



Mirin hene bêtî çend kesan tu kes pê nahesin, mirin hene netewe heta dugel pê dihesin. Û her wiha ew mirin êşek mezin dide der û dora xwe. Ew mirin wî kesî zêdetir dide jiyandin. Apê Mûsa jî yek ji wan kesên nemir e. Jixwe ew di nav gelê kurd de wê her nemir bimîne. Ya rast, gotin tîrî pênasandina Apê Mûsa nakin.

Em ê ji nivîs û bîranînên wî hinekan li vir rêz bikin, ka ji me re çi gotiye. Da ku hişê me hê zindîtir bibe. Da ku em zêdetir bibin xwedî feraseteke mirovî û pêşverû. Da ku em wî zêdetir fam bikin.

Ew di jiyane de her tim pîr û pak bû. Dîlpakiya wî û xweşgotinên wî di jiyana wî ya rojane de xwe didan der. Her wiha ji aliyê fîzîkî ve jî her tim wek gulekê bû. Wî cil û bergên rojavayî li xwe dikirin. Sedamên vî yekê bi dîrokê ve girêdayî ne. Di nava malê de jî xeml û tîştinên entîke û bedew bi cih dikirin.

Apê Mûsa jî bo şarezatîyê û kesên tîgihîştî di quncikê xwe yê bi navê "Tîr" de, di sala 1992'yan de bi sernivîsa "Xwendin" wiha dibêje:

"Tîştin hene însan hîne wî dibe. Wek cixarê,

wek vexwarinê, wek tolaziyê, wek daheva mal û milk, lê ez yeqîn dikim ji însên re hînbûna herî bi fêde xwendin e. Pêşî belkî xwendin bi meriv ne xweş be ev ên din jî wiha ne. Lê ku meriv dom bike û xwendin bi meriv xwe bide êdin hew meriv dikare berde. Lê de îca xwendin jî ji kitêban e û kitêb jî şekil şekil in. Ji van kitêban a qenc ew e ku mirov xwe bielimîne kitêbên bi fêde û hêja. Herçî eşka însanan di tarîxê de ye ya hinka di felsefê de ye heta ya hinekan di romanên sivikî eşqê de ye. Lê ya baş ew e ku bi xortanî xwe bielimîne kitêbên ilmî û bi fêde. Îro kitêb fêrbûn e emrê mirov têrê nake ku mirov hemû kitêban bixwîne ya bi aqilî ew e ku mirov çavên kitêban bixwîne. Yanê bi kurdî dibên deqê kitêban. Salê mirov deh kitêbên baş bixwîne 50 salî dibe 500 kitêb ew jî besî mirov e.Talî xwendin hîmê zaneyiyê ye. Îro û berê jî kîjan miletê xwendevan li pêş in û meqbûl in....."

Apê Mûsa ji bo hezkirina welêt xwedî feraseteke hûr û kûr bû. Eşqa welêt her di dilê wî de bû. Wî di her derê de jiyana û çanda Kurdistanî dijiya. Jixwe ku hezkirin tune be ew tişt bê nîrx e û bêkêr e. Wî di nivîseke xwe de wiha digot:

"Însan, ku eşqa welatê wî pê re tune be ji heywanan jî li jêrtir e. Çima? Carna gundek (gundiyeke) ji gundekî (gundiyeke) din kerekî an jî çêlekekê, gaki (gayekî) dikire, te di ew heywan ku filitî, direve dere gundê xwe.

Ê ma lawo, tirkino ma em wek ker û çêlekan jî nayên. Yanê hûn li Nisêbînê, Cizîrê, Kercewsê, Şernexê û li Kurdistanê tevde nevi û zarokên me bikujin û em ê bînin 'vatan, vatan ve milletin bölünmez bütünlüğü' Çawa hûn vê ji me dixwazin? Kurdê ku wek we bêje, ez jî tevî; nelet li bavê wî be.

.....Ê din kurd agirê Newrozê nema bi hejkan, lastikan û mûman pêdixin, bi canê xwe pêdixin. Ma hûn nabînin li Îzmîrê, li welatê Yewnanan keçika Kurdistanê û 15 salî ji gundê Nisêbînê Bizgûrê Rahşan Demîrel ji ber zilma hikûmeta faşîst xwe şewitand û hûn zanin temiya wê çi ye. Di nav rivînê de tiliyên xwe vekirine destê xwe hildaye û gotiye: Îca bila agirê Newrozê hew vemire....."

Apê Mûsa rewşa kurdan û derdorên wan rarûyî hev dikir û bi gotinên watedar û kenokî

ji me re wiha radigihand.

"....Feqîrekî gelek spehî û henekçî hebû. Bi kurdî ji kesên wiha re dibên qirikbaz, yan ji qirika wî li ser gazeke ye. Bê henek bejna Kerîmê dirêj spehî bû. Axayê eşîra Omerîyan Evdilê Silêman jî wek kerîm bû. Ew jî bejin dirêj û qirika wî li ser gazeke bû. Rojekê Kerîm ji min re got: 'Şêxo, te xiyala xwe daye xelkê' Min got çawa Ebdulkerîm? Go: Kurro xwedê mal nedaye min, lê ev bejn û stûyê xweşik daye min. Îca kes nabêje qirika Kerîm li ser gazeke ye û spehî ye, dibên qerabê stuyê Kerîm!! Yê Evdilê Slêman jî wek yê min e û belkî bi qasî yê min dirêj û spehî jî nabe lê ji bo ku ew axa ye, dibên yabo qirika Evdilê Slêman li ser gazeke ye.'

Ez dinêrim yê milletan jî wiha ne û di jîna milletan de jî em wek Kerîm in.Pirseke Siwêrekiyan heye. Eşqa Siwêrekiya hebekî di pesinandina xwe de ye. Hevalekî me yî Siwêrekî hebû hingî qala xwe dikir û xwe dipesinand. Me digot lawo şerm e kurro tu xwe gelekî dipesinî. Wî digot ma ku ez xwe nepesinînim xelk lawê bavê min in, min bipesinînin.

.....Lê ez niha dinêrim ku xebera wî ye. Divê em kurd li benda xelkê nemînin, kes lawê bavê me tune. Pirseka pêşîyan heye: 'Şeb û Şekir çû Diyarbekir, şekir rûnişt deng nekir, şebê rabû pesnê xwe kir.' Tê zanîn şekir şîrîn e, şeb tal û tîrş e û bêtam e."

Kalê me, çinara me hezkêrê xwezayê bû jî. Wî xwe ji karê ku bihata kirin berpirsiyar didît. Wî li der û dora xwe dar û kulîlik diçandin. Bi reng û bêhna wan dilê mirovan pê xweş dibû. Wek zanibe ku em ê jê re bibêjin "Çinara Me" di sala 1951'an de dara çinarê li gundê xwe li ber mala xwe diçine.

Apê Mûsa şoreşgerek bû. Li her derê jiyana şoreşgerekî didomand. Li zîndanê her diafirand. Nivîs û pêkenokên wî bi qasî du pirtûkan dagirin hebûn. Apê Mûsa wiha dibêje: "Min ê ew nivîs û pêkenok bi kurdî biweşandina. Lê malxiraban nivîs ji min girtin û ji destên min derketin." Wî bi tevahî hebûn û dahatûya xwe bi heval û hogirên xwe re parve dikir. Nema xwendevan xwedî kirin û nema karkerên birçîmayî hewandine û zikê wan têr kirine û ew bi cil û berg kirine.

Li ser hesreta welêt jî bîranîneke Apê Mûsa heye.

"Ma kurdan li ser welatê xwe çî nekirine û çî negotine? Lê çî fêde... Wek Seydayê Cîgerxwîn dibêje:

Welatê me tev zîv û zêr e.

Lê çî bikim maye ji xelkê re

Faîk Bûcak jî li ser welêt wiha dibêje:

Sonda me mirin e di riya te de welat

Kefen kirasê me ye mirin xeml û xelat.

Em ji sala 1915'an re dibêjin 'sala mihaciriyê' Lê bi rastî em tim li welatê xwe mihacir in.

...Ez sala mihaciriyê çêbûme. Paşî ku ez bûm şeş, heft salî jî hê mihacir li gundê me hebûn. Hesenê Mihacir cotkarê me bû. Ji gundekî Bedlîsê bû. Carna Heseno eşqa welatê xwe bi stran digot. Erê stran bi temamî ne di bîra min de ye. Ev heftê sal derbas bûn. Lê serê strana wî wiha bû:

Welat çiya bilind in te nabînim

Dest davêr gul û beybûnan naciwînim

Welat, welato, welato

Bimirim li welatê xerîbiyê.

...Keş û xortên kurdan ma ez ji we re çî dirêj bikim. Gerek hûn zanibin, dayîka bi rastî welat e."

Apê Mûsa her tim bi berpirsiyarî tevdişîya. Her wiha dixwest der û dorên wî jî bi berpirsiyarî tevbigerin. Ji ber vê yekê gelekî serê xwe diêşand. Ew şervanê aştiyê bû. Lihevanîn û bi hev re parvekirin ji bo wî tiştinên jêneger bûn. Ma ne ji bo vê yekê hat şehîdkirin. Ku ji bo navbeynkariyê hatibû Amedê û li wî bajarê ku ew qas jê hez dikir çavên xwe ji jiyane re girtin. Hezkirina wî ya ji Amedê di tîkiliya di navbera wî û neviyê wî yê bi navê Bahoz de diyar dibe. Ew her tim ji neviyê xwe re strana "lê Amedê Amedê" dibêje. Wekî din jî di derbarê Amedê de gelek pesinandinê Apê Mûsa hene. Ma ew jî ne mafdar e. Ma kî pesnê Amedê nade? Ka kî ji bajarê Amedê xeyîdiye? Mirovan di wî bajarê de jiyar, can, mal û milkê xwe dan. Lê dîsa ji

kes ji wî bajarê nexeyîdî. Ew ji bo berpirsiyariyekê bi cih bîne hatibû Amadê.

Derbarê berpirsiyariyê de Sokratesê Kurd nemir Apê Mûsa di cotmeha sala 1992'yan de di rojnameya "Welat" de wiha dibêje:

Di sala 1951'ê de ez çûm gund, min çinarek çand. Niha bûye du metro û nîv qalind û 50,60 metro jî bilind bûye. Jixwe min divê ez tirba xwe di bin de çêkim. Wê salê min nêrî ku terhik (şax) ji ber çûye. Hecî Mahmûdê Stililê bangê min kir û got: 'Şêxo wer ez tiştêkê pêş te bikim. Ez çûm. Mahmûd ew terhik pêş min kir û got: "Tu zanî çî hat bîra min? Min got: Çî hat bîra te?" got: "Ez dibêjim tu wek vê çinarê yî û ew telebên me yê li çolê wek vê terhikê ne, ji ber te çûne." Ez keniyam, min xwe da wî alî û wî alî lê min nêrî ku xebera wî ye. Îca ez terhik ji ber kîjan çinarê çêbûme? Ew çinar niha hişk bûne. Ez mame. Dibe ku ez jî hişk bibim, terha ku ji ber min çûye bibe çinar. Ez ji ber Cegerxwîn çûm, ji ber Celadet Bedirxan û yê din.

Niha li dinyayê agirê olîmpiyadê heye. Dibêjin berê di Yewnana qedîm de lîstîkek wan hebû. Agir pêdixistin, xort dibezîyan, xortekî agir dida destê yê din. Bi wî awahî bi hezaran xort ew çira didan destê hev û heta ku bigihana Akrepola armanca xwe.

Îşê miletan jî wiha ye. Yek nikare ji cihê cih meşalê bigihîne Akrepolê.....

Ez vê tînim ser doza Kurdan, kesê ku tiştêk jê nayê tune ye. Ji piya, rûniştî, razayî û bi çavan. Ên ku ew hemû ji wan nayê, karin dia bikin. Lê xayîntî nabe. Dibe, wek yekî ku bi çavan jî limêj neke, lê kufiriya bike. Îca ew jî dibe kafir. Êh di temamê dînan de jî qetla kafiran helal e.

Şêwirmendê me, em aniha bi nivîs û bîranînên te dişewirin. Ew her ji me re rênîş in. Em hewl didin daxwaz û dilnên te pêk bînin. Em xeberekê ji te re radigihînin. Em ji do xurtir in û bi hêztir in. Ez bawer im tu yê bi vî agahiyê kêfxweş bibî. Mekan û cihwarê te bihuşt be.

Birîna Reş*

Arjen ARÎ

Di wextekî ku lehengên çîrok û çîrvanokan: dêwên heftserî, merivên ku ferên aşan bi lingên wan ve, mêrxasên ku bi şûr û mertalên xwe zihê (mar) dikuştin, dîkê ku seba libek dahn diçû şerê pîra dudiran... Şûna xwe dan lehengên civakî; û pê re hizr û xeyal jî weke zarokên bi pêyaketi xwe spartin dîwarê jîyanê, rojeke zivistanê leqayî navê wî bûm: Mûsa Anter!

Wê rojê li Taxa Qijlê** kurtepiştek belav bûbû: Îro esker dê têkeve nava bajêr û ketûber wê her malê saxtî bike!

Piştî ku ev xeber li taxê belav bû û ji devê cîranan gihîşt guhê pîra min, pîrê weke şivanê ku bixwaze miyê ji ber devê gur birevîne, li yek tûşê berê xwe da dêya min: 'Keçê, Wesîla!... Ew kitêba ku Mihemed Nezîr carinan dixwîne û paşê ji te re dibêje veşêre, li ku ye?'

Dêya min a ku destê wê di nava hevîr de, bêtî ku bibêje çima, bo çi, mîna ku wê jî pêjna xeterê kiribe, got, 'di kulînê de di ber guhikê balgihê me de ye, jinapê!'

Jinapê, hê gotina Wesîla di dev de, yekser berê xwe da kulînê. Piştî du sê carên destpelandinê, pîrê bi ser tiştê ku lê digeriya vebû û mîna ku bixwaze bê çi ye, qulipand bi wî alî û bi wî alî de. Pîra ku bi nêrînê tiştek ji kitêba di dest de bi dest nexist, hat hat, di ser serê sobeyê re mîna cendirmeyekî tirk, çik sekinî.

Agirê sobeya êzingên ji siharê de vêketî ne har bû; ne jî sik î sar... Dîsa ji bo ku destê wê neşewite, pîrê bi derdawa kirasê xwe qelpaxa



sobeyê ji ser dev da alî û kitêba di destê xwe de, kitêba mîna cawê riziwayî bo ku ji hev veçire li mahneyekê, kir du sê perçe û avêt nava sobeyê.

Agirê li ber sarbûnê bi dîtina pelên ziwa û zerîrî yê pirtûkê re mîna pisîkê li ber mişk veqelizî, zimanê xwe dirêjî rûpelkên pirtûka reben kir... Û bi gurgîna ewil re pirtûk da ber zimanê xwe yê agirîn, yê ku qurmê darberûyan di kêlikê de dikir komir û rijî.

Pîra di ser serê sobeyê re çik rawestiyayî, mîna dijminê ku dijminê xwe avêtibe nava agirê dogehê, heta çirkîna çirûska dawîn jî li agirê bi bedena kitêbê ketî, nêrî. Piştî ku dît tev bû qijik û piçek reşî li şûnê ma, devê sobeya ku bêhna kizûriya kaxetê li hundir belav kiribû, girt; bi bêhnferehî hilma xwe stend û berda, destê xwe yê rastê dirêjî derdawên kirasê xwe kir û ji ber sobeyê weke ku bi hêla bûka xwe de bifetile berê xwe dagerand û got, 'Wesîla... Ji Mihemed Nezîr re bibêje, dêya te kitêb avet sobeyê!'

Bûka ku hêjî destê xwe di avê de dikir û hevîrê di testê de distira, mîna ku bibêje, 'ma ne te kiriye, tu bibêje' serê xwe hil kir, tibabekî

wisa sekinî û bêdeng ma. Piştî ku bi devzendika xwe ya hildayî di ser bêvila xwe re bir û anî, dîsa ket ser ruhê hevîrê ku hê stiran diviya...

Piştî banga esrê, esker weke garana ku li nava gund biqelibe, li nava taxê belav bibû; ji malekê derdiketin, diketin mala din.

Dema ku li deriyê hewşê dan û bê destûr ketin hundirê hewşê, xirepiş û şildimbildima wan digihîşt heta Taxa Tirkan.***

Baş bû ku muxtarê mihelê Cemîlê Qetfo bi wan re bû.

Ez ê ku diçûm pola çaran û min bi tirkî zanibû; hatina esker ricfek di hinavên min de peyda kiribû û wê bêhnîkê kiribû ku ez tevî tirkî zimanê xwe jî bi bîr bikim.

Axir; piştî şildimbildimeke dûdirêj û erêkirina muxtar, serleşker têgihîşt ku zilam li mal nîn in. Lê pîrika min a ku tevî şerê Elîk bûbû her serê kêlîkekê berê xwe dida muxtêr û yê serleşker û digot' yoxxx yox!' Lê kesekî guh nedida gotinên pîrê: Eskerên di hewşê de, bi serpozken potinên xwe û qesetûreyên tivingan loda qirşikên li ber diwar û kaya di kisan de li bin sifirneyê li ser hev, yek bi yek didan ber devê qesetûreyan.

Piştî ku leşker ji hewşê vekîşîyan û berê xwe dan malên din, dêya min a ku destekî wê li ser dilê wê, mîna ku şewitandina kitêbê nû nû ketibe bîrê, bi dengêkî heyîrî got:

- Te dit, jinapê? Nehatin hundir jî... Te kitêbka reben avêt nava agir?

Pîrê, qet guh neda gotinên bûka xwe.

Mîna ku bixwaze xwe ji gunehê şewitandina kitêbê dawêşîne, li bûkê nêrî û bi keser got, 'erê qîza min... Xuya ye te ji bîr kiriye, bê li gund çi anîn serê me...'

Li ser van gotinên pîrê, dêya min di ber xwe de weha biland:

-Her û wer kitêbek bû... Mihemed Nezîr digot a Mûsa Anter e! (17/08/08 / Amed)

*Navê pirtûka Mûsa Anter

**Navê taxeke Nisêbînê

***Taxeke din a heman navçeyê

Êvar

Nesrîn NAVDAR

Va ye dîsa êvar hat!

Her êvarê,

çavên min dibin du golên birîndar
û stêrk yeko yeko tê de dixeniqin.

Va ye tarîtiya xemavis,

di dengê mehîna te ya qer de dihêrîne
û strana veqetînê bi dêmekî zer
li ser pahîzoka lêvan difirfire.

Gelo ev êvar, di dilê çend evîndaran de
birînek xwînari ye?

Û qîşama cerga çend dayikan e?

Dema êvar tê...

Kundê bêyom

ji reqsa hêstirên min re li çepikan dide!

Lê dema ku li derdorê

bêhna te were rabihîstin.

Xunaviya baraneke şîn,

bi desmala ji bahê çiyayî

hêstirên min zuha dike!

Wê demê stêrk bi geşbûnî,

çavên xwe ji bajarê min re dişkînin.

Dema tu ji êvarên min re dibî

findeke şewqsor.

Tirsnaqiya min a êvaran

di nav de dişewite.

Va ye dîsa êvar hat...

Û tu nehatî!

Kund dîsa li çepikan dide,

tarîtiya çavreş di guhê min de dihêrîne.

Û hawara stêrkan e!

04/07/2008

Ji dîroka Amedê çar rûpelên wendayî

Receb DILDAR

Pêr

Li keviyên Dîjleyê guleke sor bişkuvî

Roja ku hûriyan li dora Girê Gilover hîmên qerase amade kirin û asasê Kelaya Amedê sererast kirin, ez li pala Çiyayên Çilsiwaran kulîlkeke hîroyê bûm ku keskesor ji rengên min didexisîn. Wê gavê li ezmanê Amedê stêrkeke biçûk hebû. Tîrêjên wê bi zorê digihîştin ser Çemê Dîjleyê, di şevên reş û tarî de li ser golên şivanan hûrik hûrik diçirisîn.

Welat; di nav xêr û bereketê de bû. Şîlan li dû hevdu rêz dibûn. Ceh û genim di ser kewaran re diqelibîn. Keriyan peş di nav germistan û zozanan de diçûn û dihatin. Goştê berxan ji ser lengeriyên savarê kêman nedibûn. Kêf û şahî ji dû hev nediqetiyên. Di nav wê xêr û bereketê de Kelaya Amedê her roj bilindtir dibû û bi bilindbûnê re stêrka li ezmanê Amedê mezintir dibû. Birqa wê stêrka bi şewq û şemal li ser gund û bajarokên dora Amedê belav dibû.

Piştî ku hostayan, kevirê şehkirî yê dawîn li ser birca kelayê bi cih kirin, demsal bi ser biharê ve qelibibû. Rîspiyan diwan gerandin û fermana wan wek pêlên Gola Hezarê hêdî hêdî li dora xwe fireh bûn û gihîştin qonaxên dûr. “Çarşema serê nîsanê roja şahiya me ye, hatina dostan kêfxweşiya me ye.”

Di berbanga wê roja çarşemê de, xelkê Amedê li ser zinarên Dîjleyê li hev kom bûn, berê xwe dan rojhilat û li benda tîrêjên rojê yên pêşîn sekinîn. Pêşiyê ji bo hemû insan û ruhberan, paşê jî ji bo xwe û bajarên xwe dua kirin. Bi dengê muzîkê re, qor bi qor govend gerandin. Gewriyên ku ziwa bûbûn şerbikên şeraba sor dest bi dest gerandin. Piştî ziyafetê, mezin û rîspiyan di diwanxaneyên fireh de dem borandin. Keç û xort bi hev ketin û hêdî

hêdî xwe bera nav baxçeyên ber çem dan. Gul û kulîlkên sor bi destên xortên evîndar dirêjî nav biskên keçên nazenîn bûn.

Bi şev li ser bircan rêz bi rêz masîcanik hatin vêxistin, agirên serên çirayan di nav ava Dîjleyê de, di nav reqseke lertzok de diçûn û dihatin. Stêrka Amedê di nav ezmanê bêdawî de pir mezin xuya dikir. Ew stêrk, bi rojê re diket qayişê û hinekan digotin stêrka Amedê roja pîroz bi xwe ye. Amed di nav bajaran de bûbû guleke sor û deng û rengê wê li çar aliyên belav bûbû.

Ez wê demê li pala Çiyayên Çilsiwaran kulîlkeke hîroyê bûm, rengê min û rewşa Amedê pir li hev dihatin. Her cara ku şahiyek çêbibûya, min jî bejna xwe ya zirav li ber sivikbayekî hêdî hêdî dihejand û bêhnên xweş bi ser Amedê ve direşand. Ez rengê Amedê bûm. Keç û bûk bi rengên min dixemilîn, şahî bi rengên min xweş dibûn. Em her du bi hev re gelek bextiyar bûn. Li ser bircên Amedê seranser tovên kulîlka hîroyê reşandibûn. Di biharan de ser bedenên Amedê seranser keskesor bûn. Wê demê Amed bi rengên kulîlka hîroyê şa dibû.

Amed seranser kulîlk, seranser reng bûn.

Do

Bajarê talanê

Gava hov bi hev ketin û bi ser Amedê ve beziyan, ez li Qerejdaxê di destê şivanekî evîndar de bilûreke ji dara gûzê bûm. Şivanê evîndar, ji dil lêdixist û dengê min ê zîz ji zozanê Qerejdaxê, tev li xuşîna avên zelal dibû û bi ser Keleha Amedê ve belav dibû. Gava ewrên reş li ser Keleha Amedê civiyan û tîrêjên rojê êdî şewqa xwe nedan avahiyên Amedê, xemgînî di nav tiliyên şivan û dara

bilûrê de bûn lorîneke dilşewat û li ser bircên kelehê geriyan. Xemgîniya rojên reş. Rojên şewat û mirinê. Ji wê rojê de ye, stêrka ku li ezmanê Amedê dibiriqî tefiya. Wek zarokeke ku bixeyide, di quncikekî tarî de xwe quncirand ser hev û xwe da benda wê rojê, roja ku wê ji nû ve bibirique.

Dewlemendiya ku ji xêr û bereketa Hîvîka Zêrîn dipijiqî, bala der û dorê dikişand. Talankerên ku bêhna penêrê helandî û rûnê nivîşk girtibûn, hêdî hêdî xwe ber bi keriyên pez ve dikişandin. Birçiyên ku qurequra zik ji xwe re kiribûn lorîk û pê radizan xwe ber bi kewarên ceh û genim ve dikişandin. Xwe li kodikên tijî digirtin û dihatin. Ne yek, ne sed, ne hezar bi deh hezaran bê serî dihatin. Kodikên vala li kodikên tijî dixistin û dihatin. Mîna kûçikên ku bêhna berateyan stendibin, qefle bi qefle dihatin. Mîna berazên ku kudikên xwe wenda kiribin kerî bi kerî, col bi col dihatin. Mîna roviyên ku xwe li çaroxan digirin bi dek û dolaban, bi konetî dihatin.

Ji Asyaya Navîn çavnûtik, ji ber birçîbûnê direviyan, xwîna xwe xistibûn çavên xwe, bê hiş dihatin. Ji rojava, xwînrijên ewrûpî ji bo avahiyên xwe bilindtir bikin, bi hêviya zîv û zêran dihatin. Zalimên rojhelat, ji bo xurekên teze li filên xwe siwar dibûn û tev li agirên xwe dihatin. Ji çolistanên başûr, pêxwas bi îmanê teze bi hev ketibûn, ji bo talanên qelew dihatin. Dihatin û dihatin, ji ciyên nêz dihatin, ji ciyên dûr dihatin. Çermzer dihatin, çermreş dihatin, peya dihatin, siwar dihatin. Hinek wek garana dewaran bi bêhna fireh dihatin, leza hinekan hebû bi bayê bezê dihatin. Bi şûr û rîman, bi top û tifingan dihatin. Ji bo milkên bav û kalan, girêz ji devê wan diherikî û dihatin. Ji bo qirkirin û kuştinê dihatin.

Talan yekcarî bûn, çi bi dest biketa. Pir kes mirin, zîlamên ku li ser pêyan disekinîn tev de mirin. Pir kes birin, keş û bûkên ciwan tev de birin. Dîrok û rûmeta me birin, kitêbên me bi barên deveyan birin. Birin û birin. Sitûna konşikestibû, konê zilmê bi ser Amedê ve hatibû xwarê.

Yên filitîn xwe spartin çiyayên bilind, ji wê

rojê û heta îro.

Wê gavê ez li Çiyayê Qerejdaxê di destê şivanekî evîndar de bilûreke ji dara gûzê bûm. Her talanek bû xencerek di nav singê min de û her qetlîamek bû derzek di nav hestiyên min de. Êş û janên dilşewat, dengê min dîl girtibûn. Ma ji dilekî agirpêketî, xêncî şewatê wê çi bipekiya? Jan û şewat bûbûn deng û ji kezebên peritî bi ser tifikên hilweşiyayî ve diherikîn. Talan û kuştinan wek du evîndarên bihesret xwe li hev dilefandin û bi ser zimanên dengbêjan diketin. Awazên dengbêjan bi dengê bilûrê re bûbûn destbirak û tifik bi tifik, mal bi mal digeriyan. Kilamên dengbêjan û dengên bilûran li bin konên eşîran sing dikutan erdê û hêviyên qurmiçî av didan.

Reng hemû şewitibûn û keskesor hilweşiyabûn. Rengê heyî reş û spî bûn. Reş ê şîniyan, spî yê miriyan bû. Roj roja dengên bû. Dengê min bûbû hevalê dilên birîndar û birîn dikewandin. Dengê min bûbû hevalê dilên evîndar û kevir bi kevir digihîşt bircên Amedê. Amed bi dengên şiyar dibû, bi dengên radiza. Li ezmanê Amedê govenda dengên digeriya.

Amed seranser awaz, seranser deng bû.

Îroj

Ji demê xwîn diniquite

Ji demê xwîn diniquite

Peyker sor dibe, meydan di nav xwînê de dimîne

Ji axê xwîn diniquite

Sirûd sor dibe, bajar di nav xwînê de dimîne

Ji dîrokê xwîn diniquite

Sêdar sor dibe, azadî di nav xwînê de dimîne

Ji alayê xwîn diniquite

Ferman sor dibe, welat di nav xwînê de dimîne

Ez îroj di destê sairekî Amedî de qelemeke

ripîreş im û bi dû dengê bilûra ji darê gûzê ketime. Dengê bilûra ku ez dîl girtime. Dengê bilûra ku êş û jan jê diherikin. Dengê bilûra ku şewatên talanan jê diherikin. Dengê bilûra ku xwîn jê diherike.

Ez di nav dengê bilûrê de bi dû peyvên veşartî ketime. Ez di nav peyvên veşartî de bi dû dîrokeke nejiyayî ketime. Ez wan yeko yeko dineqînîm û rist bi rist, malik bi malik li ser kaxizan datînim.

Ez îro, li bajarê Amedê qelemeke ripîreş im û di destê şairekî cegerxwîn de dinalim. Bi eslê xwe ez dildar im, dildarê rengên kulîlka hîroyê, dildarê evînên sermest im. Dixwazim helbestên ku dîl bi dîl dihesîne lêbikim, helbestên ku her serê sibeyê bi tîrêjên rojê re, wek pinpinîkan bi hev dikevin û li ser kulîlkên hîroyê yeko yeko datînin, lêbikim. Dixwazim awirên çavên xezalî yên xemrevîn lêbikim. Lê dayik rê li min dibirin, dayikên ku kezebên wan bi tu avî sar nabin. Dayikên ku li ber dilên xwe di şûna zarokan de kêlên bêcan dilorînin. Dayikên ku çavên wan li ser rêyan diqerimin, dayikên ku li ber derê zîndanên emrekî dibihurînin.

Ez îro li bajarê Amedê qelemeke ripîreş im û di destê şairekî dilbirîn de diwestim. Bi dû stêrka ku êdî li ezmanê bajarê min nabirîqe ketime. Bi dû kewandina dilên bi êş û jan ketime. Lê bi eslê xwe ez dildar im. Dildarê tava hîvê me ku di bîbikên dîlberêke lêvşêrîn de diçirise. Dildarê newayên bêdeng im ku di nav çavên du evîndaran de diqerise. Lê ji bo binivîsim xwîn rê nade min. Xwîna ku êdî nagihîje dîl. Xwîna keçên ciwan ku bi keçaniya xwe nehesiyane, xwîna xortên ciwan ku bi simbelên xwe nehesiyane. Xwîna rewşenbîrên welat ku li dû hêviyan dibeziyan. Xwîna zarokên berşîr ku di mirinê de jî dikeniyar.

Ez îro li bajarê Amedê qelemeke ripîreş im û di destê şairekî hejar de bêgav im. Lê bi eslê xwe ez dildar im. Min dixwest, rengên kulîlka hîroyê li helbestan bar bikim û di nav kenên keçikeke biskbadayî de wenda bikim. Min dixwest, damarên min bi evîneke hejdesalî germ bibin û dîl û çavên min di nav dijiwariya

evîneke çavnebar de gêj bibin. Lê nalînên xizanan li min dilefin û qîrînên hefsiyên min kerr dikin. Xizanên ku hêviyên xwe di Zinarê Fîsê werkirine. Hefsiyên ku di zindanan kor û tarî de jiyan ji bîr kirine.

Û li kuçe û kolanên Amedê dengê zarokan dor li min digirin û radipêçin. Zarokên ku bi sondên nîjadperest ji xewên şêrîn hildipekin. Zarokên mezlûm û bêguneh. Û ez bi vî dilê birîndar, tev li helbestên ku pişt li wan tewiyane xwe derî bi derî li Keleha Amedê diqelibînim, keleha ku ji helbestên min re bûye zindan.

Reng tarî bûne, deng wenda bûne. Aniha helbest li ser Amedê dibarin, helbestên ku xwîn jê diherikin.

Sibê

Bajarê evînê

Wê serê sibeya ku alayên azadiyê li ser her çar deriyên bedena Amedê û bircên bilind li ba dibûn, ez li ezmanê Amedê kevokeke şîn bûm û li çar aliyên bajêr di nav refên xwe de bi kêf û şahî difiriyam. Wê serê sibê, gava roj hilat, ji ber ku li ser bircên Amedê gelek roj dibiriqîn, roja mezin dexisî û şewqa xwe zêdetir kir. Kevirên bedena reş ên Amedê di nav tîrêjên zer de mabûn. Kevirên reş wek ku xêliya bûkê bi serê xwe de bike di nav rengê zêr de xeriqî. Bajariyên ku bi şev ranezabûn di hênikayîya destê sibê de, bi sirûdan silav dan rojê. Hêviyên dilên bi hesret, dibûn deng û li ser Amedê belav dibûn. Dengên însanên ku birçiyên azadiyê bûn, dengê însanên ku li ser rêya bextewariyê bûn.

Wê serê sibeya ku bi hezaran ciwan li meydana mezin gihîştibûn hevdu û di nav cil û bergên rengîn de govenda azadiya miletekî digêrandin, ez li ezmanê Amedê kevokeke şîn bûm û li ser meydana azad bê tirs difiriyam. Wan jî nizanibû rojeke bê leşker û bê polês çawa ye. Rojeke bê tirs, bê lêdan û bê girtin çawa ye. Dengê def û zirneyan digihîşt erşê ala. Keç û xortan, dê û bavan, kal û pîran kela dilên xwe sar dikirin. Hesretên di dîl de mayî, li ser eniyan diciviyar û zîpik zîpik bi ser

dilên germ de dibariyan. Rengên ku her tim di dil de bûn, rengên kulîlka hîroyê bi ser Amedê de dibariyan. Amed, di nav wan rengan de bûkeke bi dilê zava bû. Bûkeke kû cîhan jê didexisî û dijmin ji kerban dibehecî.

Deriyê zindanên li nav Amedê heta dawiyê hatibûn vekirin. Girtiyên ku bi salan di hucreyan de mabûn, lingên xwe û axa sor bi hev didan nasîn. Girtî ji hucreyan rizgar bûbûn lê îcar kêf û şahiyên Amedê ew dîl girtibûn, lingekî wan di nav govendê de baz dida lê yê din li ser rêya malbatê dibeziya. Girtiyên ku hovitiya zindana Amedê jiyabûn bi destên zarokên xwe girtibûn û dabûn ser rêya qawîş û hucreyên ku tê de mabûn.

Wê serê sibeya ku li Amedê şîn û şahî tev li hev bûbûn, li goristanên Amedê ez guleke mihemedî bûm û di destên bi hezaran dê û bav, xwişk û bira, keç û law, jin û mêrên bî de diyarî bûm. Şîniyan reşên xwe qetandibûn û ji bo mizgîniyeke xweş bi lez ber bi şehîdên xwe ve dibeziyan. Wê rojê li goristanên Amedê xwelî bihata avêtin li erdê nediket, kêf û coşa bajarê qedîm di nav dilên dayikên dilşewat de çargopal lêdîket. Amed minetdarê wan bû. Azadiya Amedê ji ked û xwîna wan bû.

Wê serê sibeyê gava zarokên Amedî di nav kolan û kuçeyan de wek çûkên biharê bi hev ketibûn û ber bi xwendegehan ve dilezandin ez li ser lêvên zarokekî biçûk keneke sivik bûm. Zarok dikeniyên, mamoste bi ken bûn û xwendegeh li benda xwediyê xwe bûn. Mamosteyên rûgeş li ber deriyên mezin kulîlkên nûbişkuvî pêşwazî dikirin. Belê, cara pêşîn bû ku mamoste û zarokan bi kurmancî, bi zazakî li hev dikirin. Cara pêşîn bû ku zarokan bejna xwe li ber nîşanên dagirkeriyê neditewandin û sondên dagirkeriyê li ser zi-

manên xwe nedihewandin. Xwendegeh bi rengên naskirî ji nû ve dixemilîn. Ehmedê Xanî û hevalên xwe li ser serê mamosteyan ji dil dibişirîn. Ji bo têkevin muzeyê mamosteyan kitêbên berê didan ser hev. Qurmîna kurmanciya reş bû, dilên zarokan geş, dilê Amedê xweş bû.

Wê şevê ez li ser Pira Dehderî di nav dilê xortekî amedî de evîneke ciwan bûm û li benda birqên stêrka li ezmanê bajarê xwe bûm. Stêrka Amedê li ezmanê bêdawî ji nû ve geş bû û dilên amediyan bi şewq û şemala wê ji nû ve xweş bû. Wê şevê xelkê Amedê ji Pira Zanîngehê, heta Pira Dehderî li her du aliyên Çemê Dîjleyê kom bi kom rêz bûbûn. Amediyan heta wê rojê jî, di bin birqên stêrka mezin de temaşeyeke bi vî rengî nedîtibûn. Wek ku ya diherikî ne Dîjle bû, ji şewqan lehiyek çêbûbû û li ser Dîjleyê diherikî. Bi hezaran mûmên vêketî li ser qalikên zebeşan, hûrik hûrik diliviyên û ciwan ji nû ve bi agirên dilên xwe dihesiyan.

Wê şevê gelek jinên ku rengê hineyê ji bîr kiribûn, di leganên sifir de hine ecilandin û wek şeva bûkaniyê pahnî û tiliyên xwe xemilandin.

Di sibeya wê roja ku bêhna bihiştê ji Amedê dihat de; ez xortekî evîndar bûm û di keçikên çavên keçikeke Amedî de bextiyar bûm. Evîn û Amed li hev baniyabûn. Dilên razayî bi eşqê hesiyabûn. Di nav dilên xortik de evînen çardasalî zîl didan. Di nav dilên ciwan de evînen hejdesalî gul didan. Di nav dilên biraz de evînen çîlsalî dikemilîn û dilên aram bi evînen heftêsalî dixemilîn.

Bi ser Amedê de evîn dibariyan. Amed û evîn ji nû ve li hev dibaniyan.

Destpêka felsefeyê û taybetmendiya erdnîgariya Îyonyayê

Ali Gurdîlî

Di destpêkê de mirov dikare bibêje ku felsefe di nav loda hewldanên mirovî de hewldana herî zehmet e. Mijarên felsefeyê gelekî fireh in û felsefe, bi awayekî gelekî kûr li ser mijarên xwe radiweste. Wek tê zanîn felsefe ne zanistek e, bi tenê mirov dikare bibêje ku ew zanayiyek an jî rêya lêgerîna zanayiyê ye. Ji ber vê yekê jî danasîn, fêrkirin û fêrbûna wê jî, gelekî zehmet e. Bi taybetî jî ev helwesta felsefeyê ya ku bi awayekî gelekî kûr li ser mijarên xwe radiweste, di destpêkê de çavên xwendevanên nû yên felsefeyê gelekî ditirsîne. Lê çiqasî ev helwesta felsefeyê mirov bitirsîne bila bitirsîne, divê mirov xwe bi paşve nede. Lewra taybetmendiya felsefeyê dişibin kaxizên tûrnûsolê.

Wateya vê yekê ev e:

Ê ku difikire, lê dipirse, li wateya jiyanê digere û dixwaze ku jiyan xwe watedartir bike; hege ew di vê helwesta xwe de xwedî bawerî be, wê jî vê helwesta felsefeyê ya wêrek netirse. Piştî vê domanê, wê mirov jî xof û tirsên bêwate rizgar bibe û li wê, li delaliya xazîneya felsefeyê temaşe bike. Di serdema pêşîn de filozofên yewnanî, ev rewş bi “hezkirina zanyariyê” bi nav kirine.

Danasîna felsefeyê

Bi awayekî êşkere mirov dikare bibêje ku heta roja me ya îroyîn, danasîneke naguher ya felsefeyê nehatiye dayîn. Çimkî her filozofekî li gor xwe danasînekê datîne, ku kêmkê mirov dikare bibêje ku ev danasîn nîşana nêzikahiya wan e. Ji ber vê yekê, danasîneke felsefeyê ya ku hemû mirov li ser wê danasîne li hev tîne tune. Çimkî filozofek, dikare ramanên filozofekî beriya xwe bipejirîne û nepejirîne jî. Filozof beriya her tiştî dixwaze

ku serbestiya xwe nîşan bide. Cihêrengiya ramanên wan ne ji quretiyê, lê belê mirov dikare bibêje ku ji nêrîna wan a gerdûnê û ji serbestiya wan pêk tê. Li gor zanyaran, felsefe cara yekemîn li Îyonyayê (Keviyên behra Egeya îroyîn) derketiye holê û di wateya hestî de hatiye bikaranîn: **Hezkirina zanyariyê**.

Di zimanê yewnanî de wek ‘philosophia’ tê bikaranîn. Philosophia peyveke hevedudanî ye. Ji peyvên **philo** (hez) û **sophia** (zanyarî) pêk tê. Ji zimanê erebî, wek peyva **felasife** derbasî zimanê tirkî bûye. Peyva ‘**philophios**’ yekemîn car di wateya ‘**kesê ku li bastûra tiştan digere**’ de ji bo **Herakleitos** hatiye bikaranîn. Herakleitos, wê demê bi nasnavê “**Filozofê Tarî**” dihat nasîn. Bi taybetî jî peyva ‘**sophios**’ dihat wateya “ê ku xwedî merîfet û desthilatiyê (şîyanê) ye.” Bi vî awayî felsefe, dibû hewldaneke ramanî, ku li xwezaya tiştan digeriya û dixwest ku li gor aqil û mantikê, xwezaya tiştan şîrove bike.

Herakleitos ji bo felsefeyê dibêje:

“Zanyarî ji bo pêzanîna xwezayê, anînazîman a heqîqetê ye û bi awayekî pirsyarker, vejîna li gor vê heqîqetê ye.”

Ramanwerê romayî Seneca jî, ji bo felsefeyê dibêje:

“Babeta felsefeyê ya sereke ew e ku mirovan, bike xwedî edeb û terbiye.”

Dîsa filozofê Serdema Navîn ê îslamê Kindî dibêje:

“Felsefe, xwenaskirina mirov e.”

Îbnî Sîna jî bo felsefeyê wiha dibêje:

“Armanca felsefeyê, derxistina holê ya

xwezaya wanekan (nesneyan) e.”

Di Serdema Pêşîn û Serdema Navîn de danasînên felsefeyê, her ber bi zanyarî û sererastkirina jiyana rojane ve ye, ku ji xwe zanyarî jî di wateya ku mirov raman û tevgerên xwe li hev bîne, de ye.

Zanyarî

Erdema herî mezin. Bi civak û gerdûnê re yek-kerbûna mirov e, di tevgerên xwe de pejirandina serweriya zanayiyê ye, li ser hemû liv û tevgerên xwe fikirîn û pejirandina rênîşanderiya aqil û zanayiyê ye. Di rewşa zanayiyê de mirov tu carî nikare bibe êsirê zewq û xweşiyar. Zanyar ew kes e ku dikare li hember zewq û xwestekên xwe raweste û têbikoşe. Lê di dewra hemdem de jî filozof dema ku felsefeyê dinasînin, têgehên razber (soyut) bi kar tînin.

Hegel ji bo felsefeyê wiha dibêje:

“Felsefe, baweriya hezkirina heqîqetê û hêza aqil e.”

Kant der heqê felsefeyê de dibêje:

“Têgeh, an jî zanayiya aqlî ku bi çêkirina têgehên tê bidestxistin.”

Ev mînak jî nîşanê me didin ku felsefe lêgerîneke bêrawest e û her dem, di nav hewldaneke wiha de ye.

Felsefe li dewerên nexşeya jorîn, nemaze li keviyên Egeyê dest pê kiriye. Îro, bi piranî wiha tê pejirandin ku felsefe yekemîn car li Îlyonyayê derketiye holê û ev yek, bi awayekî dîrokî hatiye nîşandan.

Ê baş e, yên ku li Îlyonyayê dijîn kî bûn?

Herêma Îlyonyayê di roja me ya îroyîn de, bajarên wek Îzmîr, Aydîn û Muglayê diguncîne. Wê demê bajarên wek Assos (Çana îro), Ephesos (Efesa îro) û Miletê, li keviyên behra Egeyê wek navendên bazirganiya behrê bûn.

Îlyonyayî, ji qewmê akayan têne hesibandin, ku berê li Peleponezê (Nîvgirava Morayê, li Yewnanîstanê) dijîyan. Lê piştre, ji ber êriş û dagirkirinên biyaniyan (**qewmê**

dor) ber bi keviyên Îlyonyayê ve koç kirine. Heta demekê, li nîvgirava Yewnanîstanê di bin serweriya doran de jiyane, demekê di bin serweriya persan de (îranî) jiyane û piştre jî, gihîştine serxwebûna xwe û dewletên xwe yên bajarî ava kirine.

Îlyonyayîyan ku medeniyeta yewnan di roja me de xwe wek berdewama wan dihesibîne, di warê edebiyat, zanist û hunerê de, medeniyeteke gelekî xurt ava kirine û bi rêya kolonîkirina hawirdorên xwe bûne xwediyê hêzeke mezin.

Di vê dewrê de bi helbestên xwe yên destanî, **Homeros** jî dertê pêş. Bi taybetî jî destanên Îlyada û Odysseia; behsa sefera **Troya** (Îlyada) ya Agamemnonê qralê Mîkenê û jî Troyayê vegera Ulişê serokê Akayê dike.

Îlyonyayîyan, baweriya xwe bi gelek xwedayan dianîn û xwedayên wan jî, xwedayên nîvmirov û nîvxweda bûn (**andropoformîk**). Hemû Xweda ji yekbûna ax û ezmanan, derketibûn holê, pismamê hevdu bûn û bi hevdu re têkiliyên pismamtiyê ava kiribûn. Di destpêkê de her sîteyek (bajar) Xwedayekî wê hebû, lê piştre ev Xweda ji aliyê sîteyên din ve jî têne pejirandin û Xwedayek, dibe Xwedayê gelek sîteyan. Îlyonyayîyan wiha bawer kirine ku ev Xweda, li çiyayê **Olimposê** dijîn û ji ber vê yekê jî navê van xwedayan, danîne xwedayên Olimposî (Xwedayên çiyayê Olimposê).

Di nav van loda xwedayan de Zeûs wek Xwedayê ezman, Apollon Xwedayê roj û ronahiyê, Poseîdon Xwedayê deryayê, Demeter jî wek Xwedawenda axê, hatine pejirandin. Îlyonya, ji aliyê bazirganiya deryayê ve jî gelekî xurt bû û bi pêşve çûbû. Keştiyan ji Behra Reş, Trakya, Qibris, Midilî û Sakizê, tiştên wek hesin, dar, genim, sifir û şerab dibirin Atîna û Pîreyê û ji wir jî donê zeytûnan, hirî, qumaş û malên zînetê, bar dikirin.

Li welatê Îlyonyayê ku wek dewletên bajarî xwe bi rêxistin kiribûn, demokrasiyeke ku çavkaniya wê arîstokrasi bû dihat birêvebirin. Di van dewletan de kole û jin, wek hemwelatî

nedihatin qebûlkin. Lê gelê van dewletan, xwediyê wî mafî bûn ku dikaribûn deng bidin û jûriyên (desteya hîlbijêran) xwe ava bikin. Gelê dewletê li meydana sîteyê diciviya û ji bo birêvebirina zagonan, dengên (rayên) xwe didan, ji bo salekê serokek hildibijartin û ew dişopandin.

Di şerê îyonyayî û persan de jî, mirov dikare bibêje ku di warê kulturê de ketumbûnek pêk hatiye û her du kultur jî, di bin bandora hevdu de mane. Persan xwestine ku xwe bigihînin Ewropayê û ji bo vê armancê jî, keviyên rojhilata Enedolê û piştî jî, welatê Traqya û Makedonyayê vegirtine. Di vê dewrê de miletiyan bi piştigiriya Atînayê, serî hildaye. Di dawiya şerên 30 salan de persî, ji keviyên Behra Egeyê û jî Îyonyayê hatine qewirandin.

Felsefe, di dorhêleke wiha de dest pê kir û her çû, bû disîplîneke xweser û bi pêşve çû. Mirov bi hêsanî dikare bibêje ku şîrovekirin û ravekirinên îyonyayîyan ên li ser ol û gerdûnê, di mîtan de cihekî gelek berfireh digirt. Lê piştî demekê avahiya wan a siyasî, şer, bazirganî û şeklê dewleta wan a xweser, rê li gelek guherînan vekir û piştî van guherînan, di civakê de hinek mirovan baweriya xwe êdî bi zanayiyên ku hene neanîn û dest bi şîrovekirineke cihêreng a gerdûnê, têgihîştina wateya herikîna jîyanê û wateya başî û xirabiyê û hwd. kirin. Vê pêşveçûnê jî, wiha kir ku di civakê de babetên ku di civakê de têne vekolandin, bi **bingeheke aqlî** werin şîrovekirin.

Taybetmendiya Îyonyayê

1- Çanda yewnan û şaristaniya wê, xwediyê qerektêreke dualî bû. Ji aliyekî ve di warê kulturê de gihîştibû asteke gelek baş, lê li hêla din jî di hindek babetan de xwediyê hinek adetên xirab bû. Li aliyekî baweriya xwe bi Xwedayên Olîmposê dianin û li aliyê din jî, zarok û jin di civakê de kole bûn. Cîbicîkirinên bi vî rengî, piştî demekê wiha kir ku di civakê de bêhevîbûnekê dest pê kir û hindek pêkanînen civak bêhevî dikirin, hatin dîtin.

2- Li hember vê çanda dualî ya ku civak bêhevî dikir, fîlozof dîsa jî têgihîştin ku di gerdûnê de guherîneke bêrawest heye û gerdûn, her dem di nav guherîneke wiha de ye. Ji jîyanê ber bi mirinê, ji zarokatiyê ber bi pîrbûnê, ji biharê ber bi zivistanê ve, her dem guherîn û veguherîneke bêrawest heye.

3- Diviyabû di piştî vê guherîna bêrawest de, heyîneke ku her dem hebûna xwe didomîne jî hebûya. Piraniya felsefe û xwesteka şîrovekirina Îyonyayê, bi lêgerîn û pîrskirina vê heyîna mayinde, dest pê kiriye û xwestiye ku vê yekê derxe holê.

4- Fîlozofên Îyonyayê, navê vê heyîne danîne "**arche**". Arche, ew element bû ku digel hemû guherînan, ew nediguherî û wek xwe dima.

5- Di dîrokê de **Thales** wek fîlozofê yekemîn hatiye pejirandin. Thalesê ku BZ di sedsala 6'an de jiyaye, gotiye ku "arche," av e. Hindek fîlozofên din jî, ku xwediyê ramanên cihêreng bûn, wan jî arche, bi madeyên (elementên) cihêreng şîrove kirine. Mesela Anaksîmenes (Anaximenes) hewa û Herakleîtos jî, agir wek elementa bîngehîn (arche) dîtiye û bi vî rengî, arche hatiye şîrovekirin.

6- Fîlozofên îyonyayî, dema ku li madeya bîngehîn a gerdûnê vekolane, tu rêbaz an jî tecrûbeyên (deney) zanistî bi kar neanîne. Bi tenê bi rêya spekulasyonê, xwestine ku xwe bigihînin encamê.

Spekulasyon

1- Zanayiya ku bi tenê dixwaze bizanibe, binase û fêr bibe.

2- Li ser bîngeheke wiha, raman an jî nêrîna razber ya li ser heqîqetê, ku tu carî nikare were peyitandin.

3- Hemû cure avahiyên bêbingeh û razber, rave an şîroveya ku peyitandina wê bêimkan e.

4- Fîlozofên Îyonyayê, her çiqas li ser hindek babetên razber ên wek guherîn û yekîtiyê rawestiyabin jî, ev yek bi bîngeheke madî pêk anîne. Elementên ku ji bo

şîrovekirina çêbûnê hatine bikaranîn, ên wek agir, av, hewa, ax û hwd. hemû jî, madeyên madî û girgîn (somut) in. Dema ev yek pêk anîne jî, xwe ji bandora sehekan rizgar kirine û bi awayê **razberkirinê** (soyutlama) ev yek pêk anîne.

5- Li cem filozofên Îyonyayê, felsefe û zanist, ne du bûyerên cuda ne. Heta mirov dikare bibêje ku filozofên îyonyayî, li gelek babetên kozmolojîk, fizikî û bîyolojîk jî vekolane. Lê ev yek, di çarçoveya felsefeyê de pêk anîne. Li hêla din jî zanistên matematîk û geometriyê jî, gelekî bala wan kişandiye û li ser van zanistan, gelekî rawestiyane.

6- Filozofên Îyonyayê her çiqas li ser babetên wek çêbûn, yek, pir, windabûn û

hwd. rawestiyabin û spekulasyon wek rêbazekê bi kar anîbin jî; mirov nikare bibêje ku ew di babeta şîrovekirina tevgerê (liv) de bi ser ketine.

Her çiqas bi awayekî rast nêzî veguherîna qozmîkê bûne û hinek sentez bi kar anîne jî, hêza wan têr nekiriye ku **yekîtiya dijberan** û piştre, derketina holê ya sentezan şîrove bikin. Di vê babetê de teoriya herî baş a **Demokrîtos** e. Bi tenê dozîneya **atomgiran** (atomparêzan) hewl dane ku bi têkiliyên atoman bûyera çêbûn û guherîna gerdûnê şîrove bikin. Lê ew jî, di babeta şîrovekirina tevgerê de bi ser neketine.

Çavkanî: Ji xebateke Ali Gurdilî ya neçapbûyî.

Kengî mirim

Tewfîq YAŞLI

Hurşehrşa delaliya min bû
Dema herikînê
Keya dihesidî nizamim çima
Jê ve Rustemê Zal şerê mişkên malan kiribû
Tenê rûyê min î hilû
Ax rûyê min alemekî hilû bû
Likumîna wî bû
Sernişiva min

Gelî xwehên rojmirî, birano
Awêne mala min bûn, zik didan
Ez dikoja dim şevên kul
Werin em herin pengzîna bindarûkê
Werin îşev pêxwas
Zarokno we Kamyar nedîtiye
Par bû
Ripîrût bû

Ger ez bêjim nezame bawer bikin
Ez li alî din mam
Heristinên leyli min
Duh êvarê bû, erê duh êvarê
Têla tembûra min qetiya

Niha saet ji xapandinan bihurî ye
Werin rastiya ser bêjîngê
(rehme li av û axa Dêrikê be)
Ez hêjî efara evînê dikim
Ez şev im, ez şev im

Divê ev dubare bête gotin
Û bi şewitîna can
Xwedê hebîn hun bêjin wî gulfiroşî
Hêj di temenê kuçeya me de ye
Min kena xwe ya bêar dabûyê
Paşî çem rabûbûn li çûyînan
Dirêêj bûbûn
Bi qasî tirsî mirinê

Yezdano ma çi dibe çêja her tiştêkî
Xweşiya bêhnvedana govendê be
Min xwest keçeke min jî hebe
Ew qas
Xwedêyo qene di xewnên min de
Jixwe dê pelg payîzê li xwe kin

Xweziyên min jî hebûn
Ez ê bêjimê keçî
Uzîna guran
Xofa piştî birûskvedanê
Berfa sor
Pîr dimeşîyan
Hezar û heftsed hesp bi hev re
Ji daxa çavên min
Lê nizamim kê ez hînî îspanyolî kirime
"calle de los ventanos"* dibêjim
Paşê jî "dinê ji bo hezkirinê pir biçûk e"*** piîir.

* Kuçeya şibakeyan

** Furux furuxzad.

Mizgefta Mishefa Reş

Bahadîn ROBAR

Cizîra Botan bajarekî ku malovaniya gelek şaristaniyên ku mora xwe li gelek sûr, qesr, birc, keleh, perestgeh, pir û avahiyên cur be cur û binirx daye, kiriye. Di heman demê de malovaniya cur be cur bawerî û gelan jî kiriye. Jixwe wek tê zanîn piştî tofana Hz. Nûh mirov li bajarê Cizîrê bi cih bûne û piştê li cîhanê belav bûne. Çi şaristaniyên ku hatine û çûne hin şop, bermayî û kevneşopiyên xwe jî ji Cizîrê re hiştine.

Li Cizîrê mizgefteke bi navê “Mizgefta Mishefa Reş” heye û bawermendên misilman li vê mizgeftê nimêj û taetên xwe dikin. A ku bala me dikişîne ne mizgeft; lê navê mizgeftê ye. Wek tê zanîn “Mishefa Reş” navê pirtûka pîroz a bawermendên ola Êzidiyan e. Gelo çawa dibe mizgefta ku îbadetxaneyên misilmanan e navê Mishefa Reş a ku pirtûka pîroz a Êzidiyan lê hatiye kirin? Li gor lêkolîna ku me li ser vê mizgeftê kiriye di wextê belavbûna îslamiyetê de Qurana ku li ser çermê xezalan hatiye nivîsandin kirine çar nushe. Ji van her çar nusheyan nusheyek anîne Cizîrê û li vê mizgefta navborî bi cih kirine. Lê belê ev mizgeft piştî hingê çend caran hatiye restorekirin û nûjenkirin. Piştî hilweşîna împeratoriya Osmaniyan, Komara Tirkîyeyê hat damezirandin û wek berê nîrx neda îslamiyetê û di serdema serokomar Îsmet Înonu de Qurana Kerîm û mizgeftên ku misilmanan îbadet tê de dikirin hatin qedexekirin. Li gor gotinên seydayên temenmezî, dibêjin ew nusheya Quranê ya ku li ser çermê xezalan hatiye nivîsandin jî aliyê mele û feqeyan ve di hundirê sandoqekê de tête hilandin. Pîraniya mizgeftan jî aliyê Hikûmata Înonu ve wek qerekol tên bikaranîn. Esker li mizgefta Mishefa Reş jî bi cih dibin. Li ser vê yekê Mele Evdîlkerîm Ozer wiha dibêje “demsala zivistanê eskerên ku li wê mizgeftê peywîrdar in agirekî pêdixin û xwe li derdora êgir germ dikin. Ji eskeran eskerek ji bo gurkirina êgir ji derdorê kaxez û

qirşikan berhev dike di wê navberê de dibîne ku sandoq li wir e, dirahêje wan hûr û mûrên ku di sandoqê de ne tevî nusheya Quranê ya ku li ser çermê xezalê nivîsandî ye û diavêje ser êgir. Eskerekî ku dibîne Quran avêt ser êgir demildest Quranê ji nav agirî derdixe lê mixabin kitsek jê dişewite û ya mayî jî diqurmiçe ser hev û reş dibe. Êdî gel jî vê nusheya Quranê re got nusheya reş an jî Mishefa Reş.” Wek me li jor jî gotibû kevneşopiya baweriyên berê hê jî di nava gel de didome. Nusha reş bi demê re ma di bin bandora Mishefa Reş de û jî wê û şûnde weke Mishefa Reş hat bikaranîn.

Li Cizîrê niha jî sondxwarina li nava gel bi Mishefa Reş tê bikaranîn. Hin eşîrên misilman ên ku niha li Cizîrê dijîn ji çend babikan pêk tên ji van eşîran yek jê Eşîra Kîçan e û ji deh babikan (malbatên mezin) pêk tê. Ji van babikan yê herî balkêş Taligan e. Ji ber ku li nav Êzidiyên Şengalê jî babikek bi navê Taligan /Tehlikan heye û ji yên Cizîrê re dibêjin em pismamên hev in. Hê jî çûn û hatina van her du babikan a bi hev re didome.

Dîsa li Cizîrê rojên çarşemiyên jin diçin seyrangehan û şahiyên dikin. Her çarşem bi sedan jinên cizîrî çarşafên reş (çarîk) werdigirn û navê vê rojê jî weke Çarşema Reş bi nav dikin. Lê nayê zanîn ku ka sedema wê çi ye. Ev roj wek pîrozbahiyekê di nav gel de maye. Lê ya em pê dizanin ev kevneşopî bi sedan sal in li Cizîrê dijî. Li gor min ev sondxwarina bi Mishefa Reş û nusheya reş a ku bûye Mishefa Reş û tevî roja Çarşemreş bandora Êzidîtiyê ye ku li ser gel heta roja îro kariye bimîne.

Ji bilî van kevneşopiyan keveşopiyên cur be cur jî hene. Weke dema roj tarî dibe ango roj tê girtin. Pîrê gel li tenekeyan dixê û bi vî awayî vê rewşê pêşwazî dike. Em dikarin bibêjin Cizîra Botan mozaîka çand û tîkeliya Mezopotamyayê ye.

Deştenazê xemrevîna dilê azadîxwazan

Mehmûd Badilî

*Vê naziye diyarî Mihemedê Mûsê dikim,
pêşkêşî qeşengiya Deştenazê dikim*

1

Wek xemla hetavê derbarî rojîna êşê, te rûkenîna rojavahiyê bi çirûskên şingîna hêrs û diltepiyên xwe ber bi rojavahiyek nû de her kêlikê geş dikir û di her gavê de çavê Deştenazê li bejna te ya mermerî digeriya.

Wek vê rojê

Wek vê havînê

Wek vê kêlikê

Ev roka ku her destê sibê, xwe li ber sîbera xewnên te ditewand, di hêlîna xwe de qeşengî helawist, vê sibê hilnehat, vê sibê sibehê guliyên xwe ji gulhinarên peyvên te hine nekir.

Mijistana tariyê, hîrehîra nediyariyê di mêlak û gurçikên leşker û pasevanên xwe de gur dikir û te li dergehên aso dida, tu ne diqerimî û tu ne diwestiyayî li derîdana berbangê û Deştenaza nazenîn li hêviya te xemgînî dicût û li ber çongên rokê derd û êşên gulên xwe radixist.

Heyv jî stûxwar û melûl dima, li ser strana destên te diponijî, dihênijî, dilewlîjî...

2

Deştenazê.. Nazenînê...

Wek vê kêlikê, sîperê ronahiyê li asîmanê deşta te difiriya, axaftinên xwe yên nerm û germ li rûyê şevnemê dadiweşand. Kevok û çivîkên derbeder di awirên çavên wî de nexşên baskên xwe av didan û bala firînen xwe li her çar aliyên aso bi mijangên wî yên kêmxew dipîvan.

Her kêlikê, deşt li ber radana pêngavên wî teng dima. Şevê ta digirt û tarî di tûjbûna awirên wî de bê saw dibû.

Deştenazê! de di hêlek qorzîka çavên xwe re lê binêre, bê çawa bejna te di pêjna wî de fireh e, bilind û bala ye, li gorî bilindahiya xewnên te deryaya hebûnê qam dike, guh li

metirsiyê nake, hemû xêzên sor pêşberî xewnên baskên wî diherifin, pir ji te hez dike, sîperê dilê te ye.

Deştenazê!

De tu jî hinekî jê hez bikî.

3

Deştenazê...

Aniha girtiyê du çavên te di qeşaya tariyê de dilerize. Zincîrên kirêt destên wî yên xwedawendî dikojin, disojin, dikujin; lê destên wî namirin. Wisa di cîgeha tariyê de li ber dergehên hesinî gava her du destên xwe hejandin û ji keziyên genimê te re li ba kirin û got: Bijî Deştenaz, bijî zeviyên genim û zeytûnan, bijî bexçeyên nok û nîskan, bijî newal û qilaç û kendal û bendav û çemên deştê, bijî rê, riya dilê Deştenazê.

Wê çaxê, li ber deriyê dadgehê... Dilê kolanên bajarê dîl, gurmîna xwe ya berî ya dawîn di nîvê xirecira toza sedsale de dadçikand û hêjîrên lêvnîvliken û nîvdaliqiyayî di giriyê hejaran de yên li rêrexên beravîti raxistibûn, bişîrîna rengên xwe ji pakîzeya sorpêçiyên wî werdigirtin. Û darên pembo di qijîna tîrmehê de li bendemana hevdêtina ku bê gûzikên rojên xwe li ber hedana hetavê dibişkivandin.

Li ber deriyê dadgehê...

Qîrîna destên girtî çûn û hatina gêrikên moristanan li hev diherbiland û dadmendiya req xwe di kincê şermiyê de dinixumand.

Wê çaxê, çavên tiriye bej li sema baranê bûn û zincîrên dest di helkehelka kîna xwe de sernixûm ber bi reşiyê de nişûv dibûn.

De rabe Deştenazê! rabe piştgiriya sîperê dilê xwe bike, rabe piştgiriya girtiyê evîna xwe bike.

4

De rabe Deştenazê...

De rabe sihirbazê û hinekî li hawîrdora çelengiya xwe her û were, dizanim tu pir xweşik û nazik î û qeşengiya te ne kêmi ya Qendîl û Araratî.

Deştenazê ma ne tu pêkên çiya yî û singa te ya berfinî mêrga balindeyên çiya yî.

De rabe û wan çavên xilmaşî bi nîgaşa nikilên sîperê xwe tîmar bike û meraqa dozdehê biharê dîsa di rewanê genimê xwe de gur bike û xweliya gul û çiçekên ku xwe bo serokê girtiyan şewitandin li ber destê axa pîroz raxîne. Ji bîr neke hîna bêhna goştê Mazlûm ji dîwar û banê zindanê hildibe, ma ne gîhak û genimê te li ser bayê wê bêhnê gul didin.

De rabe Deştenazê, deriyê zindana girtiye dilê te tê de dinale pir asê ye û pasevanên li ber derî ker û lal in; bi lavan derî qet venabe.

5

Deştenazê...

Dizanim tu ji sîperê xwe pir hez dikî! De bila raperîna hezkirîna bûnewerên hundirê te rapelike hemû aliyan û hemû alî berzûrî xirecira mijê bibin.

Aniha pasevanên tariyê di taya mirina xwe de rojên xwe yên dawîn dihejmêrin, roj li pey rojê ziwabûn û talî di gerdana wan a dîl de zîl didin û rê û rewanî li pêş xewnên wan wenda dibin, ger tu bixwazî vê yekê baş nas bikî, rabe karûbara xwe bike û here serdana girtiye evîna xwe, here tu yê vê rastiyê di şorbûna laşê wî de bixwînî.

Goştê sîperê te şor e, ji şorbûna axa Şorê ye, tu carî ev goşt bi tajanên stemkariyê naperçive û derûna wî bi şîrê bayê rojava perwerde bûye, tu carî tarîping nasûrike hundirê wî û sistbûn û lawaziyê di kabokên helwestên wî de bi cî nake.

De rabe Deştenazê!

Evîndarê te tî ye

Ma ne evîna te hêza dilê wî ye?

6

Deştenazê...

De rabe çingîniya zingilê comerdiya xwe tevî çingîniya mêrxasiya şeydayê sîbera xwe

bike û di karûbara nîgeraniyê de lehiya dînbûnê amade bike û hizr û endîşeyên lehengê doza xwe, ku rehên xwe berdane kûrahiya hinavê te, ji nû ve di dilê zimêt û serspîk û strîzerkê, di dilê pîvong û bizbîlîq û kerengan, di rewanê axa tî de biçîne. Û ji xwîna damarên xebata girtiye evîna xwe jehên berxwedanê saz bike û ji parsûyên helwestên wî stûna xweragirtinê çêbike bo nehişiya asîman û xişm û zînata zordestan ku bi ser deştvanîyên te de dibare hilgire û di kûrahiya wan de kaniyên xwenasînê, hevperwerî û hevgirtinê dijî neyarên xewnên genim û zeytûnan raperîne.

7

Deştenazê...

De hinekî bi bîra xwe bîne û bîrewerîya xwe ya qedîfe ji nav pençeyên nehişyariyê raçikîne.

Coşa giyanê girtiye dilê te çemekî serxweş diherike

serxweşiya bédengiyeke dûr û dirêj e

serxweşiya birûsk û tavên biharê ye

serxweşiya evîna te ya sihirbaz e ku her kêlikê xwînê di cendekê deştên de ditewirîne, û gorên bê kêl, kêlên bê nav û navên ku Xwedê û ferîşteyên wî jî wan napejirîne di xewxweşiya mirina xwe de li ber bayê tolka rewanê te direqisin.

De rabe Deştenazê..

Hewl bide ku hinekî ji vê serxweşiye, hinekî ji vê sema dînîtiyê û hinekî ji cegerdariya evîndarê xwe di ziravê hawar û lavlavê de biçîne.

De rabe li çareya serê xwe û serê şeydayê xwe bigere.

De rabe, hovên vê demê ji hovên dema berê gawirtir û hovanetir in.

De rabe û wê kembera reş û tarî ya li nava omîdên te rapêçayî ku her kêlikê xweliya rîp û dek û pîlanên xwe bi ser dûşîzeyê te de dadiweşîne û zordestên qehwerengê çavên te bi yasayên hovane ji kiryarên xwe yên hovane can û laşê te kîsin dikin.

Te ber bi nebûnê de radajon

Te ber bi mirinê de kedî dikin

Ra çandiniyên te jî roj li pey rojê di birçibûna çavên xwe yên nebar de dişewitînin,

keda cotkar û karkerên te dixwin û xwêdana wan bi kirêtî dadîqurtînin.

De rabe Deştênazê!

Bila çiya jî carekê li pey te bazbidin.

8

Deştênazê...

De rabe û mistekê ji wê xemgîniya xwe ya giran tevî şorbûna axa bindest bike.

Şorahiya axê pir zor û dijwar e, di gava ku xemgîni û şorahî di hev de vegevizin.

De rabe û hinekî ji strana destê girtî di mêlak û hinavê xwe de dawerivîne.

Strana destên girtî jî gelekî no ye, loma di qeyd û zincîran de dinalin, dikalin, diarin.

Lê tu dikarî nanê berbangê li ser arihandina wî destî bibirêjî.

Tu dikarî arezûyê di pirça xwe ya zêrînî de

vêxîni gava tu xwe berzûrî navika mêrxasiya sîperê xwe bikî.

Tu dikarî baweriyê li dilê bender û palên pûş vegeirî.

Tu dikarî jiyanê ji hêrsa girtiyê xwe di termê deştê de ji nû ve vejî.

De rabe Deştênazê!

Ma ne di ferhenga çavên zordestan de, tu biyan î, bê can î, tu bûnewerek li ser rûyê zemînê bo jiyanê nehêja yî...

De rabe Deştênazê!

Girtiyê evîna te li hêviya lîrelîra te ye û zeviyên genim û nîsk û pemboyan û darên zeytûn û sêv û hinaran li hêviya hîrehîra damarên te ne.

De rabe Deştênazê'!

Strana te noşîna dilê girtiyê te ye.

Başûrê Biçûk

Rizoyê XERZÎ

Biçûk im	Me hêviyên xwe hilgirtin
Bê çiya me	Û em dageriyan
Bê tiving im	Navê me ma başûrê biçûk
Lê kurd im	Başûrê xernûf û heshesûkan
Dema çiya ji başûr ve keliya	Başûrê şehîdên bê navnîşan
Kalê çiya	Ta ku çiya ji nû ve
Tivinga xwe hilgirt	Ji bakur ve qîriya
Xwe avêt bextê çiya	Dîsa bi lez
Wê gavê em biçûk bûn	Me berê xwe da çiya
Lê bi hezaran	Me buxçîkek avêt milê xwe
Me xwe avêt wî çiyayî	Tê de
Çiya hênkaya bejna xwe da me	Berbejna dayê
Me jî dê û bav	Serpêhatiyên bavo
Yara çavîrê	Desmala yarê
Li pey xwe hiştin	Xewnên çiya
Em bûn mêvanê şikeftan	Hêviyên paşerojê
Ta ku guleyên me	Û
Di qûndaxên tivingên rûsan de riziyan	Bawerî
Dîsa em vegeriyan	Hê jî navê me ma başûrê biçûk
Biçûkiya bejaya welatê xwe	Başûrê tivinga riziyaî
Me şehîdên xwe	Başûrê bejaya bê sînor
Kirin al	Başûrê
Di destên xwe yên westiyaî de	Ji hemû başûrên cîhanê bê maftir

Standardên Jiyanê

Dorothy Rothschild Parker
(1893 - 1967)



Dorothy Rothschild Parker
(1893 - 1967)

*Nivîskar, helbestvan û rexnegira amerîkî
Dorothy Parker di 22 Gelawêja 1893'yan de
ji dayik bûye, di sala 1967'an, 7'ê meha
pûşperê de çûye ser dîlovaniya xwe.*

Annabel û Midgeyê rojêke şemiyê piştî nîvroyê bi kumkumandineke hêdî hêdî xwe herikandin menzela ku lê çayê vedixwarin. Firavîneke wek her roj xwaribûn. Şîrîn, nîştasteyî, tewaşî û bi rûnê mergerîn. Wan timî sandewîçên nanê şikeva yên germ, spî ku wek sungêr in, bi tewaş û mayonez in dixwarin. Keka stûr ku bi dewisandinê hatiye tenik-kirin, navberfeşîr, krema û çiqûlataya helandî û bindeqên hûrkirî bi ser de ne, xwaribûn. Carna jî nanê şilîkî û mêrge. Mêrgeya bi çend çeniyên goşt, kizik û bi ava bacana hatî sorkirin. Hevîrekî nav şekir dagirtî; şekîrekî zer, wek melhemek li ber rojê mabe ne hişk û ne ron, dixwarin. Jixwe tiştêkî din ê xwarinê tune bû ku hîlbijêrîn an jî nikaribûn tiştinê din bi ber dilê xwe ve bibin. Çermê laşê wan wek rengê kulîlka gulênîsanê, newqên wan pehnî zirav û bi pêşîrên wan ve misêwa, wek xortên hindistanî yên wêrek xuya bûn.

Annabel û Midge du hevalên gelekî qenc bûn, heta rojekê Annabel karê stenografiyê di wê firmeya Midge lê dixebitî de dît. Ev îro jî du salan zêdetir e ku Annabel li beşa stenografiyê kar dike. Heftaneya xwe zêdetir kir û ew hejdeh dolar û pencî sentan distîne lê belê Midge hê jî şazdeh dolaran distîne. Her du keç bi malbatên xwe re dijîn û nîvê diravên xwe didin wan.

Li ofîsê kursiyên keçan li rex hev bûn û her nîvroyê bi hev re firavîn dixwarin û ji kargehê derdiketin diçûn ber bi malên xwe ve. Gelek şev û rojên şemiyên wan li gel hev derbas dibûn. Pir caran bi du xortên ku her carê tînguhertin re bûn, ev çar kes hemî wextan ne bi rekûpêk bûn. Du xortan bi lûbîn û giryan civan li dereke baş bidana lê du xortên din, bêfedî li dereke bêpêwendî û ne baş.. Birastî, wextê ew nû dihatin ji dûr ve gelekî diyar bûn. Keçan her dem saetên xwe yên germ ên piştî nîvroyên şemiyên bi dilê xwe, bi hev re

dibihurandin. Wan tu caran cilên xwe yî li febrîqê li hevaltiya xwe nedikirin.

Ew dişibîyan hev, lê ne ku taybetiyên wan dişibîn hev. Şikl û şemala bejna wan, liv, xemilandin û teşeyên wan dişibîn hev. Annabel û Midge tiştên ku wan xebatkarên ofîsê nikaribûn bikin bêtirs (û bêfedî) dikirin. Lêvên xwe û neynûkên xwe boyax dikirin, mijgulên xwe kil û porê xwe rengvekirî dikirin û lerizîneke bêhnê difurandin derdora xwe. Wan cilê tenik, biriqandî, teng, pêşîr vekirî û kirasên dawên wan li ser kab(ok)an û şimikên qayîşî, pehnî bilind li xwe dikirin. Ew gelekî diketin çavan, erzan û bi cazîbe xuya dikirin.

Aniha, wexta ew bi dawên xwe yî li ber bayê germ li ba, di kolana Fifth Avenue re derbas dibûn çav û dengên keservedana gelek mirovan li ser xwe dihiştin. Xortên kombûyî henijî û xilmaş bûyî di bin simbêlan re dikirin pistepist, keserên dilê xwe bi kwîrandinan di-anîn zimên. Annabel û Midge berê xwe ji wan guhertin, serê xwe bilind kirin û gavên xwe wek gundiyên karên wan pir, bi hemd û lez avêtin.

Gelek caran, keç(ik)an ji bo lîstika ku gelekî jê hez dikin û xweş bilîzin piştînivroyên vala diçûn li Fifth Avenueyê dimeşîyan.. Yekê dikaribû li hemu deran bilîze. Lê ya rast, wan camekanên mixazeyan ên herî xweşik du lîstikvanên hêja û bijartî pêk anibûn.

Annabel a ku lîstik afirandibû; an jî wê lîstikeke kevn hêdî hêdî bi pêşvê biribû. Rastî gelek cudahî di navbeyna lîstika berê de nebû. Lîstik li dor vê pîrsê digeriya. **"Te dixwest çî bikî ku milyonek dolarên te hebûya?"** Lê Annabel şêwazîn nû bi ser lîstikê ve zêde kiribûn û ew watedar û dijiwartir kiribû..

Şêwazê lîstika Annabelê ya nû wiha bû: Gerek yekî mirî were hilbijartin; bêşik, divê vî yekî milyon dolarek mîrate hiştibe. Lê gerek ev pere bi wesiyetnameyekê hatibe erêkirin. Di wesiyetnameyê de gotibe heta çerxiyek pere nemîne, pere hemûyî, ne ji kesî din re, tenê ji xwe re xerc bike.

Lîstik bi rîsk bû. Mînak, eger lîstikvan xwe

ji bîr bike û di lîsteya mesrefan de kirêya xaniyê malbata xwe binivîse dê ew heqê xwe wînda bike û dora lîstikê biçe ji yekî din re. Tiştêkî herî balkeş ew bû ku gelo wê çend caran lîstikvan – tevî pîrikê – bo şaşîtiyên xwe bîn cezakin.

Rast e, jixwe divê lîstik bi hêz û heyecan were lîstin. Divê her tişt bi zaneyî hatibe hilbijartin û divê bi gengeşîyan piştgirî lê hatibe kirin. Kesî zêde ji vê lîstikê çê nedigirt ku gelekî bilîze. Yekem car Annabel qala vê lîstikê ji Sylvia re kiribû. Sylvia keçeke din a ku li ofîsê dixebitî bû.

Pêşî, Annabel qala lîstikê kir bê çawa tê lîstin, piştî ji Sylvia pîrsî, "Tiştê ku te dixwest pêşî bikî çî ye?"

Sylvia rasterast û bêtirs û bêhenek got, "Baş e," û piştî domand "tiştê herî pêşî ku minê bikira, ez ê biçûma derveyî welêt û min ê qesasek bi pereyan bigirta û ev jinika ku navê wê Gary Cooperê ye bida kuştin...."

Lê, mirov dibêje qey, Xwedê Annabel û Midge ji bo bi hev û din re vê lîstikê bilîzîn, bibin hevalê hev daye. Midge ji wexta fêrî lîstikê bûye û heta niha bi hostayî dilîze. Ew keçeke ku bi nermbûna destê xwe her tişt rihet kiriye ye. Guhertinên Midgêyê tiştên herî ecêb; ew kesê mirî û pere hiştî gerek ne kesî tu jê hez dikî be an ne kesekî nas be. Gerek ew ê pere hiştî, te li derekê dîtibe û ji nişka ve nîqûtibe dilê wî.

"Ev keça hanê diyar e gelekî tiştên xweş li dor peyde ne, wextê ez mirim ez ê milyonek dolar jê re bihêlim.." Mirina wî kesî gerek ne bi derbekê û ne bi jan û elem be. Yê bi xêra xwe pere daye, gerek bi salan bi rihetî jiyabe û her dem ji bo çûyîne amede be, hêdî hêdî piştî xilmaşiyekê di xew re here û bi nermî bar kiribe ber bi bihuştê ve. Ev neqş û xemilandinên li lîstikê hatine zêdekirin, dihiştin Annabel û Midge bi dilxweşî û kefxweşiyêke biwijdan lîstika xwe bilîzin.

Gava Midge dilîst bicidibûneke taybet û balkêş xwe dida lîstikê. Cara yekem Annabelê got; eger milyonek dolarên min hebûya, min ê pêşî sakoyekî rengzîvîn ji kurkê rovî bikiriya.

Midgeyê wextê ev bihîst wek kulmek li devê wê ketibe ma şaş, keserek veda û wek mirovekî/e bixwaze bibêje ev tişt hilbijartî ji rêzê ye.

Annabel ji ya xwe daneket û bi bersiveke tûj got, "Çima welê, na wele ev ne tiştêkî ji rêzê ye."

Midgeyê got, "Tu çêtir dizanî" û lê zêdekir "Sakoyê zîvîn ji kurkê rovî bi hemû kesan re heye." Piştê serê xwe hejand û bi bîr anî ku çênabe ku yek kurkê zîvîn hilbijêre.

Wan çend rojên pêşiya me, keşan hev û din zêdetir dîtîn lê axaftin ji wan pîr çênedibû û êdî hay ji axaftinên xwe mabûn. Yekem car ew nelistîn. Annabel, sibehekê wextê da devê deriyê ofîsê ber bi Midgeyê ve hat û got ku biryara xwe guhertiye. Naxwaze çerxiyek pere jî ji milyon dolarên xwe bide sakoyê zîvîn ê ji kurkê roviyan. Di cih de, wextê pere ketin dest, wê sakoyekî vîzonî hilbijêre.

Midgeyê keniya û çavên wê biriqîn. Wê got, "Bi ya min" û domand "Jixwe, te tiştê herî rast kir"

Dîsa wek li Fifth Avenueyê bimeşin dest bi listikeke nû kirin. Rojek ji rêzê ya meha îlonê germ û rijî, ba û toz bû. Mirov diterpilîn û dişewişîn lê keşan bi hev girtibûn, wê piştî nîvroyê meşêke rast layiqî du keçên pêmvanan ciwan e. Êdî, bo destpêkirina listikeke nû tu sedem li holê nemabûn. Annabel hêdîka hat xwe li dilê meselê danî.

Wê got, "Baş e." û domand "Erê, vêca te milyon dolarên xwe jî stend û niha, tiştê tu yê pêşî bikî çi ye?"

Midgeyê bersivand, "Ma ez çi bêjim!? Tiştê ez ê pêşî bikim.." bersiva xwe yî sar wek ku berî niha jiberkiriye domand, "Ez ê ji xwe re sakoyekî vîzonî bikirim."

Annabel got, "baş e."

Bê lome Xwedê yekî bistrênê, vê germê kurk û mûyên hiriya reş, te digot qey wê jî bersiva xwe ji ber kiriye domand, "Ma ez bibêjim çi, kurkê te yî reş î vîzonî li te pîroz be.."

Qederekê bêhis û deng meşiyar. Piştê çavên Midgeyê li camekana mixazeyan ket. Biriqandineke xweşik û kubar bêqisûr li ser reşahiyekê dabû der.

Midgeyê ji nişka ve got, "Na..!" û domand "Na, min kurk navê.. Ez pêşî naxwazim kurkê vîzonî bikirim. Tu zanî dixwazim çi bikirim!? Ez ê ji xwe re ristek durr bikirim. Ne durrên qelp, ristek durrên rast.."

Çavên Annabelê dan du Midgeyê û ew şopand. Bi dengê hêdî got, "Erê wele" û axaftina xwe domand "ha vêca biryareke gelekî baş e û bi aqilan dikeve. Tu dikarî bi her cilî re têxî gerdena xwe."

Bi lez çûn miqabilê camekana mixazê rawestiyar. Li hundir, cotek ristokên qopçekirî li dor gerdenê qedifeyî dibiriqand.

Annabelê pirsî, "xwişkê gelo, wê ev bi çiqasî be?"

Midgeyê got, "waa weylê, ma ez ji ku zanim, rebenê.." piştê domand,

"Bi texmînî, ne erzan e.."

Annabelê got, "wek hezar dolarî!?"

Midgeyê got, "na yadê, ma hezar dolar çi ye! Bi gumana min zêdetir e, zimrûdek kesk bi ew qasî ye."

Annabelê got, "naxwe, tu dibêjî deh hezar dolar?"

Midgeyê got, "vêca, ez hew dizanim."

Annabelê hew rawestî û got, "ma tu diwêrî herî hundir bazar bikî?"

Midgeyê got, "erê, ma bazarkirin jî bi pereyan e?"

Annabelê got, "ji dil, bi rastî tu yê herî?"

Midgeyê got, "nizanim lê çima ev dikan piştî nîvroyan girti ne?"

Annabelê bi ser ve kir, "erê, heqet, çima?" û domand, "va mirov ji dikanê derdikevin der. Diwêrî!? Dergevanek li devê derî ye."

Midgeyê got, "erê" û domand, "lê pêwîst e tu jî werî!"

Ew çûn li ber dergevan geriyan ku destûra wan a hundir bide. Dîwarên hundir hawîrdor bi mobleyan rapêçayî, li zemînê xaliçeyên nerm raxistî, xweş, aram û têra xwe fireh û narîn bû. Lê keçan wek ku li koxekê ne, madê xwe tirs û tal kiribûn. Kardarekî paqij, zirav û dirêj hat bi serê xwe silavek bixêrhatinê da. Ji ber madê keçan, li rûyê wî yê pak, qet, tu veguhertin nexuya.

Bi awayekî gelekî nerm ku ava çeman diçikand wî got, "rojbaş"

Annabel û Midgeyê bi zaravayekî qeşa girtî gotin, "rojbaş" Karmend got, "kerem bikin..? Gelo.."

Peyv ji nişka ve bi lez ji devê Annabelê weşyan, "tenê me ji xwe re li derdorê dinêr."

Karmend wek bibêje serçavan serê xwe tewand.

Midgeyê wek çend peyvên stranê bibêje; "ez û hevala xwe, tenê em derbas dibûn" rawestî kêlikê, û me xwe li vir dît" û domand, "ya rastî em mereq dikin gelo ev ristikên we yên durran ên camekanê bi çiqasî ne!" Karmend got, "belê.." û domand, "xanim, biha ye du ristikên wan bi du sed û pencî hezar dolaran e"

Midgeyê got, "erê erê.."

Karmend dîsa serê xwe tewand û got, "bi rastî gerdeniyek gelekî xweşik e" û pirsî, "hûn dixwazin ji we re derxînim lê binêrin."

Annabelê got, "na, ne hewce ye, malî ava.."

Midgeyê got, "tenê, ez û hevala xwe em derbas dibûn."

Ew zivirîn ku herin; çûn, wek çawa hatibûn. Karmend xwe çendî derî kir û ew vekir. Ew ber bi derve ve bi liveke lezgîn hatin maliştin.

Keç qederekê bi madê rûyên xwe li Avenueyê meşyan.

Annabelê got, "pepûk!" "Min qirikê! Ya star!"

Midgeyê got, "dused û pencî hezar dolar!"

"Ev çarek milyon dolar, gidî!"

"Wî aqil berdaye!"

Bi rêya xwe de meşyan. Hêdî hêdî hebitandina wan wek ji ser rû yên wan av biwerive herikî çû. Milên xwe di ber xwe re xuriqandin û bi dil piyên xwe bi erdê ve xijandin û meşyan. Gelek caran li hev terpilîn lê bê bexşînxwestin û bê his û deng, bi çavên xumamî bi rêya xwe de çûn.

Midgeyê ji nişka ve piştî xwe rast kir û serê xwe hilda û bi dengêkî fesîh axivî.

Wê got, "bihisê Annabel," û domand "Mêze. Hesêbî va ye ew zilamê çepel î dewlemend li wir e, dibînî!? Tu nizanî gelo ew li wir e, lê ew te ji derekê dibîne û dixwaze tiştêkî ji te re bike. Mêze, yekî pîr û bêmîrê e, dibînî ne wisa? Ê vê carê, ev kes wek di xeweke şîrîn de here mir û **deh milyon dolar** ji te re hişt. Aniha, Tiştê pêşî çî ye, ku te dixwest bikî?"

Ji inglîzî wergerandin: Aydin Rengîn:

renginaydin@hotmail.com

Tol zava ye mirin bûk e

Selmet GULER

Darbest li milan...

Ber bi gundekî çiyayî, ber bi girekî bi dar û devî ve mîna ava çeman bê his û bê deng em diherikin.

Bi zarezar, qîreqîr û tilîliyên kurtebir û teqeteqên çekan ku deng didan çiya û newalan em hatin pêşwazîkirin. Pîr û kal, qîz û xort, zarok û kirîvên li der û dora gundên çiyayî li tabûtê, li korta gorê hatin hev.

Zîqezîqa bizmaran hate guhên min. Ez nepenî bûm, lê ez têngihîştî ku êdî devê tabûta darîn vedikin. Xortê nozdeh salî ku di nava kefenê spî de vezeliyayî wê ji tabûtê derxistina.

Xalê Şakir ber bi tabûtê ve meşiya lê piştî çend gavan sekinî û destê xwe yê çepê ber bi nav komê ve dirêj kir û got:

“Bisekinin! Diya wî dixwaze wî bibîne”

Ji hêla koma jinan jineke şar-reş ku yek-ker mirov ji ber dibûn du seq hêdî hêdî ber bi nav komê ve lewlibî. Û gava çavên wê bi termê kurê wê yê ku bi kefenê spî hatibû pêçandin ketin, bêtî wê gewdê wê yî kokim bi ser tabûta dev-vekirî de xûz bû. Ji nava koma jinan jineke din ku wê ji xwestibû li pey jina şar-reş here û rûyê xortê kuştî biramûse, lê yên li derdora wê hişk bi zendên wê girtin û nehiştin ji cihê xwe bileqe. Jinê berê xwe da tehtekî raserî nav komê, hilkişiya serê latekî bi xiram û gazî dayika Bozo kir.

“Keçê porkurê, gulibirê yadê, rûyê wî ji dêvla min ve ji maçî bike û jê re bibêje bê qey tu nabînî ev qas kom bûne ji bo dîlana te. Bibêje de rabe! Şal û şapikên xwe yên botanî bi ser bejna xwe ya zirav de hilkişîne û bixêrhatinê bide xwediyê terş û talan û heyf û tolên giran ên eşîra çiyayî û bikeve serê govendê, desmala min a heftrengî bi reqs-lepte toranî bihejîne.

Gundîno, pismamino çima hûn naleyîzin û

hûn dîlokan nabêjin, qey hûn nabînin îro dîlana birayê min î Mirad e. Çima em nizanin bavêjin ser birayê xwe yadê, dapîra cîran, Hef-seda Nûrê, şevê din çendî xweş digot. “Weled Bozo, weled birayo, weled Miradê diya xwe yî bêmiraz.” Ev kiras çendî li bejna birayê min î Bozo tê yadê. Weled Bozo, weled birayo neferê bavê min kelemê ber çavê dijminano...

Piştî dayika Bozo bejna nûgihayekî çardeh, pazdeh salî jî bi ser tabûta devqîç de xwar bû. Dayika ku geh dêmên xortê di nava kefen de maç dikir, geh bi çavan û geh jî bi birhên wî yên kevanî şa dibû û geh jî mîna shehekî darîn bi serê tiliyên xwe porê wî yê gelicî şayîk dikir. Xwe ji ber nûgihayî da alî. Gava çavên nûgihayî li rûyê birayê wî ku ji kefen spîtir dixwiya ket, mîna kokelekî di ciyê xwe de sekinî. Û dengên ku ji hawir digotin; “dereng e!” Yekî got “bes e êdî wan bidin alî” yekî din got “dev ji wan berdîn bila kela xwe bişkînin” yekî din got “qey hûn ewran nabînin?” Yekî din got “divê beriya baranê bê veşartin!” Yekî din got “dayik gune ye, bila xatir ji lawê xwe bixwaze” yekî din got “beriya ku gunehên ev qas kes bikeve sikurê, divê were veşartin” jî his nedikir. Tenê dema dayika wî destê xwe yê rastê bi dîlovanî danîbû ser serê wî û jê re gotibû “lawo êdî xatir ji birayê xwe bixwaze” ketibû guhên wî nûgihayî wekî ji xew şiyar bibe hêj ji nû ve xwe bi ser tabûta dev-vekirî de xûz kir. Gava lêvên wî yên taze gihîştibûn dêmên birayê wî, dêmên ku ji cemedê sartir û ji berfê spîtir bûn, wekî şitleke erdnegirtî ku bikeve himbêza pêlên bayekî nû di ciyê xwe de lerizîbû.

Ji xelesa nîvkomê melayê ku wê terqîn bixwenda hay ji tîrsa nûgihayî bû. Loma bi hêrs bang kir “ji bona Xwedê kesekî ku wî xortî bide alî tune ye? Qey hûn nabînin rebeno dike dîn bibê!” Du kesên nêzikî nûgihayî bi hev re destên xwe avêtin çembilên wî û bi lezûbez ew ji ser tabûta devqîç a termê birayê wî dan

alî û li derveyî komê rûnandin. Gava Xalê Şakir dengê melê kiribû êdî çavekî wî mabû li korta gora axa sar û yek jê jî mabû li ser nûgihayî yê ku ew ji nîvkomê hatibû bidûrxistin. Nûgihayî, dema rûnişt xwe bi tena serê xwe his kiribû. Lewra rabûbû ser xwe û li dora xwe nihêribû lê, tu dilsîvanokên ku xwe bide ber siya guliyên wan neketibûn ber çavên wî. Lê her bi çavnêrînên xwe yên zelûl û çend jî xembar li derdorên xwe dinihêrî û gava çavên wî ketin zîqa çavên bavê wî nûgihayî kir ku biqîre lê, girêkeke ziwa di gewriya wî ya zîxelankî de peyde bûbû, derfet nedabû awazên êşa dilê wî. Tenê du rondikên bercêwî gindirîbûn ser dêmên wî yên wekî pelê cixarê spî û ew çend jî narîn. Nûgihayî, piştî xwîsiya ziraviya gewriyê ya ku wekî benîştê benika bi tengasiya gewriya wî ve zeliqîbû daqurtand hêj ji nû ve girîbû û qîriyabû û bi qîregiriyê xwe re jî ber bi Xalê Şakir lewlibû.

Wextê Xalê Şakir dît ku hevalpişteki Mirad wekî dara binbirî bi ser de hate xwar, her du zendên xwe vekirin û lawê xwe yê ku bi bejn û balê dişibande Miradê Boz girt û bi ser cegera sotî û dilê xwe yê daxdayî de, heya ku jê hat dewisand. Nizanim çima lê piştî ku Xalê Şakir dît ku termê Bozo ku êdî dadixistin korta gorê, maçeke dirêj li textikê eniya nûgihayî ya pan danîbû.

Li ber çavên Xalê Şakir kezeba wî diçû korta gorê. Lewma her çavekî wî ber bi korta gora axa sar ve bû. Ji hêla din ve jî geh nûgihayî himbêz dikir û geh ew radimûsa. Gelo, Xalê Şakir li ser bedena nûgihayî bi Miradê ku xelkê jê re digot Bozo şa dibû? Yan tîrsa windakirinê ketibû hinavên wî û dixwest ê li ber çavan û di himbêza dîlan de biparêze û di quncika cegera sotî û dilê xwe yê daxdayî de veşêrê? Yan wekî malzaroka ducanî her du daxwaz bûn? Hê jî kes nizane.

Hew tiştê ku tê zanîn di himbêza bavê xwe de jî dibû îskeîska nûgihayî. Çendî Xalê Şakir gotibû: "Lawo negirî, bexê min megirî"

Lê reşbelekên çavên nûgihayî hêj hêstir bi kulman dibarandin. Xwîsiya girî carina diket gewriya Xalê Şakir jî lêbelê, Xalê Şakir diviyabû xwe ji girî û hêstirên çavan dûr bike.

Çimkî li gorî bîr û baweriyên wî û yên li der û dora wî, roj ne roja şînê û girî bû, roj roja tol û heyfê û mêraniya mêrê çê bû. Loma awir-ramanên Xalê Şakir ew dibirin deverên dûr, rêyên nedîtî. Xefokên mêjiyê wî, berê wî didan labîrentên genî, labîrentên ku ji bili xwînsora xwîne pêve tu rengên din li wan nedihatî dîtî. Di wan rêçikên ku ji soriya xwîne hatibûn pê, ramanên mêjiyê wî û kerba kezêbê, nîgardîmenên kûr, bîrên bêbinî, rêyên bê ser û ber didan pêşiyê. Berê Xalê Şakir diket reşnewalên kûr, reşnewalên ku ji bav û bapîrên wî jê re mîrate mabûn. Carina jî siya kesên der û dora wî didan pêşiyê û bêtî wî ew dibirin xefok û labîrentên sorê sorgulî. Xalê Şakir di reşxefokên reşê bê ronî de xewn û xewnerojkên xirab didîtin. Bi xewn û xewnerojkên ku di emrê xwe de hêj nû didîtin de dihilçenî. Çendî ku Xalê Şakir di reşxefokên xelkê çiyayî de bi xewnên xirab dihilçenî jî, ya zor zehmetirîn ji hemûyan ew bû ku her gav û her kêlî xewnerojk li ber çavên wî dihatî dubarekirin. Gelo xewn û xewnerojkên sorê genî wê çend şev û çend roj li Xalê Şakir bigeranda û wê xewa şevan lê biherimanda.

Belê li gorî bîr û bawerî û mengenînen xelkê çiyayî Xalê Şakir ketibû bin barê tolê, heyfa giran ku di nava wan de wekî serbilindahî û rûmeteke herî mezin hatibû xuyakirin.

Beriya terqîn û yasîne ewrekî reş mîna qetrana qîrê hat û wekî hutê heftserî tîrêjen zêrîn bi carekê girtin û baranê lê kir. Min li dora xwe nihêrî çavên tevahiya mirovan sor dikirin. Bêguman sibata dînik Xalê Şakir jî şil kiribû lê, hinarokên rûyê wî hê jî ziwabûn.

Xalê Şakir sê, çar gavan ji korta gorê dûr bû. Her du destên wî li ser navika wî girêdayî bûn. Saqoyekî qehweyî ku ji jêr de du bişkok jê ketibûn dirêjî bin kabokên wî dibû. Şalekî ku delingên wî çar tiliya bi ser gûzekên wî diket û rengê wî mîna asîmanê rojên havînî ku şinahî ber bi spîtahiye diçe li ser çokan bû. Qutikekî ku dirûna berîkên wî ji rexê rastê ve ser tiliyekê berdabû û bi salan li ber tava havînê spîçolkî bûbû, li bejnê bû. Cotek pêlavên ser kelpitî ku rengê wan û tozê têkilhev bûbû di lingan de bûn. Reşikên çavên wî yên ku di

rengê saqoyê wî de bûn îro di nava spîkên çavên wî de piçûktir dixuyan. Rûyê wî mîna teht û latên qulqulî hemû xurî bû. Lê, xuriyên ku îro xwe berdabûn hinavên Xalê Şakir ji yên rûyê wî kûrtir dixuyan. Gelo kesî dikaribû ku-rahiya xuriyên nava wî bipîve yan jî kerba dilê wî biwezîne?

Bejna wî bi ser destên wî yên ku li ser navika wî hatibûn kelemçekirin de xûz bû. Awirên wî yên rengîn hêj ber bi Mirad ve bûn. Serê wî ber bi milê wî yê çepê xwar bû. Bejna wî ya zirav û ew çend jî dirêj mîna spîndareke ku bayê payîzî wê bibe wî alî û bîne vî alî diçû û dihat.

Ji nava koma jina, dapîreke Suryanî Qadîm, jina ji lingan heya bi serî reş girêdayî, jina ku bapîrên Xalê Şakir wekî yên xwe dihesibandin destekî xwe ber bi Xalê Şakir ve dirêj kir, got û biland:

“Wey birayo Şakiro, keleha xwîniyan, konê qelsayo, malbavanê min, xafîrê bav û kalên min, ez reben birayo...!”

Xalê Şakir, wekî nû ji xeweke giran şiyar bibe serî rakir û li derdorên xwe nihêrt.

Du qîzên ku xwe ber bi nava komê ve gur dikirin ketin ber çavên wî. Qîzan bi lub lub û bi zarezar digotin;

“Em dixwâzin birayê xwe bibînin” Lê kesên ku li korta gorê bûbûn xelek nedihîştin ku her du qîz nêzî nava komê bûbûn. Lê qîzên ku wekî du karxezalan nedihatîn zeftê, hey xwe ber bi nava komê ber bi tabûta ku nizani-bûn ku êdî vala ye çen dikirin. Xalê Şakir ber bi wan ve beziya, dema gihîşt hinda wan, zendê xwe vekirin û bi salîbkî qîzên ku di dil xwe de xwe ber bi termê birayê xwe ve çen dikirin, dût bike, lê her du qîzan bi hev re xwe avêtin pêşîra wî û mîna dargerînekên dar û devîyan her çar çengên xwe li noqa wî gerandin. Pêşîra wî jî ji serên xwe re kirin palgeh û bi dorê wiha gotin:

“Yabo; kanê Bozo? Kanê birayê me?” Wî got:

“Lawo negirîn, berxikên min megirîn”

“Yabo; kanê Mirad? Kanê kurê te?”

Di gewriya Xalê Şakir de girêkek peyde bû. Xalê Şakir fam kir ku hew dikare bersivê bide lê, dîsa hewl da xwe ku wan bibersivîne. Xalê Şakir; “Negr negr neg ne ne...” Xalê Şakir, hew dikaribû pirsên wan ên bêbersiv bibersivîne. Lê rondikên çavên wî yên ku diherikîn coya cotkaniyên rondikên çavên qîzan ji wan re kirin bersiv.

Dema melê terqîn xilas kir, kefa mistên tevahiya mirovan ber bi kûrahiya asîmanê hefte-tebeq ve bel bûn. Dengê parînan ên ji Quranê, yên ji Încîlê û yên ji Mishefa Reş têkil hev bûn.

Deng û hêvîşên vê xaka kevnare mîna nexş û nîgarên ku wêne pêk tînin ji hev cuda ne, lê wekî tiliyên destekî ne, dûtî hev tîn.

Piştî ewrê reş sê roj bûn, heyvek bû, salek, an jî bîst sal bûn, an jî hê wirdetirîn bû, qet nayê bîra min. Gelo xewn û xeyal bûn ez vê jî nizanim. Lê rojekê ji rojan dîsa ez ketim rê û rêçikên gundên çiyayî, gundên ku rê û rêçikên wan ez dibirim rûyên xemgîn, awirên melûl, dêr û kenîşteyên xerabe, keleh û kel-hoşkên bê nav û bê nîşan. Belê dîsa bûbûm mêvan, mêvanê çêliyên teyran, teyrên nikiltûj, teyrên xwekuj û teyrên xwexwer.

Li gundekî li qûntara çiyayekî dengê dahol û zirnê dengê çekan û lîlêlîlên ku li çiyayên bilind û newalên kûr dîsa deng vedidan hatin guhên min. Min xwe li gund girt û ez meşiyam. Dema min nêzikayî li rastegêha gund kir, rastegêha ku kesên gund jê re digotin “Bêndera Reqsê” min nihêrî ku keç û xortên gund mil dane hev û li ber dengê dahol û zirnê direqisin. Hinek jê jî hilkişiyabûn banê xaniyên xwe û berên tivingan ber bi ezmankî diberdan. Ez giham cem wan û bi çavên meraqdar min li kesên dora xwe nihêrî, hestên bi coş, rûyên bi ken, çavên biriqandî û biskên keç û bûkan ên sorehinekîrî bala min kişandin. Lê belê du kêmasiyên berbiçav hebûn, yek; kincên reqisvaniyên ku çarpîne dileyîzîn û toz bi ser milên xwe dixistin, ne yên dîlanên bûk û guhezîninên bûkan bûn. Dudu; bûk û zavayên ku ji miraza dîlan re dest didin hev û dibine hevparê jiyanê nû li meydanê nedixuyan. Loma hin bi hin hinek pirsên bê bersiv di serê min de pêk dihatin. Min berê xwe da kalekî

rîspî yê derî govendê û pirsên ku di serê min de pêk hatibûn min jê pirs kirin.

Kalê ku li bin siya dîwarê hewşa qesrekê rûniştî bû serê xwe rakir û li hêla dengê min nihêrî. Ji spîka li ser reşikên çavan û nêrîna wî ya ku rast li çavên min nedinihêrî min fam kir ku baş nabîne. Lêvên kalê rîspî yên ku mîna qurmê darên kevnare pûçeraxî hêdî hêdî ji hev çûn û ji nava wan dengê têrkese weha bi bersiv bû.

-Ez nizanîm tu çi kes î birazî. Lê welê xuya ye ku tu biyanî yî. Tu ji ku têyî û tu yê biçî ku ez wê jî nizanîm. Lê madem te pirsî divê ku ez te bibersivînim.

“Ev dîlan, dîlana tolhîlanînê ye. Lê mixabin xelkên me jê re dibêjin şahiya tolhildanê, birazî. Edî min famkir ku mirin jî bûk e, yanî tol zava ye, mirin bûk e” Min xatir ji kalê rîspî xwest, lingên xwe ji nava rimitînga pîkola govenda tolhîlanînê xelas kir û min pişt da toz û bahoza ku tovê mirovahiyê di navê de dihat fetisandin û ez meşiyam.

Wênêkêş bûm digeriyam, wekî nêçîrvanê pezkoviyên çiyayên bilind an jî xezalên binê beriyên. Ez di şewlekî teng û dirêj, şewlekî bê his û bê deng, şewlekî bê îns û bê cîns ez meşiyam û çûm û hey çûm. Ji kûr û dûr dîsa teqeteq hat guhên min ez meşiyam û min xwe li tu dangan nekire xwedî lê, her ez çûm, rê ez nêzî dangan kirim û dangan ez ber bi girekî dar û devî û ber bi şînahiya asîman hilkişandim. Dîsa tilîliyên keçên bavan, hawarên diyên xortan, teqeteqên kurên bavan bûn. Dîsa eşîreke çiyayî bi ser korta gorekê de pêl bûbû. Dîsa hêstir, dîsa karxezal nedihatîn zêftê û dîsa kofiyên reş bi ser kefenê spî de xûz dibûn. Xwisiyên ziwa yên girî dîsa bi girêkên xwe yên kor gewriyên zirav ên zîxelankî girêdidan. Xwediyê xewn û xeyalan, xewn û xeyalên kûr, xewn û xeyalên bê ser û bê bêr dîsa bi ser birînên necebîrandî de pêl dibûn. Dîsa berê rê û rêçikan ber bi xefokên tarî... Dîsa xwîn û soriya xwînê...

Wek reşperdeyekê dijminayî ketibû navbara rêroniyên xelkên çiyayî, xelkên ku xwe bi xwe dest xistibûn qirikên hev, hevdu dife-

tisandin û zêrêvî, av û avî û deşt û çiyayên xwe dihiştin ji dijminên xwe yên herî esasî re.

Bi dengê terqîna melê re, dayikek ji nava koma jinan rabû ser xwe û kire qîrîn û bi qîrînên xwe re ber bi bilindahiya çiyayan revî. Zar û zêçên wê jî wekî çêlkewên ku hay ji siya teyran bibin kirin qîrîn û li dû dayika ku direviya bi girîn beziyan. Dema dayikê dengê qîrînên zarokên xwe kir, xwe bi xwe di ciyê xwe de sekinî. Kabên wê yên ku êdî hew dikaribûn bi pêş de biçin bêtî wê fisiyan erdê. Serî kete ber û li xwe û li pêşeroja zarokên xwe kûr fikirî lê, li ser rûyê dinyayê tu tiştên ji xêra xwe û ya zarokên xwe re nedî. Dayikê serê xwe hilda reşbelekên çavên wê li kûrahî û valahiya fêlekê xwar man sekinî. Lê tu ronîstêrên ku rêyekê bidin ber li wir jî neketibûn ber çavên wê yên reş ên zeytûnî. Loma bi awayekî serhildêrî serî li asîman hejand û wiha got:

“Ax Xwedêyo! Qey min çi ji te kiribû ku te Hesenê min ji min stend û te ji xwe re bir. An Hesenê min çi ji xelkê kiribû ku xelkê ew kir gerewa tol û heyfên bav û birayên xwe.

Ax Xwedêyo! Kanê Hesen, kanê delalê dilê min? Kanê sêncî malê, kanê kêlika zeviyên min, kanê çîra malê? Kanê agirê tifika min? Kanê stûna xanî? Kanê konê dilê min?”

Jina ku qîrînên wê li heft tebeqeyên erd û ezman nedisekinîn berê xwe da gora mêrê xwe û wiha berdawam kir:

“Ax xaîno Hesen! Te derî li me girt û te em hiştin li ber dîwaran û tu diçî...!

“Weled şixulkerê malê, mevanê min î ezîz, beranê berxikên min...”

Mîna Stêrên Komika Sêwîyan, zar û zêçên wê li dayikê civîyan û hemû bi hev re xumîyan erdê... (2005 *Nisêbîn*)

Hesen û Elî bi textsîyêka sipî kewtê kuçê 1250 yê mehla Barbarosa Adana û ameyê ver berê keyeyê Xal Selîmî de vindertê. Elî textsî ra peya bi û textsî ver de pay ser o vindert. Di rey ke qorna textsî cenaya, Xal Selîm û Xalcînîya Meqbula berî banî ra kewtê teber. Elî ke çim gina înan bero peyên bi hurmet akêrd û aspar bîyayîşê xal û xalcînî ra dima ber na pa û o zî şî vernî textsî de

Rotişê yewbanî

Mehmûd NÊŞITE

kişta Hesê şofêrî de ronîşt.

Texsî ke kewte rayir Heseno şofêr bi xo bawer û emîn persê înan kerd:

-Xalcînî ti senîna hol a!

Xalcînîya Meqbula sey sermîyana xanedanan mendîla xo kîbar-kîbar newe ra raşt kerde û va;

-Homa şima verdo, Homa şima qeza û afa-tan ra bi pawo. Hesênê mi pey nê emrî de ma ko senî bê! şukur Homê mi rê, naye rê zî şukur....

Nê cewabanê xalcînî ra keyfê Hesênî zêdîya û hîna bi keyf verê xo çarna Xal Selîmî heta;

-Xalo ti senîne baş ê? Rewêna yo ez to nêvî-nena! Ti bî aşma binê hewrî! Ti hê ça?.

Xal Selîm nê zerrişenikîya Hesênî ra beşerya û va:

-Homo to verdo, Homa to ewladanê to serî ra kemî nêkero. Ti senîne baş ê. Ti qijanê xo ra xebere gênê nêgêne ê senîne, îşallah ê zî baş ê...De lalaw ti hê vînenê ma ko senîn bê. Homê mi rê şukur ma hema zî binê rehma ey de vîyar-nenê.

Hesen hetê şofêrî ra zî zaf jihatî bi. No rayir o qelebalix de çimê ey rayîrî ser de nê aqityêne. (nêbiriyênê) Labelê goşê ey vateyê Xal Selîmî sero bi.

No des rojan ra zêdîyo eke bibî sey yew keyyêk e. O rojo ke rotîş û erênayîşê banî ser o pê kerdîbî Xal Selîm tikê qerqelyabi la nê rojanê pe-yînan de hem Hesênî û hem zî Elî ra hes kerdîbi.

Xora Hesen o roj ra nat yew roj zî Xal Selîmî û Xalcînîya Meqbula tena nêverdabi. Rojêke hetê Awbendî (baraj) de, rojêke Çemê Ceyhanî de, rojêke zî çarşî de û parq û marqan de bi.

Hema vajêne şewînan û binê cay de xal û xalcînî tena mendêne. O wext zî wexto tena mendênê reyna qal û qiseyê xal û xalcînî Hesen bi. Qiseyê înan vişêr zî wina bî.

-Cinî; Homê nînan ma rê eşrawit. Ma go senî binê holî înan ra vejê. Ma rê bîyê sey ewladî...

-De ez vajî se, wile sey to ya. Tay mendibi eke

to banî nedênê înan..

Raşt a zî tay mendibi Xal Selîm û Hesen banî ser pê nêkerî. Xal Selîm vatênê "hetanî ez peranê xo temam nêgêrî ez qebl nêkena."

Selîm aşmêk verû cû banê xo yê hetê Mehla Seyhanî dabi rotîşî ver. Çend girotoxî vejîyêbî la Xal Selîm û ê girotoxan fîyetî ser o pê nêkerdîbî. O hewtay mîlyarî ra nêameyne war. Girotoxî zî bi o fîyet qebl nêkerdêne.

Nê germê hamnanê Adana de Hesen rojêk banê Xal Selîmî ver de vêreno ra û çimê ey gî-neno o kaxido ke hanîyo camê banî ya alaqnaye. Binê cumla peyên de numrê telefonê Xal Selîmî nusyayebi. Hes no numrê telefonî gêno û Xal Selîmî rê telefon keno. Têlêfonî ra dima we û Xal Selîm yenê tê lewe û bazarî banî kenê.

Hesen keno nêkeno, Xal Selîm hewtay mîl-yarî ra nêno war. Hesen peynî de qebl keno. La Hesen vera çend camêrdan yew şertê xo tera vano;

-Ez Almanya de xebetêna. No hewteyêko ez ameya Adana. Perê mi hê Almanya de, kekê mi het. Ez nika des mîlyarî bê'a xo dana to. Yan çar, yan panc roj ra dima perê mi yenê ez o wext perê to yê mendî dana to û tapo to ra gêna.

Xal Selîm verû cû nê şertan qebl nêkeno. La o wext çend merdimê ke uca de benê, kunê arê înan û Xal Selîmî neheq kenê. Peynîya peynî de xebere fînenê sereyê Xal Selîmî û Xal Selîm zî êdî yê şertan qebl keno.

O roj ra nat Hesen, Xal Selîmî tena nêverdêno û sera şîno sey ewro ey xo de çarnene.

Êdî rojî dêne rojan dima. Ravêrtîşê her roje de Hesen û Xal Selîm hinî bine nêzdî yewbînan. Xal Selîm û xalcînîya xanedane heme-hema heme rojî meymanê Hesênî bî. Dadê û babê ra Adana ra bî la belê, cayê ke Hesen înan berdêne û çarnenê ê hema ê cayan nêdî bî. Her gêrayîş de Heso zerrewêş tayna xo dêne heskerdişî. Her gêrayîş de Xal Selîm zî tayna bi Hesênî bawerî ardêne.

Nê nêzdî bîyayîş û bawerî ardiş ra pey êdî

qalê peran zaf nêbînê. Wexto qalî bîne zî Xal selîm xebera Hesenî fek de birnêne û nêverdêne qalê peran fek ra vejû. Êdî nê rojê peyên de va-têne;

-Hesêm, Hesêm ti çi gam û saet qala peran kenê. Kam ling no to ser. Sew, la qeyame weriştê we. Çi wext to rê werê ame ti o wext danê mi. Homa miradê to pê bikero, o ban êdî bîyo ê to.

Wexto qalê wînasî fekê Xal Selîmî ra vejîya-yênê to vatê qey yew dermano û hê sawenê birîna Hesenî. Hem weşa ey şînê hem zî sey dermanî gurê ey rê werê ameynê.

Nê qisayan ra dima bêhemdê Hesenî lewê ey ê qalînî cêra bîne û bi huyayîşêko hinî weş keyfê Xal Selîmî ardêne.. Xora gava lewê Hesî cêra şîne, pey fekê ey de her dî dindanê ey ê zerrênî asêne. O wext Hes hêrsbîyaye bo zî reyna rîhuyaye asêne. Nê teybîtîyeyê ey keyfê çewî hinî zaf ey rê ardêne.

O roj reyna Xal Selîm û Hesen hetê Awbendê Seyhanî (Seyhan Barajî) de sey rojê bînan gêrayîş de bî. Hewêko honik hetê bakurê awbendî ra ameyne. No hewayo honik, germê Adana de înan rê bibi sey dermanê birîna Hesenî texsîde bê hewa yê honikî boya kolanîya yê Hesenî û vengê dyîrê radyoyî keyfê înan gewz kerdêne. Hesen ewnîya ke radyo deyîra ke Xal Selîm tera hes keno vano, dest eşt radyoyî û vengê ci tîkê zî akerd û ro xo pey ser o fetelya û bi ruçikêka huyayîşî va;

-No hewayo weş nêbi qismetê xalcînî. Werrreka aye zî etya de bînê.

Xal Selîm goş kuwabi deyîre ser. Pira biluy deyîre bibi vengê Hesenî nêşnawitînê. Hesenî ke nêameyîşê xalcînî dila (tekrar) kerd Xal Selîm sey ke hewn ra werzîyo va;

-Hesêm ti vînenê radyo deyîra xalê to vano û derdê xalê to ê xortaniye tewerneno. La ti şînê mi rê qala xalcînî kenê. Ezê eka to û xalcînîya to pê ser nî haaaaa!

Nê cewabê Xal Selîmî vengê huyayîşê hirê hemînê û vengê giragira texsî kerd tîmîyan. La-belê nişka ve ra vengêko bîn zî kewt nê vengên mîyan.

-Zirrrrrr!... Zirrrrrr!... Zirrrrrr!...

Reya hîrêyin de Hes vengê radyoyî kemî kerd, texsî ant lewê rayirî û telefonê xo, xo ka-leke ra vet û şana goşê xo;

-.....

-Merheba Keko. Ez başa, baş. Lîya-lîya no çend rojo şima ça benê. Belkî ez se! rey to dima gêra wa, ez nêresa wa to. Sey şima nîya qurban, sey şima nîya. Şima etya de ma mehîr verdê. Kê ra nato ma banê şarê girewto ma hema peranê înan nêdayo înan.

-.....

-Keko sey ma nîya. wille-bîle eke yewo sey Xal Selîmî nêbîne bin ra qebl nêkerdêne.

-.....

-To va kamcî banqa?

-.....

-Banqa Zir'etî? Temam. Temam haydê-haydê ez reyna spas kena.

-.....

-Elêkim silam.

Pey ke Hes vengê radyoyî birna û bi telefon qalî kerd goşê Xal Selîmî bêhemdê ey şîbî o heta. Ewnîya ke qalê telefonî peranê banî ser o na rey heta tera amîye goşanê xo akerd û bi baldarî şana nê qalanê telefonî. Pey ke ê zî fam kerd ke perê ey amîyê hema keyfê a deyîra xortanî ra zafêrî keyfê xo ard û pey ra destê xo na kiftê Hesî ser û bi beşeryayîş va;

-Hesêm, Hesêm semedê peran to qey kekê xo endêke şegezna? Ma yewbînan rind şinasna û ecelê peran zî çin bi, rî mi ra to dî eke to seke.....

Hes bi hêrs fitêse ereba bedelna û vinavînêka pêt ereba ra vet û verê erebê xo tado rayirî ser. Hema qalî fekê Xal selîmî de bî Hes sereyê xo her dî hetan ser o reyêk, di rey berd ard û niçe-niçe kerd va;

-Xalo, xalo wexto mi û to ma pê kerd, ez gêrawa ey û mi heme çi ey rê va. Êdî heqê ey esto mi to vera bi do şerme....

Xal Selîm waşt ey aş kero, bi hêrs û bi payeyêko pîl va;

-Ez to ra vana wus be! Bes. Eke ra pey ti wus nêkerê ayê mi û to qedêno.

Xal, ewnîya ke Hesî ra veng nêvejîyeno, êdî ey zî vengê xo rona û bi şîret vatê xo domna;

-Lajê, lajê hezar olacaxî na dinya estê ke yenê sereyê însanan. Ganî yew boya xo hîra kero. Ganî yew bi sebir bo.....

Badê nê hêrs û şîretan Hes tay nerm bî.

-Xalo ez yena to destan ti xo aciz nêkerê. Ti vanê se xora sey to ya. Ti endêke pîlê û hol ê, ganî ma to ver dest pêser nê...neyse ez derg nêkerî.

Va û fetelya Elo ke hema qet qalî nêkerdbi ser;

-Elo law ; Kekê peran eşto Banqa Zir'etî. Ez vana qey a banqa honîya kiştê Saeta Qije de, ti şorê ê peran biacê ez û Xal Selim zî ma şêrê dayrê tapoyî ma êdî no gurê tapoyî biqedênê.

El tay fikirya û va;

-Mi yew dingê otobuse de ronê. Ez xo rê bi otobuse şêrî.

El ver yew dingê otobuse de peya bi, ê zî bi teksî rast verê xo dê dayrê tapoyî.

Dayrê tapoyî hema lewê Avbenda Seyhanî de bi. Elî ke dîng de nêro Xal Selim û Heso dindan zerrên tena teksî de mendê.

Hes hermê xo ê çepî na berê xo ser û verçimika xo a sîya da çimanê xo ver û badê ke tay vengê teybe zî akêrd veng da Xalê xo o ke pey ey de ronîşte bi;

-Xalo; ma do senî to xo vîra kerê? Eke şîya-yîşê minê Almanya ra nêbine û Homa zî bi vatêne e, ezê her roj biamêne şima het û minê sey ewladê şima persê şima bikerdêne û hetanî mi ra biameyne ezo bibêne miqatê şima zî. La ez sekerî xalo, homa vajo e pey gurê tapoyî ezê şêrê hetanî Almanya.

Bi qalanê sey nê qalan resê ver berê dayrê topo yî. Zereyê dayra de çend merdimî rêze de bî. Ê zî kewtê rêza pancine. Rêze ke amîye înan Xal Selim cuzdanê xo dergê înan kerd û agêra sandalî ser o nişt ro. Hesên zî tay xo dur da û telefona xo vet yewî ra çike va û ewnîya xo saete ra. Badî pey we zî ame Xal Selimî kiştê de ronîşt.

Des deqqe ra pey hema nişka ve ra;

-Zirrr. Zirrr.

Telefona Hesênî da pero.

Hesên ke telefona xo vet çim û goşê Xal Selimî zî şîbi telefonî het a.

-Elo

-Elo. Ha Elî vaje. Ti vanê se?

-Kekî peran namê to ser o şirawitê. Peran nêdanê mi.

-Wîîî.

Bi rîyê ka tal telefonê xo kerd cay ci û va;

-De eka ma ko sekerê haaaa ha. Honîye rêze zî amîye ma!

Xal Selim reyna rîhuyaye va;

-Sebî Hesêm?

Hes sereyê xo berd ard û va;

-Qey Homê ti vînenê xo rê. Peran namê mi ser o şirawito. Ez nêbî peran nêdanê Elî. Honiko rêze zî amîye ma. Mecmurî ra ma ko şêrê hetanî banqa û bêrê.

-Yanî eka ma do şêrê banqa û reyna bêrê etya.

-Belê-belê xalo. Ma sekerê Xalo zehmet beno la çare çinîya.

Badê nê qalan bi rîyêko tîrş û tal ewnîya xo saete ra û sey ke xo bi xo vajo;

-Saetêke dima zî dayrê qefelyenê.

Xal Selim destê xo da mîyanê ey ro û sey îcat-kerdêk va;

-Lalaw qey ma şinê reyna yenê. Honiko rêze amîya ma. Ma îşê xoyê tapoyî biqedênê û ma hema şêrê peran bigêrê!

Pey nê qalanê Xalî ra zereyê Hesênî de çirpî şî, La çike teberê ey de nêeysa.

-De xalo Homa pîl ti pîl. Ti vanê se ma go sey to bikerê.

Pey nê qalan memurê dayra ra vîndayîşê ka pêt vejîya.

-Selim Korkmaz.

Xal Selim senîke namê xo şinawit, hema dest eşt qolê Hesî xo dima kaş kerd û ro memurî da ra.

Heta nêma saetî o memur yew tapoyê bi

resmê Hesênî dergê Hesênî kerd û tay peran Hesênî ra waşt. Hesênî peranê ey da ey û we û xal xo pey ra fetelyê û ecele-ecele resê teksî.

Wexto resê banqa hema nêma saet qefelnayîşê banqa ra bibi. Hesênî vernî de Xal Selîm zî ey ra dima kewtê banqa.

Banqa qelebalix bi. Di hîrê cay de şar rêze de bi. Hesênî Tay nata-weta ewnîya û va;

-El ho ça? Ganî ma rê numrê rêze bigirotêne. Sera şî gelo?

Nê qalan ra pey dest eşt qolê Xal Selîmî û kaşê ro sedirî kerd. Bi zarê ka hînî weş tera va;

-Xalo dê ti etya de ronîşê, ez biewnî El kewto teber sera şî. Numrê rêze girewto. Beno ke nika dor bêro ma, wa dorê ma nêşo.

-Bewnî Hesêma bewnî. Ez ha etya de ronîşte.

Hes bilezkanî kewt teber. Xal Selîm zî ser sedirî de ling eşt lingî ser o û pabayê Hesî vindert.

Şarê banqa hew-hew kewtêne teber. Çendêke şîne şarê ke rêze de bî yê zî bîne tay. Reyna zî çimê xalî bi meraq berê banqa ser o bi.

Hetanî ke kes banqa de nêmend Xal xo sedi ra ser de tînêda bi. Wexto yew memur ame Xal Selîmî îqaz kerd êdî bêhemd werişt xo ser û kewt teber.

Berî ver de şî-ame, şî-ame hetanî banqa qefelya. Pey ke berê banqa zî qefelya ro keye da ra şî û rayir de xo xo va;

-Hes keyeyê ma zano, ya eka ho keye de ya zî eko şan de bêro keye.

Wexto resa keye Hes nêamebi keye. Hetanî wextê rakotişan reyna Hes çînê bi. Reyna va;

-Eko ya siba bêro banqa û ya zî eko bêro keye.

Serê siba badî arayî şî banka. Wexto şî cînîya xanedanan ra wesêna va;

-Eke Hesênî ame ez ha banqa de, wa bêro banqa.

Xal selîm o roj zî heta banqa qefelya banqa de

vindert la reyna Hesênî çînê bi. Ame keye reyna Hesênî çînê bi. Serê siba werişt şî banqa û heta şan banqa de pabayê Hesî mend la Homa Hesî bido. Çar roj serê siba ame banqa û şan de şî keye. Ewnîya ke Hesênî bîyo cim û celat rojo pancin otobos aspar bi û şî Mehlê Seyhanî keyeyê xo yê ke rotibi Hesênî.

Berê Doxan Apartmanî ra kewt zere. Şî qata çarine. Wexto ame ver berê xo yê dîyes numreyî berî akerde dî. O wext Hesê eyê rihuyaye ame ey vîr. Bi keyfêko bê emsal kewt mîyanê berî.

Ewnîya ke yew cînîya serepiştî ha ey zeran pak kena. Va qey na cînî cînîya Hesîya û sey ke vîndo Hesî bi nê hîsan va;

-Veyvekê qewet bo.

-Homa razîbo xalo.

-Hesê mi keye de yo.

-Hes kamo xalo. Ti şaş ameyê. Etya de bi namê Hesî yew çînîyo. No ban hîrê roj verû cû ma girewto (erêno) .

-Lalaw ti vana se no ban, banê mino.

-Mi va xalo hîrê roj verû cû ma bi şestî mîyarî girewto.

Badê nê qalanê cînîya serepiştî ra yew tîre şîşê sînê Xal Selîmî kerd û Xal Selîm bi dalpe û ame war. Şarê ey zeren ey girewtê eştê Nêweşxanê Nimuneyî.

Badê di saetî yew sela vînda. Cumla peyêne de va;

-Yewêk bi namê Selîm Korkmazî wefat kerdo. Cenaze badê nimajê nêmrojî dariyeno we. Homa rehma xo ey kero.

Tu li dengê ku ji derve tê hay dibî. Bêhemd tu ji cihê xwe hol dibî. Tu xwe li deriyê şaneşînê digirî û tu bi lez derdikevî derve. Eyn wek yek destê xwe di qirika te xe hilma te diçike û dinya li ber çavên te tarî dibe. Gêja te diçe. Tu destê xwe diavêjî derî û tu hinekî wilo disekinî. Bi qasî ku tu yê bipexivî hilma te tê ber te. Bê hemdê xwe tu ji cihê xwe hilor bûyî lê tu bêhemdê xwe napexivî. Tu bi devê xwe

Şorê

Ronî WAR

dikarî. Tişta ku tu di hundirê xwe de dibêjî tu der-naxî derve. Tu ji cîrana xwe re dibêjî, "Cîran îro ne roja dawşandina xalîceyan e! Ma tu nizanî? Ew qasî ez ji te re dibêjim, 'gava ku tu yê tişteki dawşînî ji min re bibêje; ez tiştên xwe rakim.' Wergî me ji te re got wextî mû bi zimanê me ve bê gidî! Lê tu dîsa bi ya xwe dikî!" Ew dibêje, "weleh rast e. Xebera te ye, heqê min kuştin e yadê. Qurban tê li qisûra min nenêrî yadê!" Tu diqirqilî. Te nuh kincên xwe raxistine. Tu li wan dinêrî, dilê te dêşê. Tev lewitîne. Tu radibî wan didî hev û tu tînî dawêji teştâ kincên gemarî.

Destê te ji kar sar dibe. Tu nema dikarî tu karî bikî. Jixwe Rengîna cîran û zarokên wê bê destûr hatibûn li derî xistibûn û mal kiribûn pelîse û çûbûn. Îcar dengê xalîcedawşandina jor bûbû nehika ser dehikan.

Rengînê tim wilo bê wext û bê destûr tê mala te. Hew tu dinêrî li derî xist û bêtî ku li bendê be tu wê dawetî hundir bikî, ew derbas dibe. Xwedê-giravî te pir nêzikî xwe dibîne û ji xeynî te yeka ku ew dilê xwe jê re veke tune ye. Bi serê lawê xwe sond dixwe ku ji te hez jî dike. Tu carê di dilê xwe de dibêjî, "tu bi qurbana serê wî lawikî bî. Di dawiyê de tu yê bi van derewan serê lawik bixwî." Loma tê bi derdên xwe serê te jî diêşîne. Tiştên ku nayên gotin û qalkirin ji te re dibêje. Her çi qasî tu dibêjî, "xweha min tişta ku tu yê ji min re bibêjî, 'bila ji devê te dernekeve' ji min re nebêje" jî ew dîsa çi di tûrikê wê de hebe derdixe.

Jixwe wek serê ewil nema baweriya te pê tê. Tu jê sar bûyî. Tu bi derewên wê hesiyayî. Dixwaze dîsa xwe bi te şêrîn bike lê bêtêde ye. Ji bo xatirê cîrantiyê tu dengê xwe dernaxî.

Gava ku wê karta bankê ya krediyê bi te re dît û got, "erê yadê weleh tu sermiyan î, ma ka em kî wek te ne?" û çû çong xist piştâ mêrê xwe ji bo ku ji wê re jî kartekî krediyê derxîne tu jê êşiyayî. Li pêş çavên te reş bû. Ne ji bo ku çû kart derxist dilê te jê ma, na. Piştî ku çû xwe deyndar kir û mêrê wê girê xwe avêt mêrê te tu jê sar bûyî. Mêrê wê di nav civatê de girê xwe davêje mêrê te û dibêje, "nizanim tu çi ji vî awayê xwe fêhm dikî. Tu radihêlî zarokan û tu wan bi xwe re dibî tatilê. Em ji ber wan aciz in û em ji wan direvin diherin tu wan jî li serê me dikî agir" û dawiya dawiyê jî mesele anîbû ser kartê krediyê û gazin kiribûn. Wek ku te jina wî li wî elimandibe cira xwe nexweş kiribû. Zilamê

te ji wira rabûbû. Heger li xwe danîbûya û wek wî kiribûya gereke rabûna li wira li hev bixistina.

Belê ku ev tev ketibûn ser hev êdî te nema dixwest ew bê cem te. Lê xwesteka te tew ne li ser bala wê bû! Hatibû heta ku êş xistibû serê te peyivîbû. Niha te nizanibûya derewan jî dike; belkî te ew guhdar bikira. Lê wek radyoya ku frekansa wê nexuya be û xijxij jê bê dengê wê girûziyê dixê laşê te. Xema kê ye?!

Tu di dilê xwe de dibêjî, "rû bi xelkê re tune ye xwehê. Tew bê eyb û fedî têt!"

Tu dest nadî tişteki, ne pelîseya hundir û ne jî koma firaqên gemarî. Tu wan di cî de dihêlî. Tu radibî ji xwe re çayekê didî ser û tu kursiya xwe derdixî şaneşîna metbaxê û tu rûdinêyî. Hê tu nuh rûniştîyî deng ji derî tê. Tu bê dil radibî têtî derî vedikî. Ya ku hatiye Spiya Belek e. Tu nav lê nakî wê gotibû, "yadê ez wek spiya belek im, nebixêr herkes min nas dike!" Hatiye bi te re pevdiçe. Hûn li ber derî xaxê radikin. Te çima doza hûçikê xwe lê kiriye û te di nav xelkê de ew biçûk xistiye, hesabê wê ji te dipirse. Nifiran li te dike. Hûçik li nav çavên te dixê. Qaşo dinyanedîtîya te dide rûyê te. Ji bo heştê Adarê hûçik ji te xwestibû te dabûyê. Hê te li xwe nekiribû jî te ew neşikandibû. Te çend caran xwest, ew lê asê bû û neda. We li hev kir ku ew ji te re perçeyekî bikire û bila hûçik ji wê re be! Spiya Belek ne perçeyê te dikire û ne jî hûçikê te dide te! Tu jî li nav cîranan dozê lê dikî. Ev pir bi wê tahde hatiye û niha girtiye ser te û bi te re pevdiçe. Li ber derî hûn hevdu bi sixêfan dilewitînin.

Dûre Spiya Belek jî dihere. Tu ji xwe re dibêjî, 'şorê şorê şorê te çû hûçikê xwe da xelkê! Lawik ji bo ku tu xwe bi qurbana wî kî ji te re jî Silêmaniyê kirî û şand. Şorê tu rabî bidî xelkê. Ka te yê di Newrozê de li xwe kiribûya!?"

Tu rûdinêyî û ji kerba dilê xwe re tu digirî.

Nîvê şeva dirêj. Şeva tarî. Bêdeng û bêbext. Gelo şev, bêbextiya rojê ye? Yan şev hembêza rojê ya ji bo bêwaran e? Dengêkî kujer şeva tarî û dirêj diçirîne. Guregura hesinî di asîmanên şeva tarî de olan dide. Dayik vediciniqîn, di xewa şeva bêbext de, pêçekên xwe di hembêza xwe de dişidînin. Aliyekî canê min dimire. Dengê hesinê kujer di nav stêrkên biriqok de li

Tirs

Behlûl ZELAL

hev dikeve.

Laşê min î lertzok geh li vî alî û geh li wî alî ye. Ji şevê direvim, an ji ronîya berbangê ditirsim, nizamim. Gelo ez di xewê de me, yan di nav rastiya rastê de me, nizamim. Şev çawa qediya, tîrêjên roniyê kîngê gihan û di pencereyên menzela min re bûn mêvanên min, nizamim. Dîk jî neman êdî. Dîkên qure ku nola çawîşê qereqola gundê me, di navbera şev û rojê de, di navbera tarî û roniyê de dikin qîreqîr.

Bi ku ve çûn ew ewrên mirinê? Bûn mêvanê kê, mirina ji nişka ve? Nola teyroka dawîya biharê bihêrs? Çend stêrk weşîyan ji asîmanê dilê min, di nîvê vê şeva tarî de? Çend darên min şikestin, agir bi kîjan daristana dilê min ket?

Dîwarên stûr û bilind têrî nedikirin, bi ser de sincên bi dirî dihatin çikandin. Bi kevirên giran, bi stûnên dirêj û stûr dihatin dadan deriyên hesinî li ser çend çêlek, çend mêşinên di hewşan de. Tirsî ji dizên şevên tarî, bi wergirtina tariya şevê ve, her mala gundî dagir dikir di her malê de dilê her mirovî. Mezinan nedida der û çiqas ditirsîyan ew qasî jî digotin "Metirsî lawo, metirsî! Hewşa me asê ye, deriyê me pihê e. Ew jî nebû tivinga me heye. Diz zû bi zû nêzîkî mala bitiving nabin. Diz tirsonek in, ew xwe li malên bêmêr digirin. Û gelek caran, weke her malê, mala me jî bêmêr dima. Bavê min diçû binxetê." Diz jî mala bitiving ditirsîyan, hemû mal jî dizan ditirsîyan ên bitiving jî tê de. Ji hemûyan bêhtir, em zarok ditirsîyan û dayik jî ne kêmtir me. Bi vizîna bayê kur re, pelên çiloyê hişk yên li ser dîwarên bilind bûbûn sênc, çawa direilîn, dilên me jî wisa bûn. Pîrek lomeyên xwe bi jinên malên ku çêlekên wan hatibûn dizîn dikirin. "Jarê, xwedê ji wan re nehêle, devê zarokên filan kesê ziwa hiştin. Ma çi ji bêvan kesê re ma? Sê çêlekên wan hebûn, ew jî birin. Xwedê topekî li mala wan xe". Nifirên diya min, ji tirsî wê bêhtir bûn.

Tirsê di şevan de cotê xwe dikir, di şevan de

bênder hiltanî. Di tariyê de dihat, di ronahiyê de diçû. Berî ronahîya rojê dihatin her tim eskerê komando. Di dawîya tariya ji şevê mayî de digirte ser gund eskerê romê. Jixwe em bi tirsî romîyan hatibûn razandin, em bi heman tirsê şîyar dikirin. Berî berbanga sibehên hênîk, pihînên serê potînên hişk, em ji nav nivînên germ hildipekandin. Û di her rojên ji ber şevê mayî de, taştêya me tirs, firavîna me tirs, şîva me tirs bû...

"Razê, kurê min, razê. Ku tu ranezêyî, va ye eskerê romê hatin wê te ji xwe re bibin ha!"

"Wê tivingê û wan suretan bibine kadînê, eskerê komando avêtiye ser gund."

Tiştên sivik û biçûk didan pîrekên ducanî, paşîla jinên ducanî taldeya mêran bû. Taldeya tiştên nepenî. Carna jî paşîla jinên ducanî têrî tiştên nepenî nedikir. Çalên avê dibûn mala çek, fotograf, pirtûk û tiştên din ên nepenî. Hin caran kaya di kadînan de jî mazûvaniya tiştên ku diviyabû leşkerê romê nebînin dikir. Ma xof û tirsî jiyanê çi dikir û çi nedikir?

Taştê dixwim. Taştiyeke bêdil. Gewriya min xitimî ye. Her tişt bêtam e. Her tişt bêdil. Her tiştî bitirs dixwim. Tovê tirsê ketiya nav her qada jiyanê. Di her gavê de tirs min pêşwazî dike. Tê, li hemberî min radiweste. Li nîvê çavên min dinêre. Tirêjên xwe dişîne nîvê dilê min. Kupekupa dilê min e. Lehî bi ser min de tên. Aşt bi ser min de digindirin. Di dil û mêjî de erdhej pêk tê. Kezeba min dişewite. Henaseya min diçike, devê min ziwa dibe. Tirs!? Mêvanê mala min e.

Ji nişka ve ji malê derdikevim. Direvim. Bihêrs dîreksiyona tirimbêla xwe digirim. Bi şid û bi hêrs pê li gazê dikim. Xaniyên bilind li ber hev rêz kirine. Li ber xaniyên bilind û xweşik, koma qirş û qalên genî û qilêrî hene. Zarokên taxên qiraxên bajarê mezin û kevn, bendera qirş û qalên xaniyên bilind û xweşik tev didin. Hêvî, hêviya gezek nan hatiye ketiye nav bendera qirş û qalan. Zarokê temenbiçûk, bejinlawaz, bi tirs bendera qirş û qalan tevdide. Bi hêvî, bi rik. Dîwarên hewşên xaniyên bilind

û xweşik jî bilind hatine çekirin. Xuya nake hindurê hewşa xaniyan. Carna jê dîwarên bilind jî têr nekirine, têlên bi dirî gihane hawarê, hawara tirsê. Çiqasî xanî bilind dibin, têlên bidirî jî ew qas bilind dibin.

Diçim, diçim ber bi nava bajarê ve. Bajarê kevntirê bajaran, bajarê mezintir ê êş û kulan. Dîwarên reş û bilind bajarê kevn dorpêç kirine. Dinêrim, diponijim. Diramim. Ditirsim. Ji bilindahî û stûriya dîwarên reş ku bûne nîşane û navdêriya vî bajarî. Kîjan tirs bûye sedema van dîwarên bilind û stûr? Kîjan kesî, kîjan hêz, tovên tirsê bi ser vî bajarî de reşandiye? Çima ev dîwarên berze? Çima ev tirs dilan? Li gorî van sûrên bilind, xew bi çavên şênîyên vê derê yên wê demê neketiye. Tirsê êrîşên mezin, bejna sûran bilind kiriye.

Xewn û xeyal li bin guhê hev dikevin. Gelo, ez di xewê de me, yan di nav ewrên xeyelan de diçim û tîm? Çavên min vekirî ne yan miçkirî? Rastî kîjan e, kîjan e derew? Nîşane û berhemên mirovê duh û yên îro çi vedibêjin? Ji ku derê hatine ku derê û dê biçin kîjan qûnaxa dinyayê ya ku jiyan tê de heye? Ew hêz, ew hêza ku dibe sedema meşîn, bezîn, xwarin, mirin û her cure kîteya jiyanê, wêrekiya dil û mirovî ye yan bingeş, pêvajoyê û encama tirsê ye?

Sergêjiyek, dudiliyek hatiye bi ser ruh û bedena min de girtiye. Dibînim ku di lampeyên trafîkê de rawestiyame. Çawa rawestiyam bi kîjan hişmendiyê tevgeriyam, nizanim. Ji ber xwe rawestiyam an jî tirsan? Zanîn û nezanîn sînore xwe wînda kirine, belkî jî ji qestî ve xera kirine, belkî jî ji tirsê weha kirine. Li aliyê min ê çepê, tirimbêleke leşkeran. Xeyalên min di cih de rû didin. Diçim gundê çiyê, mala me ya ku serê çend caran di serencama hatina leşkerên romiyan de serûbino dibû. Dikevim nezaretxeneyên sar û qilêrî, di nav govenda tirsê de digevizim. Tî û birçî, ji her duyan bêtir bitirs. Darekî hişk û şahîk li serê min dikeve. Perdeyeke reş tê ber çavên min, babilîsoka stêrkan pêk tê. Xwîn dibêje tu here, va ye ez tîm. Hişê min, çi dike ez nizanim. Ne darê hişk ê şahîk ku serê min kiriye delav di bîra min de ye êdî û ne jî xwîna ku bi bedena min de herikiye. Ez ji nû ve ji serê banê me dikevim. Banê bilind ku ji kevirên hişk û şahîk hatiye pê. Birê min di nîvê şeveke havînê de, di xewa şîrin

de ji ser gindirîbû û hatibû xwarê. Ez di ronahiya rojê, di dema taştêya paleyan de bi ser serî gindirîbûm jêr. Xwîn nola lehiyê diherikî lê qet nediêşiya, giriyê min jî tirsê bû. Zehf tirsîyabûm û gelekî digiriyam.

Pîştî lampeya sor bi qasî qederekê zer û piştî ferman an destûra meşa me lampeya kesk pêdikeve. Tavilê dimeşim, tavilê dilivin hemû tirimbêl. Tirimbêla leşkeran, servekirî ye. Leşkeran piştî xwe dane hev. Hêzê ji hev werdigirin. Milên wan li hev dikevin. Pir hez ji hev û din dikin yan jî tirsî weha dikin, nizanim. Tivingên reş, hişk û şahîk ên ji hesinê sar di destê wan de ne. Her yek bi her du destan tivingên xwe dişidînin. Çavên wan li hawîrdor in, çavên wan vekirî, çavên tije tirs, barê wan tirs. Tiliya şanîdanê li ser tetika tivinga reş. Ku min bikaribûya, hêdika, xweşik xweşik destê xwe dirêj bikira û bi wan hesinên sar bigirta û bavêta dûr û hey dûr. Belkî ji wê tirsê, ji wê tirsî ku dilê wan û min dagir kiriye rizgar bibûna. Çima wisa diramim û dixwazim, nizanim. Ew ji min, ji me ditirsîn, an ez, em ji wan ditirsîn, nizanim. Tirsê daye dî hev. Tirsê daye nav hev. Tirsê qesr û qonaxên bilind ji xwe re ava kirine. Dar û çekên pihêt, hişk, şahîk û stûr. Belkî rojekê ev tirs... Ne hin kes, pir kes rabin bibêjin, çima ev tirs? Belkî rojekê tu kes nebêje kanê ew tirs?

Wa ye lehiyeke mirovan, di kolana herî mezin a vî bajarî de diherike. Dest, mil, mêjî û dilê xwe kirine yek. Dixwazîn tirsê ji dilan, ji gundan, ji bajaran rakin. Ji çavan jî. Tirs nekeve nav raman, xewn û xeyalan. Diqîrin, dibêjin, dimeşin, dibezin, digirîn, dikenin.... Dixwazîn dara tirsê bişikênin. Mala wê xera bikin, gora wê bikolin. Ji tirsan dane pey tirsê, bi tirsê didine pey tirsê. Bê tirs bi ser tirsê ve diçin, bi ser mirinê... (25.06.2008-Amed)

Tiştên zarokatiya xwe mirov zû bi zû ji bîr nake. Em jî wek zarokên gundiyên din çûbûn gundê xwe ji bo betlaneya havînê. Wek her sal em li ser serê hev siwar bûbûn di wesayita nav gund û navçeyê de û me heya malê li kilama 'Behra Wanê kûr e, kûr e/ riya welatê min dûr e' guhdar dikir. Min Behra Wanê

Çîroka evînê

Omer FÎDAN

nedîtîye, ez nizanim ku kûr e an na; lê ez baş dizanim ku riya mala me her ku diçû mirov digot qey dûr û dirêj dibû. Hem ji ber ku di wesayîte de cî tune bû em ji ruhê xwe aciz dibûn, hem jî me dizanibû ku germahiya hembêzên dayikên me, firehbûna xaniyên me *-yên ku yê me bûn, em tê de azad bûn, dilrihet bûn, bê tirs tevdiageriyan, me dikaribû em ji xwe re li hundir bi her awayî bilîzin û xwediyê xanî tune bû ku ji me re bibêje 'dîwara xêz nekin', 'di bin we de mal hene wan aciz nekin' û hwd.-* hevalên me yên ku ne bi dilê xwe em ji hev dûr ketibûn, civatên gundiyan ên şên li dawiya vê rêwîtiyê bûn.

Gundê me ne gundekî zêde şên bû bi taybetî jî piştî ku hate şewitandin. Av lê tune bû, darên fêkiyan lê tune bûn, li cihekî çep li serê çiyayekî bilind bû. Nizanim ji ber çi bû lê me zêde jê hez dikir û me dixwest ku em her wext li gundê xwe bijîn. Her çiqas malbata min bi min dabe fêmkirin ku dibistan tişteke baş bû jî, ji ber ku dibû sebebê derketina min a ji gund ez gelekî jê aciz dibûm.

Havîn hatibû, em li gundê xwe bûn û me careke din her tişt ji bîr kiribû tenê me dizanibû ku em li mala xwe ne. Wek her sal; havîn zêde germ bû. Dareke mazî an jî dîwarekî xaniyekî mirov di bin siya xwe de nehewanda rojê zilmek giran li mirov dikir, mirov dişewitand di navrojan de.

Navrojek germ bû û min xwe avêtibû bin siya dareke mazî. Di bin siya darên mazî de hikmê rojê derbas nabe; ew der di bin hikmê bayê hînik de ye. Ku mirov bizanibe/bikaribe aveke cemidî jî li bin vê siyê vexwe mirov şa dibe û ji bîr dike ku havîn e. Min bi rê û rêçikên jiyana gund baş dizanibû û her wiha ava min a cemidî jî li ber serê min bû. Li serê wî çiyayê bilind, li bin siya darê, ava min a cemidî li ber serê min û min li jêr temaşe dikir; li gundên biniya gundê xwe. Min tu tiştê nedibihîst lê min dizanibû ku wexta firavîne ye û niha rênçer banî hevdu dikin ji bo xwarinê. Dibişirin ji bereketa ceh û genimê

xwe re; aciziya xwe ji paletiyê dikin û ji aliyekî ve jî bi pey qûna Şêx Sidqî ketine; lavayiya dikin ku beriya her kesî patosa wan bike.

Tu tiştêkî ku min bikira tune bû. Jixwe min jî dixwest ku her tiştî; maran, dûvpişkan, germa havînê, tîbûna xwe ji bîr bikim û tenê li radyoya xwe guhdar bikim. Radyoya bavê min yeka biçûk a reş bû û bi du pîlên qirase dixebitî. Ji bilî bavê min radyoya tu kesî di gund de tune bû. Bi xêra radyoya bavê min haya gundiyan ji sar û sorê dinyayê çê dibû. Bavê min tu caran radyoya xwe nedida destê tu kesî ku di hundir de jî pê bilîze an jî lê guhdar bike lê destûr dabû min ku ez bi xwe re bibim çolê. Lê min jî dizanibû ku gere ez zêde pê nelîzim, vekirî nehêlim ku pîlên wê neqedin û daneynim erdê ku gemarê negire. Ez xwediyê her tiştî bûm, kêfa min li cî bû. Min nermika dest avêt çeltikê xwe û radyoya xwe jê derxist, vekir û dest bi guhdarkirinê kir. Destûra min a ku bi frekansên radyoyê bilîzim tune bû. Bavê min li ku derê hiştibûya min ê jî li wir guhdar bikira. Jixwe ez jî ditirsiyam ku pê bilîzim, bi tişteka wiha girîng ji bo ne bi tenê bavê min; ji bo hemû gundiyan. Min digot ku ew ê nûçe derên ji ber ku bavê min çiqas vekira ji me re nûçe digot lê qala nûçeyan nekir.

Dengekî nerm, sivik, bihest digot ku ew ê ji min re behsa evînê bike. Di wan çaxan de ji bona min tiştê herî balkêş jî jixwe evîn bû. Min zarokatiya xwe hêdî hêdî li pişt xwe dihişt, ez ber bi ciwaniyê ve diçûm. Bavê min radyoya xwe dabû min ma ev elametê ciwanbûna/mezinbûna min nîn bû? Erê rast e bavê min pir bêriya min kiribû û min çî bixwesta nedigot na lê ku ez mezin nebûma wê çawa radyoya xwe bida destê min? Min hinek pirsên wiha ji xwe kir û her ku dem dibihurî دنیا li ber çavên min diguherî. Min guhên xwe mûç kiribûn û min li wî dengê xweş guhdar dikir ka gelo ew ê tiştên xweş bibêje an na.

“Evîn kor e û rêberê wê jî dînîti ye.”. Rojeke

havînê ya ji rêzê bû; wisa dixuya lê min gelek tiştên nû dibihîst û pê dihesiyam. Ez mezin bûbûm û der barê vê peyvê de ez bêhtir hestiyar bûbûm. Her çiqas hestiyar bim jî min nizanibû evîn çi ye, serî li ku ye; qûn li ku ye? Ka gelo mirov çawa evîndar dibe? Tu agahiyên min ên di derbarê vê hesta qedîm de tune bûn. Ev çi bû, çawa bû? Ez rabûm ser xwe û min bi ruh û can guh da gotinên camêr.

Jixwe bi hevoka pêşîn hiş û mêjiyê min tevlihev bû. Camêrê min li binê kundir xist û evîn kor kir! Ev çi bû? Çi mesele bû? Radyoya min a ku wek zarokeke nûbûyî ez qemîş nedibûm ji cihê wê bilind bikim; destê xwe bidimê; û min ji dûrî ve jê hez dikir bi derbekê rakir û nêztirî guhê xwe kir.

-Wele ez ê deng jî vekim hema pîl diqedin jî bila biqedin. Çavên wan ên ku rijiyane.

Di destpêka ciwaniya xwe de min ev çîrok bihîst. Niha ez dizanim malan bar kirin e lê mixabin ez nizamim ku li ku danîne. Tiştê ku niha di bîra min de ye çîroka camêr e, yan min di hişê xwe de li gora xwe çîrokek afirandiye, nizamim! Tiştê ku dizanim porê min roj bi roj hindiktir dibe; bi peşka baranê ya pêşîn dihesim; her ku diçe ez ji jor ve piyên xwe hindiktir dibînim di bin hûrê xwe de û baş dizanim ku evana elamet in ku ciwanî dê ji min dûr bikeve ka binê ber bi kîjan qûnaxê ve here? Rastiya vî tiştî heye yan na, nizamim!

Ev çîrok di demek dûr de diqewime. Demeke wisa dûr bûye ku hêj dem tune bûye. Di demeke wisa dûr de bûye ku li rûyê dinyayê tu giyanwerek tune bûye. Beriya ku Lîlîth dil berde xwezayê û bavê me yê Adem bi dayika me ya Hewa aşt bibe. Hêj tovê sêvan jî nehatiye avêtin. Demeke wisa dûr û kûr bûye; ne wek xeyalên bi azahî û azadiyê xemilandî; wek mafê jîneke serdest ji bo wan dayikên ku me di hembêzên xwe de hejandine û hêjandine. Nizamim wan çaxan rojên ronî hebûne yan na?

Hemû hest digihîjin hev û tîr rûyê cîhanê. Hêj wan çaxan hesret û bindestiyê Mezra Botan ji xwe re wek war nepejirandiye; şûşeyên dilên niştcehên wê herêmê bi

tehmariya xwe neneqîşandine. Zilm û zordarî yên ku wê di milên hesret û bindestiyê de ji xwe re li waran bigerin hêj ji kirinên xwe şerm nekirine. Hemû hest li hev rûdinên û difikirin.

-Em çi bikin?

-Em çi bikin?

-Em çi bikin?

...

Dînîtî ji nişkave xwe davê ber wan û dibêje:

-Em bi veşartokê bilîzin!

-Wê çawa be?

-Nizanim gelo dibe?

-Ka em ê li ku bilîzin?

...

-Erê dibe!

-Kerem bikin em bilîzin!

-Em bi cihekî dûr ve neçin; li rûyê dinyayê bilîzin.

-Ka wê kî bibe mak?

...

Dînîtî dawiyê li van pirsên biçûk ên hestên din tîne û xwe davêje ber wan û dibêje:

-Hema bila mak ez bim.

Û berê xwe dide çiyayekî qirase û dest bi jimartinê dike:

-Yek, du, sê, çar....

Hemû hestên din her çiqas nexwazin jî hevaltiyê bi tirs û teşqeleyê re dikin û bi hev re li cihekî sahil digerin ku xwe tê de veşêrin. Yek bi yek vedişirin. Vir dibêje ku ew ê di bin qûça keviran de veşire lê derdikeve serê darê. Saw xwe di nav daristanan de; jîndariya ciwaniyê di dema borî de; pîrî û tîrsa mirinê di milê hev de di bin axê de; daxwaz dide pey hêviyê û dertên serê çiyayekî bilind; xiyamet dûr dikeve ji Mezra Botan û berê xwe dide rojava, diçe; hêrs û mantik ji hev dixeyidin û her yek bi aliyekî ve diçe; hesûdî bi tu tiştêkî re li hev nake û bi aliyekî din ve diçe; paqijî di

zeryayeke mezin de; mêrxasî û wêrekî di gurzên Kawa de; jîrekî û zîrekî di tovê Jîr de; azahî û azadî di nav kevirên reşbelekên derdora Cizîrê de; hêjayî û delalî erdên navbera Dicle û Firatê dişibînin hinarikên Zînê û di wir de vedişirin...

Dînîtî jimartina xwe didomîne; 76, 77, 78, 79.... Hest yek bi yek vedişirin ji bilî evînê. Her wekî ku em jî dizanin veşartina evînê ne tiştekî wisa hêsan e. Tatêl serî dide hemû hestên din û bi hev re difikirin ka gelo wê evîn çi bike? Her ku dînîtî nêzî 100'î dibe hestên din dîsa her yek xwe di cihê xwe de bikeys dike. Şêti didomîne 96, 97, 98,... û evîn xwe davêje nav gulistanê sor. Belê, veşîrîna evînê ne tiştekî wisa hêsan e. Her çiqas bêhna gulan li xweşa wê here jî; dirikên wan tê de diçin û bi veşîrîna diêşê. Naxwaze ku xwe veşêre; dixwaze ku her daîm di dilan de be û li ser zar û zimanên evîndaran be.

Dînîtî digihîje sedî û hejmartinê diqedîne çavên xwe vedike û beriya ku wê dest bi lêgerînê bike tatêl ji cihê xwe derdikeve, xwe dide rû û bi hev re li hestên din digerin. Dînîtî yek bi yek hestan dibîne û derdixe ji cihên ku tê de veşîrîna. Ji binê zeryayên kûr, ji serê çiyayên bilind, ji nav daristanên tarî, ji ezmanên ronî... yek bi yek dibîne wan, heta ku tenê evîn dimîne. Belê me gotibû ku veşîrîna evînê ne tiştekî hêsan e lê em dîsa dizanin ku evîn carekê veşîre û hînê êşê bibe derketina wê, dîtina wê zehmetir e. Demeke dirêj dînîtî li evînê digere lê nabîne heta ku hesûdî bi dizîka jê re dibêje ku evîn di nav gulistanê de veşîriye. Hesûdî kirina xwe dike. Dînîtî kêf dike, şa dibe ku wê evînê jî bibîne û bibe maka hesteke din. Bang dike nake evîn ji nav gulan dernakeve. Darekî ku serê wî wek

dirganê ye heltîne û ji dînîtiya xwe diqîre û darê xwe di nav gulan re dike.

-Ez ê evînê jî bibînim! Êdî ez ne mak im!

Bi qîrîna şetiyê re qêrînek din jî bi ezmanan ve dibeze. Qêrîneke ku agir davêje nav dilan bilind dibe ji nav gulan. Hemû hest û nebatên kaînatê diricifin. Evîn derdikeve ji nav gulan ku darê dînîtiyê di çavên wê re çûne û xwîn wek kaniyekê diherike ji çavên wê. Der û dor tarî dibin, ba û bager radibin. Ewr û ezman dilerizin. Şîn dikeve kaînatê. Tenê giriyê giyanweran na; yê kevir û latan jî ji vî halî re tê. Hemû hestên din şînê digirin. Dem diafire û demeke dirêj çav ji rondikan vala nabin.

Dînîtî wek her gav xwe davêje nav meydanê û dibêje ku ser û sebebê vî tiştî ew e û ew ê xwe jî kor bike. Qêrîn û zûrîn ji hevalên wê diçin bi alîkarî û daxwaza evînê jî nahêlin ku dînîtî xwe ji dîtîna bike. Dînîtî dixwaze ku xwe ji jiyana û ji jiyandariyê dûr bixe; nahêlin! Li çareseriyekê digerin; nabînin! Temamî hestan dixwazin ku çavên xwe bidin evînê; nabe! Ku êşa evînê kêmbê dibe û bala xwe dide derdora xwe bi hemû hestên ku di dilê xwe de cih daye wan dişewire daxwaza rêberiyê ji dînîtiyê dike. Tê gotin ku ew roj îroj evîn kor e û rêberê wê jî dînîtî ye. Ne evîn bê dînîtiyê bi cihekî de diçe û ne jî dînîtî dest ji destê evînê berdide. Ew qûnaxên ku wê lê bisekinin divê ku cih bidin her duyan.

niha di koçberiyê de erê li mal

di şêstî de ji temenkî lezok

mûman ji te re vêdixin

dilxweş be ta tu karibî ji nedengiyê

ji ber mirinek ji nişkêve, bi ser riya te venebû

hinkî qerebalix bû û te hinekî hişt..!

heyveke pirsokî li ser kavilan e

weke nezan û hovan dikene

bawer neke ku nêzik dibe ji bo te pêşwaz bike

Helbestvanê Filistîni Mehmûd Derwêş di 9'ê Gelawêja 2008'an de jiyana xwe ji dest da. Mehmûd Derwêş belkî bi taybet hestên gelê xwe dianî ziman; lê wî di bingehe de hestên giştî yên gelê bindest dianî ziman. Ew helbestvanê bindestan bû, di rewşa bindestiya gelê xwe de rewşa hemû gelên bindest fêm dikir. Mehmûd Derwêş bindestiya kurdan baş dizanibû, lewma jî piştgiri dida tekoşîna gelê kurd... Hebûna gelan, tekoşîna gelên bindest bi kesên wek we yên piştgirên piştgiriya gelên bindest heye, bi pênuşa xwe we ev diyar kiriye...

Mehmûd Derwêş

Di sala 1942'yan de li gundê Birode yê girêdayî bajarê Akayê hatiye dinyayê. Di sala 1948'an de, di bin dengê bombeyan de ji gundê xwe derketiye. Tevî mirovekî xizmê xwe li nava daristanan winda bûne û dawiyê xwe li Libnanê dîtine. Piştî salekê bi apê xwe re vegehiyaye Filistînê. Zîmanê erebî, îngilîzî û îbrânî hîn kir. Bi tawanbariya dijminahiya Îsrailê 5 caran (di salên 61, 65, 66 û 67'an de) hat girtin û piştê hate sirgûn kirin. Demekê bû endamê partiya komunîst a Îsrailê û di rojnameya wê ya bi navê El-Îtîhad de û kovara El-Jadîd de xebitî.

Aşiqek Ji Filistînê 1966

Rojaneyên Birîneke Filistînê 1967

Dawiya Şevê 1967

Dîlbera Min Ji Xew Radibe

Nivîsandina Li Ber Ronahiya

Tivîngê


Ew berhemên jorîn tev di pirtûkekê de hatin civandin û bi navê 'Hemû Berhemên Mehmûd Derwêş' ji aliyê weşanxaneyê Dar El-Ewde sala di 1971'an de li Beyrûdê hate çap kirin.

Piştê di sala 1972'yan de pirtûka wî ya bi navê 'Ji Te Hez Dikim An Nakim' derket, dûre 'Ew Wêneyê Wê Ye' di sala 1975'an de û 'Dawet' jî di sala 1976'an de derket. Piştê ew berhemên wî jî tev di berhemekê de hatin civandin û di bin navê 'Dîwana Mehmûd Derwêş' de di sala 1977'an de hate weşandin. Piştê jî gelek dîwanên wî yên din jî derketin mîna: Pesindana Siya Bilind, 1982, Dorpêçkirina Pesindanên Deryayê, 1986, Tiştên Ku Dixwazim Wan Dibînim, 1990.

Wekî din gelek berhemên wî hene mîna: Tiştê Li Ser Welat, Rojênivîsên Şêniya Asayî, Oxir Be Aştî.

Gelek xelat girtin, mîna: Xelata Lotus, Îbnî Sîna, Lenîn, Mertalê Şoreşê û hin xelatên din ên navnetewî. Helbestên wî li gelek zimanan hatine wergerandin.

(Amadekar: Rîzoyê Xerzî)



Niha di koçberiyê de

Mehmûd Derwêş

ew di karê xwe yê kevn de weke adara nû ye
ji dar û zeviyan re navê bîranînê vedigerîne û te ji bîr kir
ka em bi dostan re şevkê li dar xin, ji bo peyala ku şikest
di şestî de, tu nema pêşerojên mayî dibînî
da tu wan deyne ser milên sirûdan tu rajê wan û rajine te..!
ji jîyanê re bêje, weke helbestvanekî hevot
hêdî hêdî bimeşe weke mîyên ji xweşîkbûna xwe bawer in
ji fen û fitên xwe, her yek ji wan dengekî wê veşartî heye
ez rebenê te bim tu çi xweşik î
jiyanê hêdî hêdî here da ez te bibînim
bi hemû kêmaniyên li dora min
çiqaşî min te ji bîr kir di qerebalixa te de li te û xwe digeriyan
û her ku min sirek ji te nas dikir
te bi hişkayî digot: Tu çi nezan î
ka bêje nebûnê: Te ez kêmkirî
û ez hatim da te kamil bikim.

(Wergerandina ji erebî : Taha Xelîl)

Kerem Gerdenzerî:

“Ciwan ji muzîka populer hez dikin”

Hevpeyvîn: Sedran C. Newayî

W: Kerem Gerdenzerî kî ye ji kerema xwe re tu dikarî qala xwe bikî?

* Ez Kerem Tahar Gerdenzerî, di 6'ê adara 1952'yan de li bajarê Tîblîsê li Gurcistanê ji diya xwe re hatime dinê. Navê bavê min Tahar e. Taharê Hacı Gerdenzerî, diya min navê wê Radîfe ye. Ew qîza Nacî Axa ye. Ji Bereka Reş, ji wan re digotin, Zixurî. Min di zarokatiya xwe de gelek ji muzîkê hez dikir. Ez bûme wek deh salî yazdeh salî min ji gîtarê hez kir. Çûm mektebê wisa ji li bas gîtarê dida. Wê hêlê ez bûme 15, 16 salî, me gelek hez dikir ji muzîka repê ya amerîkî, me hez dikir ji stîlê koma Beatles, gîtarîst Jimi Hendrix ji wê çaxê hebû, gîtarîstên din ji hebûn.... Me ji tiştên wisa hez dikir.

W: Biborin we ji bas gîtarê dest pê kir ne?

* Belê, îcar pêş de ji aliyê stîlê ve ez bibêjim ji aliyê rîtmê ve Elvîs Presly hebû, stranên wan di emrê zaroktiyê de me guhdar dikir. Ew dem ji mesela dora heftê û sisiyan bû, em top bûn, me got em grûpê çêkin, kurdî, rock û muzîkjen. Lê Koma Wetan em temam di 76'an de hatin ber hev, lê heta 76'an berê min miqam me çêdikir. Helbestvanên me hebûn, li Ermenistanê, li Gurcistanê. Helbestvanên mîna Ordîxanê Celîl, Karlanê Çaçan, Mikailê Reşîd, Ezîzê Îsko û hwd. defterên wan hebûn, şîrên wan kîjan wisa binivîsandina, heçî ji bona kilam çêbûna, min stran çêdikir. Zêdetir ji stran, hinek ji wan gotinên wan ji min çêkiriye. Stran çawa dihate çêkirin? Gotin li vir hebûya ez ê rûniştama min ê ev harmoniya wê çêkira, melodiya wê çêkira. Paşê ew ê kom top bibûya aranjoriya wê bi tevahî dihat çêkirin. Êdî em Koma Wetan bûn. Baterî lêdixist Rafaelê Dasînî.

W: Mamoste hûn dikarin hinekî qala çîroka qaseta we ya bi navê Koma Wetan bikin a bi navê



Bayê Payîzê. Berî wê Koma Wetan çawa hate damezirandin û çima û çawa belav bû?

* Dora 1973'yan me çêkir kom. Koma kurdî ya rock. Muzîsyenê wê carê carkê dihatine guhertin, heta 1976'an. Em top bûn ser hev, wê gavê di nava wan muzîsyenan de baterî lê dixist Rafaelê Şamilê Dasînî, Keyboard; Lêvon Grîgorî Şaxbazyan, Solo gîtar, vokal; Omarê Sebriyê Recevî, berpirsiyarê komê, bas gîtar, vokal ez bi xwe bûm, bêjim me çawa çêdikir stran...

W: Ji ber kîjan pêdiviya hate damezirandin, we çima ava kir?

* Me çima ava kir; ji bo çi dizanî? Ez bêjim; me ji wê stîla muzîkê hez dikir. Îcar wê çaxê komên mîletên din ên bi wî awayî hebûn, di dilê min de ji ev yek hebû, min got em kurd jî, komeke rockê ya kurdî çêbikin. Li ser baterî lê dixist Rafael...

W: Navê kasê 'Bayê Payîzê' bû ne?

* Belê ew stran jî tê de heye, bi navê 'Bayê Payîzê'.

W: Di stranan de 'Were Zînê' em bibêjin 'Filîto Lawo' û wekî din hene. Gelo ev stran û gotinên we bûn, muzîkên we bûn we ji kê girt? Hûn dikarin

qala wê albumê bikin?

* Belê li wê derê strana 'Bayê Payîzê' li ser gotinên Mikailê Rêşîd min çêkiriye, strana 'Elegez' min çêkiriye li ser gotinên Karlanê Çaçan, strana Cahaltî min çêkiriye li ser gotinên Ezîzê Îsko û strana 'Heseno' min çêkiriye li ser gotinên Taha.

W: Ew stran hê jî hinek kom digirin dibêjin di awaza xwe de, bi forma xwe, bi şîroveya xwe, hinek koman li vê derê gotin.

* Wiha bêjim ji te re, min çêdikir, melodyên wê, harmoniya wê. Paşê gotin tev top dikir û bi tevahî li ser aranjoriya wê bi keys dikir. Me ji bo çêkirina plakê (hê CD tune bûn, plak hebûn), me çêkir di firmaya Melodî ya dewletê de. Plaka me li Moskovayê derket, li tevahiya Sovteyê hat belavkirin. Di sala 1990, 91'an de çaxê Sovyet Rûsya xera bû, aborî problem bû, derece problem bû, ji temaman re. Ne tenê ji kurdan re, ji gurciyan re, rûsan re, ji ermeniyên re... koma me jî ji hev belav bû. Ez jî bi malbata xwe re çûm Moskovayê, min dest pê kir, ez dîsa xebitîm li wê derê. Tevî du muzîsyenên rûs ez xebitîm, min CD'yên teze çêkir.

W: CD'yên we wekî din hene?

* Belê hene.

W: Dîsa bi kurdî ne yan rûsî ne?

* Bi kurdî ne, rûsî jî hene.

W: Negihîştine ber destê me, nehatine van deran. Ji ber kar û barên we endamên komê belav bûn, hinek ji we çûn saziyên din, hinek çûn ji bo karê xwe bi aliyên din ve loma kom belav bû?

* Belê.

W: Mamoste hûn muzîka kurdî çawan bi nav dikin?

* Muzîka kurdî ez bêjime te nas dikim, fam dikim, ji zaroktiya xwe ve min guhdar kiriye muzîka kurdî. Me dengbêjî guhdar kiriye, em bi vê yekê jî mezin bûne. Di dilê me de ew yek hebûye. Birastî ew kurdê ku heta di dilê wî de heye, folklorê kurdî, muzîka kurdî, di dilê wî de heye bira rabe, bibe muzîkjen û rock muzîkê çêke, folklorê çêke, hwd. çêke, çi bêjim çêke. Ew ê bikaribe bi kar bîne ew muzîka, kurdîtî wê bikeve wê derê. Hema herin bêjin yekî alman, yekî îngilîz bêjin were ji me re operayekê çêke, ew ê çêke. Wê çêke lê, ew ê tiştekî baş çêke, lê wê kurdîtî tê de tune be. Her dem muzîka kurdîtî pêşiyê sekiniye folklor, klasîk. Paşê diçe rock jî, modern jî nizanîm

wekî din jî.

W: Mamoste nerînên we yên li ser muzîka ku îro ji aliyê muzîkjen û stranbêjen kurdan ve tête çêkirin çi ne?

* Niha roja îro meriv guhdar dike, hene hinek stranên baş. Hene stranên bêjim hinekî ew qas baş jî nîn in. Tiştên wisa jî hene, merivê ya rastî jî xeber bide. Hema wisa nîn e mirov bêje temam baş bûn, hene yê wisa jî hene. Ez rastiyê bibêjim; zêdetir zêdetir stranên baş in. Aliyê rockê de niha ev cahilên (ciwan) me, gelê me baş ewana çêdikin. Ez dikarim kifş bikim, bêjim rock muzîk, Koma Rewşen, dilê min bi wan gelek şa dibe. Ewana baş dikin. Ya baş em îro rastî wan jî hatine car caran dikevin bîra min....

Tev cahil in. Muzîka wisa, stîla wisa li ser cahilan e. Kêfa min zehf ji wan re tê; ji Koma Rewşen re, Koma Çar Newa, Koma Azad ewana CD'yek teze çêdikin. Min ew pîroz kirin, ez dîsa pîroz dikim ji bo CD'ya nû. Gelek baş e.

W: Gelo ku em bibêjin li ser navê muzîka kurdî an rock, an pop an jî blûs hwd. tên çêkirin, hûn hemûyan rast dibînin, an di nav de yên ku we qal kir ewana baş in hûn dibêjin, wanê din du muzîk çend muzîk tê de hebin....

* Na na, ez nabêjim... dîsa dikarim bibêjim min kîjan nas nekiriye heke ewana ne baş in na! Min kîjan nas kiriye ewana zêdetir baş in, ne rast e. Min kîjan nas nekiriye jî yê baş bila bibexşînin. Yek yek ez bibêjim ez nikarim têxime bîra xwe, temamiya gel; zehf komên baş hene, zehf dengbêj û stranbêjen baş, tiştên baş hene.

W: Mamoste hûn dikarin hinekî qala muzîka populer, ciwanên kurd û dengbêjan bikin, têkiliya van her sêyan bi hev re çi ye û tevgera ciwanên kurd di vir de di çi astê de ye? Kerem bikin.

* Ez bawer dikim ciwanên kurd, ne bi tenê ciwanên kurd, ciwanên temam miletên dinyayê hez dikin ji muzîka populer. Lê dîsa jî...

W: Çima?

* Çima, te got muzîka populer ne wisa? Ciwan zêdetir ji muzîka populer hez dikin. Di nav ciwanan de hene...

W: Yanê forma wê xweş tê ji wan re, hêsan e, rihet e, çima?

* Dizanî çima? Zêdetir zêdetir ewana ji ber ku muzîka populer dikeve guhê wan. Ew tene malê

televizyon lê dixin muzîka populer e, li her derê muzîka populer e. Cara jî hez jê dikin muzîka gelêrî ya folklorê, na ew jî tê guhdarkirin lê zêdetir muzîka populer li hemû ciyan heye, em bibêjin tiştêkî wisa çêdibe, ciwan zêdetir li muzîka populer guhdarî dikin.

W: Yanê ciwanên kurd, cahilên kurd wek gotina we, di nav vê muzîka populer de çiqas dengbêjan dişopînin, gelo helwesta wan, bala wan li ser muzîka populer e, yan li ser rê û rêça dengbêjan e. Hûn van her sêyan çawan dinirxînin? Muzîka populer texlîd dikin gelo an dengbêjên xwe diparêzin û di rêya wan de diçin?

* Çawa bibêjim, ewiya li gor girêdayîna cahilan e, (li gorî hezkirinên wana) belê rast e, li gorî hezkirinên wana ye.

W: Mamoste der heqê mîhrîcana Amedê û pey re jî der barê kesên muzîkjen ên ku tên vexwendin de nerînên we çi ne?

* Nêrînên min, ev festîval gelek baş derbas dibe, ev cara yekemîn e ez hatime vira. Birastî jî di stranên min de jî heye, xewnek e.

Xewnê dibînim digirim siba

Şa dibim zehf derdorên me...

Ew strana min wisa heye. Birastî jî ev xewna me bû. Gelek şa me ku ji bo di nav mîlet de me. Ez jî tevli vê festîvalê bûm. Lê gelek dengbêj û muzîkvan tevli festîvalan dibin, tên ji xwe re digerin, konserta didin, gelek şa dibin, gelek baş e, gelek pêwîst e. Bawer im dîsa her sal wisa derbas bibe. Bo mîlet kultureke bilind e, kultureke mezin e, mîletê me pêş de diçe. Gelek şa me bi vê yekê.

W: Mamoste ev pirs ji bo min gelek girîng e; ji bo we krîterên muzîkê çi ne? Dema mirov dest bi afirandin an fikirîna muzîka xwe bike divê pîvan çi bin?

* Meriv gava stranê çêdike, ev gotina stranê ye, helbesta wê ye, muzîk haveynê wê ye, gere bêjim tiştêkî wisa be ku tevli organîzmayê bibe. Divê jî hevdu dûr nekevin. Stran li ser helbestê ye, li ser gotinê ye. Gotin heye kijan muzîkî ye, gere tiştên wisa hebin, eger tu gotinên wisa bibêjî ew tiştên wisa hene di dinyayê de helbest ji bo stranê tên çêkirin. Lê dem heye stran êdî dibin klasîk. Ez vê yekê dibêjim; pêşde divê harmoniya wê stranê were çêkirin, melodiya wê stranê gere temam were çêkirin, paşê îcar gere li ser aranjoriya wê bixebitin

û stran were çêkirin, ji bo ku tiştêkî baş were çêkirin.

W: Mamoste hûn beriya niha qet hatibûn Amedê, yan cara yekem e hûn tên vê derê?

* Ev cara yekemîn e ez tîm Amedê. Eva ji min re tiştêkî mezin e, ev e ji min re birastî jî xewn e. Xewna min hatiye serî. Ez hatime Amedê, ez tevî mîlet im li vira, zehf dilê min şa ye ez tevî festîvalê jî bûme, Koma Rewşen va ye li kêleka min e, ez bêtî wana nabim. Ez hatim min Koma Rewşen dît, ciwaniya min kete bîra min.

W: Mamoste pey re jî ez vê pîrsê pêve girêbidim. We Amed çawan dît, di navbera Ameda di dil û mêjiyê we de û Ameda rastîn de we çi fêrî dît, çi fêrî hebûn, we tiştêkî çawan xeyal dikir, we tiştêkî çawan dît, rasterast?

* Rasterast bibêjim; zêdetir ez bibêjim, ez dinihêrim derdora me mîlet heye. Dilê min gelek şa ye, em xeber didin bi zimanê xwe, kultura xwe, dereceya xwe, çûyîn hatina me, gelek şa me. Min pîr jî bawer nekir ku Amed şhrekî wisa mezin e, şhrekî wisa bedew e, şhrekî wisa sîvîlîzasî (şaristanî) ye, min bi xwe rastiya xwe bibêjim, min seh kiriye digotin Amed wisa bedew e, wisa rind e. Lê mirov bi çavê xwe bibîne zehf tiştêkî muhîm e. Ew sed carî guhdar bikî jî min bi çavê xwe dît, dilê min gelekî şa ye.

W: Pîrsa dawîn; amadehiyên we ji bo album an tiştêkî din hene, ji bo pêşerojê projeyên we hene gelo?

* Ez pêşerojê her tim stranên nû çêdîkim. Her tim wisa dikim ji bo albumê derxim, stranên nû çêbîkim. Di dilê min de ev yek heye, baweriya min heye ez dîsa werime Amedê, konsertê derbas bikim, hevdişîna çêbîkim û ez dixwazim bo mîletê me, bo Amedê pêşketin, serfirazî, ji bo wan jî spas. Ji bo xebatkarên Kovara W spas dikim. Ez ji we re sebr û serkeftin, sihet, xebat û pêşdeçûyîna dixwazim.

W: Mamoste spas ji me, em jî spas dikin ji bo ku we em qebûl kirin û ji bo vê heyeyên li ser navê kovara W, em dîsa gelek kêfxweş in bi dîtina we ya li Amedê.

Peşkên şeva bilome

Berken BEREH

wek mizgîniyekê dialêse
rûyê min ê hincirî bayê nû

vê saetê
her tişt eyan beyan e
her tişt bi coşa veguherînekê

kalek li hizûra xwedê; diponije
jinek şîr didoşe bi bextewarî
qutabî dibuhirin bi bayê bezê

difikirim mîna dîneke devliken
min tim ji vê dinyayê hez kiriye

em ji nifşa êşeke peregende ne
xweşik, qerase xwîngerm
li orta zivistanê tiliyên me dikeliyan

min wisa hest kir îşev
belkî her şev wisa ye ez nû pê hesiyam
şewla tenêmayînê, gotinên dostên jidil

silav ey sibeha rû-gewr
tu ji her kesî bêhtir zanî
êşa zayînê li keviya terazinekê

Nexşeya min

Îlhamî OZER

navê min îlhAMEDîn e
ciyê zayîna min Erxenî
lê belê rojbûyîna min
mîna mirina min nediyar e ezbenî

navê dayika min Hewo
yê bavê min Ehmed e
min ji her duyan jî pirsî
gotin em kurd in û bajarê me Amed e

min got dayê, li cîhanê em ji kîjan zikî ne
barê me çima tim û tim ar û cemed e
got, lawikê min ez gorî
axa me Kurdîstan e, welatê me Med e

14 avrêl 2008

Mastê koçeran

Dilkanî

Me send mastê koçera
Toyê wî girt di ser ra

Tama devê me bû xweş
Rengê rûyê me bû geş

Dil diçû rûnê nivîşk
Ê bixwê bê dewîşk

Me dixwest rûnê teze
Gelek spî yê pez e

Me mast kir kodikê
Bir û anî l' ser dikê

Çavên me her li rûn e
Rengê dewê me cûn e

Me keyand û pir keyand
Sê jina piştê tewand

Li hev gelek bedel bûn
Bi ser neket kef û rûn

Dengê dewê me zelal
Rûnê me bibû xiyal

Me hêviya xwe birî
Êdî li rûn nenêrî

Lewre em têgihîştin
Toyê şîr hatiye girtin

Hate bîra me mehîr
Pê bixwin nanê fetîr

Mehîra mastê mêhîn
Di nav de pûnga bi bêhn

Nadim li ser sêniya
Bi goştê berx û şamiya

Dan û pûngê me anî
Li ser agir me danî

Dewê sipî berda ser
Di navê de heska zer

Dewê me pir sipî bû
Bê kerengê gupî bû

Ger heba ew û kundir
Pêçî diçûne hundir

Heska xwe her me tevda
Ta mehîra me kel da

Goştê bizina gobel
Nake mehîra berkel

Wiha digot bapîra
Bo berkela mehîra

Hekîm weke wê nîn e
Xwêdan ji eniyê tîne

Ji ser agir me danî
Firaqê xwe me anî

Sehen sehen tije kir
Li heft mala bela kir

Ew mehîra xweşikî
Di nav gund de herikî

Mastê me yê bê adan
Hemî bû dîn û îman

Satîlek ma ji bo me
Lê ê me da ma bo me

Ew mehîra subhanî
Heft roj kêfa me anî

Da me çêj û lezetê
Ser sêniya nîmetê

Rûnê teze û nivîşk
Li ber bû telp û dewîşk

Me wî rûnê jibîr kir
Me gotê qîr û sîr kir

Pir halxweş bû Dilkanî
Bi mehîra rehmanî

Dua kir bo koçera
Dûrê tengî û şera

Me got mala we ava
Tije ji bûk û zava

21.4.2004

Mirad

Mehmet Devîren

Werîs xwe gihandibû qirika min
Niqriskên mirinê li dora min digeriyan
Qebir bûbû çala heriyê ji bo min
Dar û ber
Teyr û teba
Banê bi dar de
Gedeyên di zikê dayika xwe de
Û yên li ser singûyan
Di axivin ji ber vê zilmê
Çiya û kevir li ber digirîn

û
Li ser min çirûsk dibarin
Mîzbehan çav ji min re dişikandin
Mawerdê xwe berdida damarên min
Û min reh berdida li vê jîyanê
Ruhê ruhanî xwe li bedena min digerand
Dibû mîna gewher?
Dibû mîna argeh?
Ji sorbûnê û berqê diperçivî qebra min
Şîn dibûn
Werd û sosinên narîn
Li ser AXA min.

Xatûn

Sîpan XIZAN

Ev girêka li ser dil e
Were veke xatûna min
Tîpên zulfan rengên gul e
Bila bêhn ke xatûna min

Rûyê gilover ê şêrîn
Neynik bo min xatûna min
Carek ez xwe tê de bibînim
Mirin bo min xatûna min

Guhar li min çava şikandin
Li pişt dêma xatûna min
Xwîna laşê min kelandin
Evîn lê ma xatûna min

Taxa eniyê ez bibînim
Reşkevanan xatûna min
Ku ebrû ne bimêzînim
Li ber qama xatûna min

Şewqa çavan min xeriqand
Carek bimêz xatûna min
Wan histiran min xeniqand
Dêman bûn rêz xatûna min

Pala pozê xizêm zerî
Dema min dî xatûna min
Li ber şewqê serî firî
Hiş û eqlê xatûna min

Xebitandina her du lêvan
Şîrîkelam xatûna min
Rengê têtên li ser keman
Revîn xem in xatûna min

Jora qirik min dî çenê
Toprihan e xatûna min
Digel şepala gerdenê
Silav dane xatûna min

Li paxilê taxa singan
Carek min dî xatûna min
Wan her du sêvên Kurdistan
Bi çavan dî xatûna min

Şaxa kinêr nava zirav
Min xemandin xatûna min
Gulî li piştê dan silav
Min helandin xatûna min

Carek min dî dest û lingan
Sor hine ne xatûna min
Li Sîpanê dikirin seyran
Aldare ne xatûna min.

21.9.1989

Dengbêjek û Stranek

Mistefayê Bohtî û strana Were Dînê

Amadekar: Hilmî AKYOL



Mistefayê Bohtî

Mistefayê Bohtî di sala 1955'an de li bajarê Sêrtê li navçeya Erûhê li gundê Torîk Memîra ji diya xwe bûye. Dibistan nexwendîye. Ji derve dîplomaya dibistana seretayî û ya navîn stendiye. 23 salan li gund maye. Di sala 1974'an de li gund dizewice. Hevala wî ji gundê wan e. Li gund karê rezvaniyê kiriye. Pez xwedî kirine. 12 salan şivaniya pezê malbatê kiriye. Dehl xwedî kiriye û karên malê kiriye. Bi eslê xwe kurmanç in. Malbata wî di sala 1750'yî de ji navçeya Şîrnexê ji herêma Besta hatiye navçeya Erûhê. Ji 9 saliya xwe û vir ve stran gotiye, dengbêjî kiriye. Carina ji ber karên xwe navber daye stranbêjiyê. Dengbêj Hesên ê ku jê re gotine "Heso Quto" diecibîne. Ew jî ji Erûhê bûye. Ji Heso Quto hîn bûye. Hinek stranên dengbêjiyê jî wî bi xwe çekirine. Di sala 1980'î de dikeve karê nexweşxaneyê sîgortayê. Du salan li bajarê Sakaryayê di nexweşxaneyê de dixebite. 24 salan jî li Bajarê Amedê di nexweşxaneyê sîgortayê de dixebite. Di sala 2006'an de malnişîn dibe. Mala wî li Amedê ye. Sê keç û kurekî wî hene.

Torîk Memîra

Torîk Memîra li bajarê Sêrtê li navçeya Erûhê ye. Gund di nevbera Erûh û Şîrnexê de ye. 2 km dûrî papûra Erûh û Şîrnexê ye. Berê rê di nav gund re derbas bûye. Ji ber kanên komerê rê derxistine derveyî gund. Gund 7 km dûrî Erûhê ye. Gund li alî rastê yê rîya Erûh û Şîrnexê dikeve. Di gund de sed malbat hene. Gundî tev kurmanç in. Bi kurmançî dipeyivin. Du qebîl in. Gund deşt û çiya ye. Deşt û zozanên gund hene. Gundî cotkariyê dikin. Heywanan xwedî dikin. Rez û dehlên gundiyan hene. 4 Malbat bê erd in. Wekî din her malbat xwedî erd e. Erdê gund nêzî 40 hezar elbî ye. Zengîne gund xwedî hezar elb erdî ye. Xizanê gund xwedî pêncî elb erdî ye. Ji sedî bîstê erdê gund tê ajotin. Dibistan û mizgeft û elektrîk û rîya gund heye. Bax û baxçeyên gundiyan hene. Ava gund heye. Danûstandina gundiyan bi Cizîr û Erûhê re ye. Berê bi hêstiran çûne û hatine. Niha bi mînîbus û tirimbêlan diçin û dizivirin gund. Di gund de traqtor û mînîbus û tirimbêl hene. Keyatiya gund li gund e.


Li başûrê gund gundê Mamîra heye. Li rojhilatê gund Çiyayê Çiravê heye. Li rojavayê gund gundê Hûtê heye. Li bakurê gund gundê Giverê heye. Ev hevdîtîna rû bi rû bi dengbêj re hatiye çekirin. Ev agahî ji devê dengbêj hatine nivîsandin.

Were dînê

Were dînê, were dînê, were dînê
Bakî rabû li welatê Bohta weke bayê kur e
Rebê Alemê ava bike welatê Bohta te jî tê da rez û pez e dehl û dir e,
Derd û kederên welat xirabtir e, ji derdê dil e
Were dînê, were dînê, were dînê dîn helakê

Were dînê, were dînê, were dînê
Êşiv şêv e, şêvi kasê, şêv eyaz e
Qîz û xortê gundê me xwe li hev dane
Rojekî rojê buharê, heyva nîsanê
Berê xwe dane çûne Kêla Hûtê,
Meşa wa zeriya weka meşa qazê,
Şêvên buharê li min bîne weka şêvên zivistanê,
Şêvên dirêj dikim nakim xewka mi nayê,
Ez nizanim çawa ji xwe ra razê.
Ji derd û kul û kederên welat ez nizanim çawa ji xwe ra razê.
Were dînê, were dînê, were dînê dîn helakê.

Were dînê, were dînê, were dînê
Mi go buhara welatê me yî Bohta buhar helizî,
Evê gulê pala xwe daye kulîlka, sosin û beybîn û vê Nêrgizê,
Wez ê qesem dikim navê Xwedê
Ez ê ti car û ti carê welatê xwe yê Bohta qet ji bîr nakim,
Heya Mistefayê Bohtî serê xwe deyne qebristanê giran, hêstir bizê.
Wez ê qesem dikim bi navê Xwedê
Ez ê Torka rengîn qet ji bîr nakim
Heya serê xwe deynim qebristanê giran, hêstir bizê.
Were dînê, were dînê, were dînê dîn helakê.



Dosye: Ev ndarE gulE
Mihemed Exc

Amadekar:
Azad ZAL – Dîlan AYDIN
Destpêk û zelalkirina çend xalan
Azad ZAL û Dîlan AYDIN
Jiyana Mihemed Şêxo û hunera wî
Îbrahîm EBDÎ û Mişelê OSMAN
Stran sînoran nas nakin
Qado ŞÊRÎN
Mamosteyê Ola Îslamê û hunermendê gelê xwe: Mihemed Şêxo
Îkram Balekanî
Kurtejiyana Mihemed Şêxo
Sedran C. NEWADAR
Mihemed Şêxo û hîlbijartina gotinan
Konê Reş
Dema bilbil bogulê dixwîne Bavê Felek tê bîra mirov
Tayîp TEMEL
Nefela çarpel
Rêvar Evîndar
“Bavê min 41 salî bû ji derdê Kurdistanê mir”
Hevpeyvîn: Mustafa Gazi
Nalîna axa bi şewat; Mihemed Şêxo
Mehdî Mutlu
Awaza evîndarî û dengê yekîtiyê Mihemed Şêxo
Mizgîn DÎLAN
Xwedîderketina li miriyan
Rizoyê Xerzî
Çend stranên Mihemed Şêxo digel notayan
Amadekar: Sedran C. NEWADAR

Destpêk û zelalkirina çend xalan

Navdarên Kurd ên hunermend, nivîskar, rewşenbîr û yd. ji wekî gelê kurd bê siûd û bê kes in. Kurd ji aliyê dinyayê ve bê xwedî, belengaz û perîşan hatine hiştin. Kesî/ê guh nedaye wan. Lewre kurd li xwe xwedî derneketine. Ji ber ku qedr û qîmet nedane xwe, her tim belengazî û bindestî bûye para wan.

Her tim kurd jêhatî, zîrek, qehreman û baş û rindê xelkê bûne, ji bo xelkê gelek caran şer kirine û li ser navê xelkê bi ser ketine. Lê tu caran ji bo xwe tiştek nekirine. Kêfa wan ji cîranên wan re hatiye, li wan xwedî derketine, lê mixabin kêfa wan ji wan bi xwe re nehatiye. Ev rastiyeke kurdan e û vê rastiya kurdan di hemû warên jiyanê de ji bo kurdan tiştekî neçê û bêkêr e.

Mixabin û sed mixabin ev rastiya kurdan li hember hunermend û rewşenbîr û kesên pêşevan ên kurd ji derketiye meydanê. Gelek alim, hunermend, nivîskarên hêja û delal ji

nava kurdan rabûne. Lê kurd li wan kesan xwedî derneketine, heta dema ku jiyana xwe ji dest dane, ji aliyê xelkên din ve hatine payebilindkirin û xwedî li wan derketine; paşê wekî ku hişê kurdan hatibe serê wan hêna xwestine li wan xwedî derkevin. Ebûl Îz El Cezîrî, Baba Tahirê Uryan, Seîdê Kurdî (Nûrsî) û hyd.

Mînaka herî balkêş û nêz hunermendê nemir Mihemed Şêxo ye. Mihemed Şêxoyê ku di jiyana xwe de her tim derdê feqîrî û hejariyê kişandiye; bi halê xwe yê belengaz zor û zextên neyaran li ser xwe dîtiye û her li ber xwe daye. Lê heta ku li ser rûyê dinyayê jiyaye kes lê xwedî derneketiye. Lê piştî ku li “Nexweşxaneyê Dewletê Ya Sûriyeyê” jiyana xwe ji dest daye bi deh-hezaran kes li hev civiyane û darbesta Mihemed Şêxo dane ser milê xwe û ew verê kirine. Lê berî ku jiyana xwe ji dest bide, li mala xwe, li nexweşxaneyê kesî/ê li dora xwe nabîne; û bi çavê xwe yê jiyani, heskirî û rûmetdarê xwe nabîne... Gelo

ev çî rewş e ku em kurd tê de dijîn... Lewma ku ew bi xwe wiha dibêje: **“Pere qirêja desta ye, xizanî û feqîrî ne kêmasiyeke bi şerm e, kêmasiya mezin ew e ku mirov xwedî pere be lê bê dost, hogir û rûmet be, xweşiya jiyânê ew e ku mirov di civakê de xwedî şexsiyeteke hezkirî û bidost, heval û hogir be. Feqîriya min ji bindestiya welatê min Kurdistana Mezin û reşerojiyên jiyana gelê min tê”.**

Her wiha ev rewşa xwedîlênerketinê bi awayekî din jî xwe di nava me kurdan de dide nîşandan. Ev jî nediyariya dem û cihê bûyînê ye. Cih û dema bûyîna Mihemed Şêxo jî ne diyar e. Di nivîsên ku ji bo dosyeyê hatine nivisandin de ev nediyarî xuya dike. Wekî amadekarên dosyeyê me di derbarê cih û dema bûyîna wî de tiştek diyar nedît. Li gorî nivîsên ku hatine ji bo dosyeyê:

“Di sala 1947’ an de, li gundê Xecokê ji dayik bûye” (Îbrahîm Ebdî û Mişelê Osman)

“Di sala 1948’an de li gundê Girbawî hate dinê” (Qado Şêrîn)

“Di sala 1948’an de careke din gundiyên Girbavê mizgîniyê didin hev. Fatma û Şêxmûs dergûşê amade dikin. Êdî kurê wan pê davêje qada jiyanê. Ji bo ku lawekî salih û emîn be navê wî datînin Salih. Lê ji bo ku malbat oldar bûye, pêşnavê Mihemed jî pêve dikin û navê wî datînin Mihemed Salih. Ji ber ku li gundê Xecokê xwendiyê hin kes bi şaşî cihê jidayikbûna wî wekî Xecokê dizanin.” (Îkram Balekanî)

“Hostayê mezin Mihemed Şêxo, di sala 1948’an de li gundê Xecokê ji dayik dibe” (Sedran C. Newadar)

“Di sala 1948’an de li gundikê Xecokê yê bi ser Qamişloyê ve hatiye dinê” (Tayîp Temel, ku ji malabata wî ev agahî wergirtiye)

Ji derveyî dosyeyê çavkaniyên ku me li wan mêze kir;

“Hunermendê kurd ê navdar Mihemed Şêxo di sala 1948’an de li başûrê rojavayê welêt, li gundê Gîrbânîn ya Qamişloyê tê dinê. Navê wî yê rastî Mihemed Salih Şêxmûs e. Di zarokatîya wî da malbata wî koçber dibe û li gundê Xecokê bi cih dibe.”

(Wîkîpediya Kurdî beşa Mihemed Şêxo)

Ev agahiyên ku hene cur be cur in û di hişê mirov de gengeşiyekê çêdikin. Lewre ev tev li ser bingeheke berbiçav nîn in. Jixwe kurd bi xwe li ser jiyan û bûyîna zarokên xwe û bûyeran qeydan nagirin, lewre pergaleke wan a ku diyar be û pê bawer bin tune ye lewma ku qet ji qeydan, nivisandina tarîxa bûyer û bûyînan hes nakin.

Dema ku em li van çavkaniyan dinêrin, dem û cihê bûyîna Mihemed Şêxo bi çend awayan e. Wekî tablo;

Dem	Cih	Çavkanî
1947	Xecokê	Îbrahîm Ebdî û Mişelê Osman
1948	Girbawî	Qado Şêrîn
1948	Girbavê	Îkram Balekanî
1948	Xecokê	Sedran C. Newadar
1948	Xecokê	Tayîp Temel
1948	Gîrbânîn	Wîkîpediya Kurdî

Li ser van agahiyan me hem ji hin kesan û hem jî li hin çavkaniyan nêrî û em gihîştin vê encamê; Ji ber ku Îbrahîm Ebdî û Mişelê Osman ji devê dayika Mihemed Şêxo girtine û hin çavkaniyên din jî vê yekê piştrast dikin em *“Di sala 1947’an de di meha Sibatê de li gundê Xecokê”* bûyîna wî; ya rastir dibînin û wisa dipejirînin. Ji xwe dokumenter û çavkaniyên ku hene jî hem ji devê hevsera wî, birayê wî Kenan Şêxo û yên din dertê ku ev ya rastir e.

Her wiha hinek xalên din jî hene ku divê em bînin ziman. Li Libnanê navenda ku dixwîne bi awayên cuda tê gotin; *“Navenda Hîndekariya Yekîtiya Muzîkê”* û *“Navenda Xwendina Yekîtiya Muzîkê”*. Me tê dernexist ka kîjan durist e. Lê me *“Navenda Hîndekariya Yekîtiya Muzîkê”* tercîh kir.

Bi awayekî kin û kurt der barê jiyana wî de mirov dikare wiha bibêje:

Mihemed Şêxo di sala 1947’an de li başûrê rojavayê Kurdistanê, li gundê Xecokê yê ku bi Qamişloyê ve girêdayî ye tê dinyayê. Navê wî yê resen Mihemed Salihê Şêxmûsê Ehmed e. Yazdeh xwişk û birayên wî hebûn ew mezinê wan tevan bû. Di sala 1959’an de diçe dibis-

tanê û heta sê salan dixwîne. Di sala 1969'an de diçe Beyrûdê û li wê dest bi xebatên muzîkê dike. Li wê li Navenda Hîndekariya Yekîtiya Muzîkê dixwîne. Di sala 1972'an de dibe endamê Hevgirtina Hunermendên Libnanê. Ji hunermendên libnanî Feyrûz, Nesrî Şemsedîn, Wedî' Elsaftî, Asî Rehbanî û yd. nas dike û bi wan re dostanî û hevaltiyê datîne. Di wê demê de pêşî di Koma Newrozê de dixebite û şûnde bi saya mamosteyê xwe Kemal Şanbaz tevli Koma Serkeftinê dibe. Mihemed Şêxo di sala 1973'an de derbasî Başûrê Kurdistanê dibe û li wir hem stranbêjiyê dike û hem jî tevli nava pêşmergeyan dibe û pêşmergetiyê dike. Li wir têkiliyên wî bi hunermendên kurd ên wekî Tehsîn Taha û yên din re çêdibe. Paşê vedigere Şamê û li wir kasêta xwe ya bi navê "Gewrê" derdixe. Ji ber ku kasêtê derdixe desthilatdariya Sûriyeyê zorê didê û li dû digere. Dîsa berê xwe dide Başûrê Kurdistanê. Bi têkçûna serhildana tevgera kurd a Başûrê Kurdistanê re derbasî Rojhilat dibe û li wir kasêtekê tomar dike. Li wir jî derveyê karê muzîkê çend salan mamostetîya ola îslamê jî dike. Li wê bi xwendekara xwe ya bi navê Nesrîn Husên Melekî re dizewice. Di nameya xwe ya ku ji Dr. Şewket re dişîne wiha dibêje: *"Evsal ez tev keçekî îranî zevicim, belê di eslê xwe de kurd e û xelkê bajarê Sine ye."* Ji wê zewacê 4 zarokên wan çêdibin. Yek jê piştî bûyîne dimire. Ji ber xebatên wî yên muzîkê ku li ser welat û rewşa kurdan e desthilatdariya Îranê jî lê tê xezebê û wî sirgûn dike Eyaleta Mazenderana Îranê, Gunbedê Kawis. Li wir mamostetîya ola Îslamê dewam dike. Ji ber vê yekê Mihemed Şêxo piştî 11 salan careke din berê xwe dide Sûriyeyê. Lê dîsa Sûriye dev jê bernade.

Mihemed Şêxo stranên xwe yên herî baş li zindanan dibêje û di kilam û stranên xwe de derd û kulên gelê xwe û daxwaz û baweriyên wan bi hunermendiyeke bilind tîne ziman.

Dengekî wî û muzîkeke wî ya xweser û taybet hebû. Her wiha fîzîkeke wî ya taybet û xweser jî hebû. Bejna wî gelek dirêj bû.

Mihemed Şêxo di sala 1983'yan de vedigere Qamişloyê û heta sala 1988'an gelek berheman diafirîne. Mihemed Şêxo di 9'ê Adara 1989'an de jiyana xwe ji dest dide.

Mihemed Şêxo di rewşeke xirab de ku qet pereyê wî tune ne û gelek belengaz e de diçe ser dilovaniya xwe. Piştî ku jiyana xwe ji dest dide xwedî lê tê derketin. Bi deh-hezaran kes tî hewariya wî û wî defin dîkin. Tenê mirov dikare vê pîrsê bipirse: Çima dema ku sax bû kesê/i lê xwedîtî nedikir?



Ji ber vê jî em dîsa bi gotina wî ya li ser feqîrî û belengaziye bîqedînin:

"Pere qîrêja desta ye, xîzanî û feqîrî ne kêmasiyeke bi şerm e, kêmasiya mezin ew e ku mirov xwedî pere be lê bê dost, hogir û rûmet be, xweşiya jiyana ew e ku mirov di civakê de xwedî şexsiyeteke hezkirî û bidost,

heval û hogir be. Feqîriya min ji bindestiya welatê min Kurdistanê mezin û reşerojiyên jiyana gelê min tê".

Spasî

Ji bo amadekirina vê dosyeyê em bi gelek kesian re ketin têkiliyê da ku em dosyeyeke xurt amade bikin. Gelek sax bin, alîkariya gelek dost û hêjayan çêbû. Di serî de em ji rêzdar Cemal Tîrêj re spasdar in ku ew hem bû alîkar û hem jî dokumenter ji bo me peyde kir. Her wiha rêzdar Rizoyê Osê jî ew ê bi nivîsekê tevli vê dosyeya me bibûya, lê mixabin ji ber ku nexweş ketiye nikaribû binivîse, em jê re baweriyê dixazin û em hêvî dîkin ku di demeke kin de ji nexweşîna xwe rizgar bibe.

Her wiha sipasiya xwe ji nivîskar û lêkolînerên ku bi nivîsên xwe tevli dosyeya me bûne re pêşkêş dîkin.

Azad ZAL û Dîlan AYDIN

Gava mirov bixwaze li huner û stranên

Jiyana Mihemed Şêxo û hunera wî

Îbrahîm Ebdî û Mişelê Osman

"Dîroka bizava mîletê kurd hemî bi rêka stranê hatiye gotin"

Mîr Kamûran Bedirxan

urdî guhdar bike, bêguman wê gelek hunermendên navdar bibîne. Nexasim hunermendên ku bûne stûn û bingeh di hunera kurdî de, mîna Kawis Axa, Mihemed Arîfê Cizîrî, Îsa Berwarî, Meyrem Xan, Eyşe Şan û gelek hunermendên din. Yek ji vana Mihemed Şêxo ye.

Gelo her kes dikare di deryaya hunera Mihemed Şêxo de avjeniyê bike?

Belê, her kes dikare. Gava ku mirov li stranên wî guhdarî bike, hingê em ê binasin ku çi taybetmendiyeke wî heye di helbijartina helbestan de, lê gava em stranên wî vekolin û şîrove bikin, hingê em ê binasin ku Mihemed Şêxo kî ye.

Zaroktiya Mihemed Şêxo

Navê wî yê resen Mihemed Salihê Şêxmûsê Ehmed e. Li ser jidayîkbûna wî her kes tiştekî dibêje, lê diya wî ya bi navê Fatma wilo dibêje: *"Gava Firensî ji Sûriyeyê derketin piştî salekê, di dawîya Sibatê de Xwedê Mihemed da min li gundê Xecokê yê mezin, hîn di çilî de bûm, Çaçanê Xelo hate kuştin li gundê Qotikê"*.

Ango Mihemed Şêxo di sala 1947'an de, li gundê Xecokê, li Başûrê Biçûk nêzikî bajarê Qamişloyê ji dayik bûye. Gundê Xecokê 20 km dûrî bajarê Qamişloyê ye.

Di sala 1959'an de, li gundê Xecokê, dest bi xwendinê kir, di xwendina xwe de jîr û şareza bû, ji ber vê yekê mamosteyê dibistanê Mihemed Cim'a Kêzawî pir ji wî hez dikir. Mihemed Şêxo li Xecokê bawernameya seretayî wergirt.

Di sala 1965'an de çû Qamişloyê ji bo xwendina dibistana navîn.

Di sala 1967'an de, dev ji xwendinê berda, bi sedemên rewşa aborî û destengiya malbata wî û êşa çavên wî. Vegeriya Xecokê,

Ji ber ku yê mezin bû, di nav xwişk û birayên xwe de xwe berpirsyar didît. Ji ber vê yekê bi bavê xwe re di nav zeviyên xelkê de avdaniya pembo û baxçeyan dikir.

Di kar û xebata rojane de, car bi car Mihemed Şêxo mijûl dibû, der barê gelê xwe de wiha digot: Çima gelê min xizan e, hejar e, bindest e?

Apê wî Hisên mamosteyê çêkirin û kokkirina tembûran bû. Carina tembûr ji heskê çêdikir, carina jî ji tarên moxil û bêjangan çêdikir. Mihemed Şêxo daxbar bû bi apê xwe û evîna tembûrê ji zaroktiyê ve kete dilê wî. Hîn biçûk bû dixwest xwe hînî tembûrê bike.

Xwe fêrî xwendina zimanê kurdî kir, diwana helbestvanê mezin û hêja Cegerxwîn "Pîrûsk û Pêtî" baş dixwend û jiber dikir. Li îzgeha Erîwanê û Bexdayê li Hunermendên Kurdistanê yê wekî Mihemed Arîfê Cizîrî, Hesenê Cizîrî, Kawis Axa, Îsa Berwarî, Garapêtê Xaço, Meyrem Xan, Nîsrîn Sêrwan, Elî Merdan, Eyşe Şan guhdarî dikir.

Piştî van hunermendan, di warê stranên nû de, li Tehsîn Taha, Şemal Sayib jî guhdarî dikir.

Der barê folklor û hunermendên kurd ên klasîk de wilo digot:

"Ew hunermend tev çavkaniyên kevnetor û hunera gelê me ya klasîk û dîrokî ne. Hunermendê ku kevneşopa folklor û dengbêjên welatê xwe ji xwe re neke hîm û binaxe û ji wan bingeh nestîne, ew nikare hunereke temendirêj û dîrokî pêşkêşî gelê xwe bike."

Di sala 1968'an de navê wî ji bo çûna leşkeriyê hat, lê ji ber ku her du çavên wî bêhêz bûn ew bexşandin.

Xelata herî mezin jê re ew bû ku gava apê wî Hisên tembûrek jê re diyarî kir. Wî jî hewl

dida ku xwe pêş ve bibe.

Mihemed Şêxo jiyana xwe li gelek gundan bihurandîye. Li Xecokê, Amirê Mezin, Hecî Nasir, Xirbê Kurman... Lê gava çûne gundê Xirbê Kurman û salekê lê mane, li wî gundî mamostayê hunerê Xelilê Êzîdî nas dike. Xelilê Êzîdî digel hunermend Hisênê Tewfê û Helîmê Hiso her dem şevbihêrkên hunerî li dar dixistin. M. Şêxo gelek sûd ji wan şevbihêrkan wergirt.

Çûna Libnanê

Mihemed Şêxo di dawiya sala 1969'an de berê xwe da Beyrûdê. Li Beyrûdê li Navenda Hîndekariya Yekîtiya Muzîkê xwend.

Di sala 1972'yan de bû endamê Hevgirtina Hunermendên Libnanê.

Hevalbendîyeke xurt di navbera wî û hunermendên Libnanê yên mîna Feyrûz, Nesrî Şemsedîn, Wedî' Elsafî, Asî Rehbanî de çêbû.

Wê çaxê li Beyrûdê sê komên hunerî hebûn:

1-Koma Serkeftin bi serokatiya hunermend Mehmûd Ezîz Şakir.

2-Koma Newroz bi serokatiya hunermend Seîd Yûsif.

3-Koma Gulîstan bi serokatiya hunermend Mihemed Teyib Tahir.

Mihemed Şêxo pêşî di koma Newrozê de kar kir. Piştê bi rêya mamoste Kemal Şanbaz xwe gihand Koma Serkeftin.

Hunermendê hêja Mehmûd Ezîz Şakir ku serokê Koma Serkeftinê bû di hevpeyvîneke xwe de wilo dibêje:

"Me di koma Serkeftin de kar dikir, rojekê rehmetiyê Kemal Şanbaz xortek bi xwe re anî û ji min re got ku ev Mihemed Şêxo ye, wê bi we re kar bike. Despêkê me odeyek ji Mihemed Şêxo û Remdan Necîm Omerî re kirê kir. Di pey re me dest bi provayên xwe kir. Wê çaxê Mihemed Şêxo stran nedigotin. Tenê li tembûrê dixist. Min jê re got "Dengê te xweş e çima tu nastirêyî?" Wî got "Ka ez ê çî bistrêm?" Min stranên xwe nîşanî wî dan.

Du stran ji nava wan helbijart. Yek jê "Di Baxan Dilber im Sorgul" û ya din jî "Gewrê" bû. Me di komê de prova kirin û me dest pê kir. Di 18'ê meha 12'an a 1971'an de li sînemaya Rîvolî me di bin siya Serokşalyarê Libnanê Saib Selam de ahenga xwe li dar xist. Ahengek din jî me li sînemaya Biblosê, di 24'ê meha 4'an a 1972'yan de çêkir. Her du aheng jî bi serkeftinê derbas bûn."

Di sala 1972'yan de, piştî şerê Libnanê, Mihemed Şêxo vegeriya gundê xwe Xecokê û li Rimêlan kar kir. Di wê demê de li Tirbespiyê rûdinişt. Bi alîkariya çend hevalên xwe komek muzîkê damezirand. Lê desthilatdariya Sûriyeyê nehişt ew her du kar berdewam bikin. Di pey re dest bi vejandina şahî û cejnên Newrozê kir. Hino hino deng û stranên wî derbasî dilê her kesê/a kurd bûn.

Çûna Başûrê Kurdistanê

Di dawiya sala 1972'yan de digel astengî û kelemên di rê de, wî berê xwe da Başûrê Kurdistanê. Ji wir çû Bexdayê. Strana yekemîn 'Bexçê Gula' li îzgeha Bexdayê tomar kir. Heyva pêşî di rojekê de sê caran dihate weşandin. Piştê re vegeriya Qamişlo. Gelek zehmetî ji desthilata Sûriyeyê dît. Li wê derê gelek caran dihat girtin. Di sala 1973'yan de cara duyemîn çû Bexdayê û li wê stranên nû di îzgehê de tomar kir. Xelkê dengê Mihemed Şêxo di Radyoya Dengê Kurdistanê û Bexdayê û Kermansahê de dibihîst û guhdarî dikir.

Di sala 1974'an de Mihemed Şêxo li Sersingê digel Hisênê Haco û birayê wî yê biçûk Ehmed (Zero) dijiya. Di wê demê de tevli Festîvala Hunerî ya Kurdî ya Bexdayê bû. Di wê çaxê de pêwendiyên wî bi hunermendên navdar ên mîna Mihemed Arîfê Cizîrî, Îsa Berwarî, Şemal Saib, Tehsîn Taha, Bişar Zaxolî, Gulbihar û hyd. re çêbûn. Ji bo Mihemed Şêxo serdana wî ya herî mezin serdana Mele Mistefa Berzanî yê nemir bû. Berzanî bi dilekî fireh pêşwaziya wî kir. Piştê wî jî strana 'Kê Dunya Hejand' li ser Berzanî got. Gava agirê Şoreşa Eylûlê li Başûrê Mezin geş bû Mihemed Şêxo jî xwe tevli rêzên tevgera kurd kir û di hêla Başûr de bi

pêşmergeyan re xebat kir.

Çûna Rojhilatê Kurdistanê

Piştî peymana Cezairê û têkçûna Şoreşa Kurd, ew û Hisênê Haco û birayê wî yê biçûk Ehmed (Zero) bi pêşmergeyan re, çûn Rojhilatê Kurdistanê. Di kampa penaberan a li bajarokê Rebetê de, bicîwar bûn. Di pey re li Mehabadê bicîwar bûn. Li wir zimanê Farişî xwend û diplomaya wî wergirt. Li wir pêwendî bi Mistefa Etrûşî û Xelef Zebarî re çêkir. Di 1977 û 1978'an de, kasêta xwe tomar kir a ku tê de dibêje 'Mehabad Kaniya Xwîna Şehîdan.'

Bavê Felek li Ormiye û Mehabadê Qazî Mihemed û Simko bi bîr dianî. Piştî du salan ji ber kar û xebatên wî, desthilata Îranê der bi der siya Mihemed Şêxo dişopand. Ji ber vê yekê ew û gelek malbatên kurd, sirgûnî parêzgeha Ostanê Mazenderan bajarê Kunbedî Kawis ku nêzîkî derya Qezwînê ye hatin kirin. Mihemed Şêxo di dibistaneke wê derê de bû mamostayê ola îslamê... Nesrîn Hisên Melekê di wê dibistanê de rêza nehan dixwend. Wî di wê dibistanê de Nesrîn nas kir û di sala 1977'an de zewicîn. Di dibistanê de heyvê 300 Tûmanê Îranî distend, lê piştî ku bi Nesrînê re zewicî 150 Tûman danê. Diya Felekê dibêje: *"Rewşa me pir xirab bû, desthilata Îranê gelek ziyan dighande me, ji Bavê Felek re digotin divê tu di stranên xwe de navê Kurdistanê nebêjî. Lê Bavê Felek li wan vedigerand û digot: 'Ji bo Kurdistanê ez gihîştîm vir.'* Dibû eyd û erefat em ji mal dernediketin. Bavê Felek radihişt tembûra xwe û stran digotin û pê re digiriya. Her çendekî em di malekê de bûn. Ji ber vê yekê Xwedê Bêkes da me û Bêkes çû dilovaniya Xwedê."

Piştî sê zarok ji wan re çêbûn; Felek di sala 1979'an de,

Îbrahîm di sala 1980'yan de, Birûsk di sala 1982'yan de.

Vegera Bavê Felek

Di sala 1983'yan de vegeriya û li bajarê Qamişlo bicîwar bû.

Di sala 1987'an de, tomargehek vekir bi navê Felek. Lê mixabin, desthilata Sûriyeyê nehişt ku salekê dewam bike, alavên tê de tev birin. Piştî 5 salan vegerandin. Lê wê demê Mihemed Şêxo koç kiribû.

Bavê Felek di navendeke hunerî, gelêrî de li Qamişlo, zarok û xort hînî muzîk û stranan dikir. Bi taybetî stranên gelêrî û sirûdên neteweyî û welatparêzî.

Gelek alîkarî bi hunermend Rifetê Darî re dikir, bi taybetî stranên Folklorî 'Hemdîn û Şemdîn', 'Hemê Mere' pê re li bizqê dixist.

Bêtirî 110 stranan di 14 kasêtan de tomar kiriyê. Di van kasêtan de stran dubare nabin.

Koçkirina Mihemed Şêxo

Di despêka avdarê de bi xwişka xwe re çûbû Şamê. Xwişka wî nexweş bû. Li Şamê Bavê Felek êşiya. Piştî vegeriya Qamişlo, di 4'ê avdarê de li mal gelekî êşiya, doxtor Ebdulmecîd anîn ser. Rewşa wî pir xerab bû. Ew birin nexweşxaneyê dewletê, di pey re ew anîn mala wî dişa nexweşiyê zor lê kir. Roja 9'ê avdarê demjimêr 5 'ê sibehê çavên xwe li



jiyanê girt. M. Şêxo, hesreta 40 salî ya dîtina Kurdistanê azad û serbixwe bi xwe re bir gorê. Nûçeya mirina wî zû belav bû di nav gel de. Êvara wê rojê bêtirî sed hezar kesî kal û pîr û jin û mêr, zarok û keç li dû darbesta hunermendê xwe meşîyan bi yek dengî wilo digotin:

Namire namire Bavê Felek namire!

Namire namire Mihemed Şêxo namire!

Berê xwe dane goristana Hilêliyê û li wir hate veşartin.

Pirtûkên çapkirî li ser Bavê Felek:

1-Stranên Mihemed Şêxo: Ji aliyê Biha Şêxo û Qado Şêrîn ve stran hatine berhevkirin û pirtûk hatiye amadekirin. Di sala 1994'an de çap bûye ji weşanên Aso hatiye belavkirin.

Bi rastî kar û xebata her du mamosteyan Biha Şêxo û Qado Şêrîn, cihê rêzgirtinê ye. Lê pir şaşî tê de hene. Hinek ji wan şaşîyan ev in: Di helbestan de gelek şaşiyên rênivîsê hene, navên helbestvanan bi hev guhertine wek nimûne:

1- *Strana Gewrê:* Wan di pirtûkê de gotine ev helbest ya Kemal Şanbaz e; lê ya durist ev e ku gotin û awaz ên Mihemed Elî Şakir in.

2- *Strana Eman Dilo:* Wekî ya Mihemed Elî Şakir diyar kirine; lê ya durist ev e ku gotin û awaz ên Yusifê Berazî (Bêbihar) ne.

3- *Strana Perwîn:* Wekî ya Bêbihar hatiye diyarkirin; lê ya durist ev e: Gotin Omerê Lelê (Rêncber) e û awaz a Mihemed Elî Şakir e.

Gelek helbest bê xwedî ne. Ango navên helbestvanan diyar nekirine...

2- Mihemed Şêxo Stranên Helbijartî

Ji aliyê Hisên Îbrahîm ve di sala 2007'an de hatiye amadekirin. Mamoste Hisên Îbrahîm, di pertûka xwe de 24 stranên Bavê Felek note kiriye û wek CD jî pê re belav kiriye.

Bawernameyên rêzgirtinê û diyariyên ku ghiştine malbata Bavê Felek:

1-Komeleya Hunermendên Kurdistanê: Zaxo 1.1.1992

2- Bawernameya Televîzyona Kurdistanê: Kenalê Dihokê 1.1.1992

3- Wêneyê Bavê Felek diyarî ji xwendevanên zanîngeha Şamê: 9.3.1999

4- Bawernameya pêncsaliya Seydayê Tîrêj: 2007

5- Peykerê Bavê Felek diyariya Grûba Heseke ya rewşenbîriya kurdî: 9.3.2007

6- CD'yek li ser jiyana Bavê Felek, diyariya Grûpa Heseke ya rewşenbîriya Kurdî

Bavê Felek çiqas zordarî, hejarî, feqîrî dîtibe jî, lê her tim wilo digot:

"Pere qirêja desta ye, xizanî û feqîrî ne kêmasiyeke bi şerm e. Kêmasiya mezin ew e ku mirov xwedî pere be lê bê dost, bê hogir û bê rûmet be. Xweşiya jiyanê ew e ku mirov di civakê de xwedî şexsiyeteke ku tê hezkirin û bi dost, bi heval û hogir be. Feqîriya min ji bindestiya welatê min Kurdistanê û reşerojiyên jiyana gelê min tê".

Dawî

Em ê mijara xwe bi gotina mamosta Mehmûdê Sebrî bi dawî bikin.

Mamosta Mehmûd Sebrî yanî Evîndarê Xemgîn li ser Mihemed Şêxo wisa dipeyive:

"Mihemed Şêxo Xwedê jê xweş be. Hunermendekî bi nav û deng bû, navdar bû, digel ku ez di hunerê de ne gelekî zana me lê ez karîm bibêjim Mihemed Şêxo bilbil bû di strana kurdî de. Lê bilbilekî pabend (multezim) bû, dev ji gula xwe bernedida, gula wî doza gelê wî bû, gelek azar û tengezarî û dijwarî dît, biyanîti, hejarî, feqîrî dît derbider bû, digel wî jî, li ser soza xwe û welatparêziya xwe ma, ta gihaşt Xwedayê xwe. Mihemed Şêxo mirovekî dilpak bû, derûnpaqij bû, sinc û siruştiyên wî gelekî paqij bûn, ez dikarim bibêjim ku tu kes ji Mihemed Şêxo nedidexisî û jê aciz nedibû. Mihemed Şêxo gava gihaşt Xwedayê xwe, nemir ma û wê nemir bimîne. Bila hunera kurdî û rewşenbîriya kurdî sax bimînin û pêşve herin û gul bidin".

Keser971@hotmail.com û mishelosman@hotmail.com

Stran sînoran nas nakin

Qado ŞÊRÎN

Bêguman ev gotar ne dilopek ji derya jiyana nemir e. Tenê min xwestiye ku pencereyekê li jiyana wî vekim. Dibe ku sira bayê wî li hiş û ramanên kesên ku ji muzîkê fam dikin, bixe û karekî pisporî ji vî hunermend û dengbêjê hêja re bikin. Di vê gotarê de ez ber bi muzîka wî ve nêzik nebûme ji ber ku ev bêhtir kar û xebata kesên ku ji muzîk û dengbêjiyê fam dikin e û bi taybetî ew kesên ku bi muzîkê re mijûl in, lê min bi kurtî jiyana wî bi awayekî çîrokî û hêsan nivîsiye ji bo her kes xwe di neynika jiyana wî de bibîne û di serî û sawirê wî de bimeyê.

M. Şêxo di gotinên stranên xwe de; roj e, azadî ye, jiyana e, pêşmerge ye, bilbil e... Gotinên wî hîlbijartî ne da ku bi şêweyekî taybet nava mirov ji hezkirin û mirovatiyê tije bike. Di her helbesta wî de deryayek ji girî û dîlşewatiyê heye. Ji bo tevahiya kurdan gotinên stranên xwe hîlbijartine. Ew bi şêweyê muzîk û helbestên stranên xwe diyar dike ku wî rewşa kurdan baş fam kiriye, stranên wî hemû bi axîn û bêzarî ne, rengê wî yê taybet heye. Ango wî dibistanek bixwe damezrandiye. Gotinên stranên wî mirov di jiyana, evîn, welat de har û dîn dikin, wîndî dikin, her straneke wî efesanekek e, helbestek e, deryayek e, giriyekek e, şoreşek e, destanek e, gulek e, dilberek e, çûkek e, dê û nanekî tenûrê ye, di her strana xwe de kurdistan wek dilber, wek gulekê pêşkêş dike. Nimûne: 'Ay lê gulê.'

Bi kubarî jiyana xwe borand... Wek bazekî payebilind û serfiraz, wek çûkekî azad ku sînoran nas nake jiyana xwe borand. Rewşa rojane ya xerab qet bandora xwe li guhertina jiyana wî nekir, belê strîn wek ava ku ji kaniyeke sermedî biherike, ta ku dilê wî yê mezin fikir tik tik, wî stran dane.

Di sala 1948'an de li gundê Gîrbawî hate dinê. Navê wî Mihemed Salih kurê Şêxmûs e, diya wî Fatma ye, kalikê wî Ehmedê 'Doqo' ye, pênc bira û şeş xwişkên wî hene, navê jina

wî Nesrîn e û niha li ba birayê wî Biha dimîne. Berî ku biçê dibistanê, di sala 1964'an de ji Gîrbawî rê digire gundê Xecokê û li wî gundî dibistana seretayî dixwîne. Di dersxana sîsiyan de Quran xitim kiriye, di xwendina olî û di ya dîn de jî gelekî jîr û zana bû, belengazekî melûl bû û ji ber vê yekê kesî tu hêvî jê nedikir ku rojekê ji rojan bibe kesekî mezin û hunermendekî navdar. Di wan deman de û ew jî hîn zaro bû, diya wî xewnekê dibîne û ji Şêx Reşîd re dibêje; 'Min didît di qulikekê re şewqek tûj xwe bera nivê hundirê mala me dida'. Şêx Reşîd wisa xewna wê şirove dike û dibêje; wê kurekî we yan wê dinyayî be yan jî wê axretî be, wê gelek nav û dengî pê keve.

Ku xwendevanên hevalên wî dersên xwe ezber nedikirin li alî wan dirawestiya da ku li pêş çavên wî lêdanê ji mamoste nexwin. Di vê demê de û hîn zarok bû nerînên wî ên qatî ber bi çav bûbûn. Nemaze dema komunîst gihîştibûn gund û belavok û daxuyanîyên wan xwendine, ta ku carekê û bi sedema bîr û baweriyên xwe bi SELAH re bi şevê dikeve zindana dibistanê lê li tiştêkî mikur nehatiye.

Malbata wî gelek caran mişext û der bi der geriyan. Her demekê li deverêkê bi cih bûne. Di 1963'yan de carê li gundekî bicih bûbûn. Li Amir, Gîrbawî, Nicim. Lê ew li ba apê xwe Ehmed dima û dibistana seretayî xilas dike. Piştî ku xwendina xwe li gundê tamam dike diçe ba apê xwe Berces ku li bajarê Qamişlo ye û li ba wî salekê dimîne. Gundî, ji ber ku M. Şêxo di xwendina xwe de gelek jîr û li pêş bû û zarokên wan ne wisa bûn, dextesî ji wî dikirin û jê ditengirîn. Gotinên nexweş jê re digotin û tiştên bi bêbextî û derew dixistin stûyê wî digotin: Meyê vedixwe û her roj serxoş e û diçe şahiyên filehan. Wan wisa digotin da ku dev ji dibistanê berde û bibe mîna zarokên wan. Lê ew dimîne û dixwîne, piştî salekê anga di 1965'an de ji gundê Qamişlo û dema ku di dersxana heştan (pol) de bû li dibistana 'Îrûbê' êş dikeve çavên wî, bav jî ji

ber rewşa aborî ya xerab nikare tişteki bike. Xwendevanên hevalên wî çend qurîşan berhev dikin û wî dişînin Helebê, ji wê rojê pêve berçavkê dide pêş çavên xwe. Xwendevanan pîrozbahîya wî kirin û kêfxweşiya xwe jê re diyar kirin dema bavê wî, ji bo wî carekê diçe dibistanê, mamoste jê re dibêjin; ji kurê xwe re bibêje bila li pêş xwendevanan bi me re ewqas giftûgoyê neke. Ji ber ku em şerm dikin, ma wek me ye yan wek wî ye? Bavê wî bersiva wan dide û dibêje; 'Na weleh weke wî ye ne weke we ye.' Çavê kurê wî ji kesî nedişikêst û serê xwe ji kesî re neditewand. Ji ber ku Filehên 'Partiya Netewa Sûriyê' gelek serêşandin ji xwendevan û şagirtên kurdan re çêdikirin. Di wê demê de M. Şêxo xwendevanan li dora xwe dicivîne û dest bi tembûr û muzîkê dike û şahiyên Aramê Dîkran amade dike. Tembûrê ji galon, kod û ji darika çêdike li gund apê wî Husên carekê tenbûreke bedew çêdike; ji Farûqê Şêx Hemîdê Huseynî yê Berko pêve tu kes tune bû ku bizanibe lê bide û Farûq jî, ji hefteyê carekê dihat gund, apê wî jî tembûr ji ber destên wî yê ku dilê wî li ser dipertî dikir sepetê û kilît dikir. Paşê apê wî jê re got: Ez ê çend stranên kurdî bibêjim ku te baş lêda ez ê bidim te û bila ji te re be, lê M. Şêxo ne tenê wan baş lêdide. Çend stranên erebî jî lêdide. Mixabin temenê wê tembûra bedew kurt bû. Ji ber ku carekê li hewşê lêdida û ji nişka ve bavê wî bi tevli mele û mirovekî din derbasî hewşê dibin. Ji tîrsa tembûrê bi lez û bez wê dispêre quncikekê û paçekî bi ser wer dike. Mele ji hemû deveran pala xwe dide tembûrê û qirçîniyê jê tîne û dibêje; ev çi bû min şikand? M. Şêxo di nava xwe de ditengire û dibêje; ne tişteki bû.

Di sala 1967'an de dibistanên Sûriyeyê deriyên xwe ji ber şer digirin. M. Şêxo dikeve rê û diçe gundê Xecokê. Gundî jî bi hatina wî kêfxweş û şa dibin. Ji ber ku ew jî dibe wek kurê wan. Dema ku dibistan dîsa vedibin bavê wî ji ber gotinên xelkê pera nadê û nema diçe xwendinê. Ji ber çavên xwe, ji leşkeriyê efû dibe. Da ku alîkariya bavê xwe bike û barê malê hilgire.

Têkiliyên wî yên polîtîkî bi Partiya Komunîst a Sûriyeyê re çedibin. Lê ji ber ku li ser

daxwaza wan stranan li ser Xalid Begdaş (serokê giştî yê P.Q.S) nabêje ew têkilî dom nakin. Ji ber ku pîrsgirêka kurd û Kurdistanê ne di bîr û bala wan kesan de bû û ne jî di pîlanên wan de bû ku tişteki jê re bikin.

Jiyana wî di malê de gelekî dijwar bû, yek ji wan dijwariyan, çaxê ku di embara baran de radiza, gelek caran di tariyê de şevên zivistanê diborand, gelek caran diçe gundan li tembûrê digere û şevên xwe wisa diborîne û li radyoyê guhdarî dike.

Di 1969'an de gelek caran diçe ba Husênê Tewfî û Xelîlê Êzîdî çimkî tenbûr li ba wan hebû û li gundê Nêfê cara yekemîn e ku eşkere stranan dibêje û li tenbûrê dide ji bo beyana 11'ê avdarê di 1970'yan de.

Bavê wî li ser zimanê mela her gavê jê re dibêje; 'yê ku li tenbûrê xîne îman di tiliyên wî de namîne.' Hingî ku ji ber rewşa aborî perîşan dibin koçemal bar dikin Binya Red li wir avdaniyê dikin, ji gundekî diçûn gundekî. Hingî dilê wî bi ser tenbûra wî ve bû pîrê caran dihatê şikandin. Carekê hîn li wira tenbûra wî di pencerê de bû, mirîşkek dikeve pencerê, bû kiş kiş wî ji bo ku berde wê lê mirîşkê tenbûr da erdê û kir du perçe, radibe bi dû mirîşkê dikeve ta ku nigê wê dişikêne. Di wê salê de bi qaçaxî derbasî Tirkîyeyê dibe. Zilm, zordarî, bêbextî nedipejirand, carekê peze ereban dikeve nav pembûyê wan, li yê ereb dide. Di eynî salê de Helîmê Hiso (Bavê Luqman) li wê deverê avdançî bû, li ser avê li yekî ereb dide û wî di coya avê de dirêj dike. Yê ereb hawar û gaziya xwe dibe dost û hogirên xwe, li gel vê jî M. Şêxo bi mîrxasî li hemberî wan radiweste û demançê li wan derdixe û wisa dibêje; yê ku nêzik bibe bê şik ew kuştî ye, yek ji wan ceger nake û nêzikî wî nabe.

Di 1970'yan de û piştî ku careke din dizivire gund, berê xwe dide Beyrûtê da ku hînî muzîkê bibe, li wir bi xurtî û berfirehî dest bi muzîkê dike û di Navenda Hîndekariya Yekîtiya Muzîkê de dest bi xwendina muzîkê dike û digel Memhmûd Ezîz, Rifetê Darî, Seîd Yûsif û Remedan Nicim Omerî di Koma Serkeftin de dibe endam.

Berpirsiyarê komê di cî de wî dipejirîne. Di şahiyêke wî de serokê Libnanê Sulêman Ferenciyê amade dibe û gelekî kêfxweşî û razîbûna xwe dide diyarkirin. Di radyoya Libnanê de stranên wî yên kurdî belav dibin û di wê çaxê de navê wî dibe M. Şêxo. Dengbêja ereb Semîra Tewfîq ji wî dixwaze ku di koma wê ya muzîkê de kar bike, di 1972'yan de di yekîtiya hunermendên Libnanê de dibe endam. Stranên ku bi wan û bi hevkarîya Mehmûd Ezîz û Mehmûd Eclî dibe bi nav û deng ev in ;

Gewrê

Zeynebê

Gulîzar

Heps û Zindan

Rabe Ji Xewê

Eman Dilo

Di Baxan Dil

Ber Dilê Min Pir Şêrîn e

Hêjayî gotinê ye ku çûna wî ya Libnanê bi qaçaxî bû.

Di 1972'yan de ji Libnanê derdikeve ji ber ku hewldana kuştina wî dibe. Nêrîna wî der barê Libnanê de ev bû: "Nêzik ne dûr, wê kesek nema bikaribe li Libnanê bijî." Ev gotina wî di 1972'yan de bû. Piştî dizivire welêt û dibe berpirsiyarê koma muzîkê ya Rimêlan (navenda petrolê) û ji bo bîrhatina "Tevgera Teshîhî" (ya ku serokê Sûriyeyê Hafîz Esed pê rabûbû) xwe dide alî û nema diçe karê xwe û

ji Rimêlan tê qewitandin, di vê salê de diçe Iraqê û di radyoya kurdî de stranên dibêje (Gewrê, Bexçê Gula, Ber Dilê Min Pir Şêrîn e, Di Baxan Dil, Eman Dilo.) Piştî ji Iraqê vedigere Sûriyeyê dest bi stranên netewî dike û di şevbêrkan de jî dibêje. Piştî guhdana wî ji kêşa miletê wî re Hikûmet lê digere. Bêtir ji hemuyan hêzên ewlekariya siyasî yên ku nifûsa wî her dem li ba wan bû, debara wan ji ber wî nabe wî sirgûnî Libnanê dikan. Şevekê li wir dimîne û ji wir kemanekê bi xwe re tîne. Li Qamişlo dîsa li hêzên ewlekariyê rast tê.

Di 1973'yan de careke din li Iraqê di radyoya kurdî de stranên dibêje (Deh û Yek Adar Cejna Azadî, Azadî Şêrîn e, Ez Bûm Pîrê Xemcivîn, Min Bihîstî Tu Nexweş e, Dilgirtiyên Awirên Çavên Wî.) Li wir vê carê Tehsîn Taha, Gulbihar, Şemal Saib, Bişar Zaxoyî, Mimemed Arif Cizrawî û Îsa Berwarî nas dike. Strana T. Taha ya bi navê "Aso û Destaro" dibêje, T. Taha wî maç dike û jê re dibêje; 'te ji min xweştir got.' Di vê salê de strana Yadê Rebenê, Ez Keçika Kurdî Me, Kê Dinya Hejand dertîne û diçe Başûrê Kurdistanê, sê mehan dimîne û diçe serdana Berzaniyê nemir bi wî re rûdinê û ew 500 dinar û ala rengîn diyarî wî dike.

Di 1974'an de careke din vedigere Qamişlo. Lê hêzên ewlekariyê dest ji wî bernadin û her roj wî digirin û lê didin. Dibêjin ku carekê derengiya şevê bû diçe gundê Xecokê, diya wî

jê dipirse; 'tu li ku bûyî ta niha' wî gotibû; 'ez di nav daran de bûm.' Ji lêdan û lêxistina pir nikaribû xwe bide ser lingên xwe, bi dîwaran ve dimeşîya û nikaribû goreyên xwe ji lingên xwe bike ji ber ku gore bi lingên wî ve zeliqîbûn. Carekê nijadekî nû yê hêzên ewlekariyê tê Qamişlo. Lê dizivire û jê dipirse "Tu yî M. Şêxo...?" Ew dibêje "Na ez Mihemed Salih Ehmed im." Yanî navê xwe yê ku di nifûsa wî de hatibû nivîsandin dibêje. Ew kes dev jê berdide û ew jî xwe dide alî û xwe vedişêre.





Ji ber ku debara wî ji ber destên hêzên ewlekariyan nemabû, di 1975'an de diçe Iraqê û bi awayekî germ tê pêşewazîkirin. Salekê li wir dimîne. Piştî şikestina 1975'an bi pêşmergeyan re û bi navekî Iraqî rê digire Îranê. Li Îranê ev stran derxistine; Ji Mihabad, Di Zindanê, Xem û Xeyalên, Ey Felek, Bêzar im. Lê li wir îcar raserî safakan tê û ew îcar dest ji wî bernadin û gelek caran wî dikişînin ba xwe. Jê dixwazin ku navê Kurdistanê bi Gulistan biguherîne. M. Şêxo ji wan re dibêje "Ez ji bo vê gotinê li vir im." Hember ku ew ê jî tirimbêlekê û xaniyekî û mûçiyekî hêja bidine wî. Careke din wî dibin ba xwe bi sedema ku wî di strana Ey Felek de gotiye "Em bê dost û bê kes in" jê re dibêjin "ma va ye em we xwedî nakin, çawa tu wisa dibêjî?" M. Şêxo ji wan re dibêje "Heger dost û kesên me hebûna, we yê çima em xwedî bikirina. Û ji ya xwe nayê xwar û dersên erebî dide. Ji ber ku gotibû zimanê erebî bi min re ye û dersên muzîkê jî bi hunerî dide, di navbêna sê bajaran de diçe û tê dawî li Gunbed bi cih dibe.

Piştî ku hêviya wî bi vegeerê namîne di 1977'an de dizewice. Ya ku pê re dizewice jî, Şagirta wî ye. Navê wê Nesrîn Husên Melek e. Bavê wê ji siwarên Qadî Mihemed bûye, dema ku dixwaze bizewice; 25 kaxezan pêve pere pê re tune bûye û tenê odeyek û hesîreke wî hebûye.

Çar zarok li wir jê re çêdibin, Bêkes dimire.

Felek, Birahîm û Birûsk. Di 1979'an de strana xwe ya bi navê "Ji Mehabad, Ji Kaniya Xwîna Şehîdan" derdixe û di 1981'an de "Gava Ez Mirim" derdixe û di radyoya kurdî de jî gelek caran stranan dibêje. Dibêjin carekê mirovekî "s.s" raporekê pê dinivîse ku wî beşdarî bi tirkmenan re di xwepêşandanan de kiriye û wêneyê wî li ser wêneyekî din di wê xwepêşandanê de siwar kiribû ji bo jê bê bawerkirin û ji bo wisa fermana bidarvekirina wî hate dan, lê yê dadvan dostê wî bû û ew baş nas dikir ku ne ji wan kesan e, biryar têkda û ew bexşîn kir. Gelek caran kirina kuştina wî bûye. Carekê hema ku derbas dibe cîgehê "Partiya Yezdan" li wî û cîgeh wek baranê gule tê barandin, piştî şer bûbû tîqetîqa wî, yekî jê re gotibû; 'Xwe tazî bike ileh tu birîndar bûyî'.

Di 29.12.1982'yan de li balafirxaneyê Şamê peya dibe û ji hêzên ewlekariya Sûriyê re dibêje; "Ez hîn yê berê me, yan jî ez ê vegeerim" piştî sê rojan, di 03.01.1982'yan de digihîje bajarê Qamişloyê. Li wir dest bi dana dersên muzîkê dike û ciwanên kurd fêrî muzîk û sazê dike, ji bo vê yekê komekê didamezirîne.

Mihemed Şêxo piştî ku di 04.03.1989'an de nexweş dikeve; di 09.03.1989'an de diçe ser dîlovaniya Xwedê. Di veşartina wî de bi deh hezaran mirov li dû darbista wî meşîyan. Hin dibêjin ji ber ku textorên kurd guh nedane wî ew miriye û hikûmetê jî nehiştiye ku wî baş derman bikin. Li goristana Hilêliyê tê veşartin û ji wê rojê de Qamişlo wek dilberekê çavên xwe li hevalê xwe yê bejinbilind digerrîne û her şev bi hêviyeke nû serê xwe datîne. Belê Qamişloka Bavê Felek, Qamişloka Mihemed Şêxo te çi kiribû evîndarê te wisa bi lez ji nav te bar dîkin, ma ne hîn ciwan bû, hîn jî dikaribû ji te hez bike, min jî dikaribû wî bi germayî hemêz bikim û wî bi tiliyan nîşan bidim.

Kurdistan dibêje M. Şêxo! Ez hîn ji te hez dikim...ji ber ku te ji min hez kir, te jiyana xwe li ser min da, ji deng û muzîka te diyar e...ji te hez dikim. (10 Nîsan 2007)

Mamosteyê Ola Îslamê û hunermendê gelê xwe: Mihemed Şêxo

Îkram Balekanî

16 sal hesreta zanînê, 20 sal lêgerîn û koçberî, 41 sal êş, jan, hesreta welat û temenekî tijî kar û xebat ji bo bicihanîna hêviyên nîvcomayî: *Mihemed Şêxo*

Bêguman mirov nikare bi gotinan êş, jan, hesret, kul, derd, hêvî, daxwazî û evîna Mihemed Şêxo bîne ziman. Wî bi vîn û îradeyeke xurt, hem bi jiyana xwe ya malbatî û hem bi kar û xebata xwe, karî ku di nava mêjiyê xwe de sînoren di navbera Kurdistanê de bişikêne. Wî careke din bi me da selimandin ku vîna azad sînoran nas nake.

Di sala 1948'an de careke din gundiyên Gîrbavê mizgîniyê didin hev. Fatma û Şêxmûs dergûşê amade dîkin. Êdî kurê wan pê davêje qada jiyânê. Ji bo ku lawekî salih û emîn be navê wî datînin Salih. Lê ji bo ku malbat oldar bûye, pêşnavê Mihemed jî pêve dîkin û navê wî datînin Mihemed Salih.

12 zarokên Şêxmûs û Fatmayê hebûne. Ew şeş xwişk û şeş bira. Lê ji ber destengî û feqîriyê piraniya zarokên wan ji xwendinê bêpar mane. Bêguman Mihemed Salih jî para xwe ji wê destengiyê girtiye. Li gorî hin îdiayan tê gotin ku Mihemed Salih di temenê 16 salî de biryara xwendinê daye û lewre ji gundê Gîrbavê, çûye gundê Xecokê yê ser bi Qamişloyê û li wir di nava sê salan de Quran xitim kiriye. Ew di xwendina olê de jî gelekî jîr û zana bûye. Ji ber ku li gundê Xecokê xwendiyê hin kes bi şaşî cihê jidayîkbûna wî wekî Xecokê dizanin.

Lê vê yekê tîna dilê wî danexistiye û ew her di nava lêgerînê de bûye. Lêgerîna tişteki ku bikare bibe bersiva hestên wî. Tişteki ku bikare hesreta wî bîne ziman. Ew ji bo lêgerîna xwe dikeve nava hewildanan û dixwîne, lê mixabin di encamê de xwendina wî li pêşiya daxwazên wî dibe asteng.

Ji ber ku di nava malbatên oldar de û bi

taybetî di nava civakeke îslamî de alav û amûrên muzîkê wekî guneh hatine dîtin û ev yek ji aliyê hin kesan ve hatiye îstismarkirin û ji bo ku çanda kurdan bi pêş nekeve û bê tunekirin, ev yek zêde derxistine pêş û bi têgehên heram û guneh di nava gel de belav kirine.

Lê Mihemed Salih terka lêgerîna xwe nake. Ji bo ku ji xwe re tembûrekê bibîne û hînî lêdana tembûrê bibe gund bi gund digere. Ew ji bo hînbûna tembûrê tu astengiyan nas nake. Di sala 1969'an de ji bo hînbûna tembûrê gelek caran diçe ba Xelîlê Êzîdî û xwe hînî jenîna tembûrê dike. Piştî ku cara yekem li gundê Nêfê di merasimekê de distrê, êdî dizane ku hinekî nêzikî daxwaza xwe bûye. Lewre vedigere gund û ji bo hînbûna tembûrê sala 1970'yî berê xwe dide Beyrûdê.

Piştî demekê bi Mehmûd Ezîz, Rifetê Darî, Seîd Yûsif û Remezan Necîm Omerî re dibin endamên koma Serkeftin. Di sala 1972'yan de Mihemed Salih dibe endamê Yekitiya Hunermendên Libnanê. Êdî Mihemed Salih wekî Mihemed Şêxo bi nav û deng dibe. Hêjayî gotinê ye ku nasnavê Şêxo jî hinekî cihê nîqaşê ye. Hin kes li ser vê baweriyê ne ku ew kesekî dilnizim, diloan û oldar bûye, lewre jê re gotine Şêxo û hin kes dibêjin, ji ber ku navê bavê wî Şêxmûs bûye, lewre jê re gotine Mihemedê Şêxo û paşê wekî Mihemed Şêxo navdar bûye. Ev îhtimal hinekî bi hêz e. Ji ber ku piranî zarok bi navê bav an dayika xwe tene nasîn û dîsa birayê wî jî wekî Kenan Şêxo dihate nasîn.

Li Îranê mamostetiya ola Îslamê

Mihemed Şêxo careke din vedigere welat û derbasî başûrê Kurdistanê dibe. Ji wir jî vedigere rojavayê Kurdistanê. Êdî ger û lêgerîna wî bê navber didome û paşê derbasî rojhilatê Kurdistanê dibe. Lê mixabin baş nayê zanîn ka di kîjan demê de derbasî Rojhilat bûye. Jixwe piraniya hezkiriyên Mihemed Şêxo çûna wî ya bo başûrê Kurdistanê û Iraqê di-

zanin. Dîsa çawa bi hesret li bajarê Kerkûkê geriyaye û çawa derbasî radiyoya Bexdayê beşa kurdî bûye. Lê beşa ku baş nayê zanîn jî çûna wî ya bo Îranê ye.

Mihemed Şêxo piştî demekê ku li Rojhilat dimîne, paşê derbasî Îranê dibe. Ew demekê diçe bakurê Îranê. Li wir dest bi perwerdekirina zakoran dike. Li Eyaleta Mazenderana Îranê li bajarê Gunbedê Kawis dibe mamosteyê ola Îslamê.

Êdî li wir jiyana wî rengîntir dibe. Ji ber ku ew di dema perwerdehiyê de dibe evîndarê şagirta xwe ya bi navê Nesrîn Melekî.

Piştî ku Komara Kurdistanê ya Mehabadê di sala 1946'an de hildiweşe, bavê Nesrînê jî tê sirgûnkirin û wî bi malbatê re dişînin bakurê Îranê. Nesrîn jî li wir mezin dibe û dest bi xwendinê dike. Di dibistana navîn di pola 9'an û di beşa ola Îslamê de dibe şagirta Mihemed Şêxo. Bi vî awayî hezkirinek di navbera wan de çêdibe û di sala 1977'an de Mihemed Şêxo û Nesrîn Melekî bi hev re dizewicin. Ji wan sê zarokên bi navê Felek, Brahm û Birûsk çêdibin.

Mihemed Şêxo di nava temenê xwe yê 41 salî de wekî ku zanibe wê zû ji nava me bar bike, bi hemû hêza xwe xebitiye û hewl daye tiştên baş biafirîne. Ev yek di lêgerîna wî ya li hemû parçeyên Kurdistanê de, di nava gotin û awazên wî yê dilweşat û şoreşgerî de û di nava jiyana wî ya bi êş û jan de xwe dide der.

Mihemed Şêxo dîsa derbasî Başûr dibe. Gera wî didome û di encamê de sala 1983'yan careke din vedigere bajarê Qamişloyê. Di nava 20 salên tijî ked, westan, êş û jan de, Mihemed Şêxo bi hemû hêza xwe dixebite 14 berhemên hunerî dike diyarî gel û netewaya xwe.

Mihemed Şêxo di hîlbijartina helbestên xwe de jî gelekî jîr û hosta bûye. Bêguman hemû tekst û gotinên stranên wî ne yên wî bi xwe ne. Heta di vî warî de gelek şaşî jî derdikevin û hinek tevlihevî jî hene. Wekî strana

Gelî Zindiyan an jî strana Nesrîn.

Wekî tê zanîn bi şaşî tê gotin ku strana 'Gelî Zindiyan' wesiyeta Mihemed Şêxo ye. Kovara Ture û Huner jî wisa îdia dike. Lê ya rastî ne wisa ye. Ji ber ku gotinên stranê yên helbestvan Mistefa Ertûşî ne. Dîsa gotinên strana Nesrîn ên helbestvan Xelef Zebârî ne. Lê divê bê gotin ku ev her du helbestvan jî dostên malbatî û kesên nêzîkî Mihemed Şêxo bûne û ev helbest li ser daxwaza wî nivîsîne.

Mixabin piştî ku Mihemed Şêxo ji nava me bar kir, hin nîqaş jî li ser gotinên helbestên wî derketin. Bo nimûne strana Heps û Zindan ku li gorî Nesrîna xanima wî, tekst û gotin ên Mihemed Şêxo bi xwe ne. Lê helbestvan Yûsif Berazî îdia dike ku helbest a wî ye.

Çi dibe bila bibe, gava Mihemed Şêxo gotinên helbesta Gelî Zindiyan bi awazeke dilşewatî dilorîne û dibêje:

"... Gava ez mirim, gelî zindiyan
Min nevesêrin wekî hemîyan
Gorek min çêkin li bin siya çîyan
Kêlên min çêkin ji du keziyan
Hemû adaran hûn min şiyar kin
Da bikim şînê ji bo me hemûyan..."

Wekî ku zanibe wê di adarê de ji nava me bar bike, ev helbest hîlbijartiye. Bi dilekî şewat û bi dengê hestiyar bi awaza xwe ji me re hiştiye da ku em bikin guhar bixin guhên xwe. Da ku em hunermendên xwe ji bîr nekin. Belê Mihemed Şêxo roja 9'ê adara sala 1989'an de li rojavayê Kurdistanê li bajarê Qamişlo ji nava me bar kir lê bi awaz, hest, bîr û ramana xwe hê jî di nava me de ye û dijî...

Ger mirov bixwaze di nava hevokê de Mihemed Şêxo bi lêv bike, dibe ku ev hevok layîqî wî be; "Mihemed Şêxo bi temenekî kêmdestaneke mezin afirand."

Çavkanî:

Kovara Ture û Huner- Adar 2006

Kovara internetî ya welatê Me Adar- 2006

Radiyoya Dengê Amerika Beşa Kurdî weşana 9 adar 2008

balekani@hotmail.com

Kurtejiyana Mihemed Şêxo

Sedran C.NEWADAR

Hostayê mezin Mihemed Şêxo, di sala 1948'an de li gundê Xecokê ji dayik dibe. Navê wî yê rastîn Mihemed Salih e. Navê bavê wî Şêxmûs û yê diya wî Fatma ye. Dema hê di du saliya xwe de ye diya wî xewnekê dibîne û diçe ba Şêx Reşîd. Şêx Reşîd lê vedigerîne ku kurek ji kurên wê dê pir bi nav û deng be.

Di sala 1955'an de li Xecokê dest bi xwendinê dike. Ji wê çaxê ve rehên muzîkê hêdî hêdî xwe bi cih dikan. Ji wê hingê ve dest bi guhdariya radyoyên kurdî yên wek Bexda û Erîwanê dike. Hê di wî temenê xwe de Qurana pîroz pir xweş dixwîne. Di xwendina dibistanê de jî pir jîr û zana bûye. Ji ber hin zordariyan di nehsaliya xwe de dev ji xwendina xwe ya wê derê berdide. Di sala 1965'an de diçe Qamişloke ba apên xwe yên Bercesî û Ehmedî. Demekê li ba wan dimîne. Li vê derê jî bêbext nasekinin û ew bi "araqvexwîrî" yê tewanbar dikan. Salek şûnde 1966'an de nexweş dikeve û çavên wî êdî pir kêr dibînin. Ji vê rojê û pê de êdî berçavkê bi kar tîne. Piştî salekê ji ber aloziya siyasî, ji Qamişloke vedigere gundê xwe. Li vir bi malbata xwe re dest bi çandiniya pempû dike. Ji bo leşkeriyê bang lê tê kirin lê, ji ber kêmdîtina çavên wî ji leşkeriyê azad tê hiştin.

Hostayê mezin bejinzirav bû, ji du metroyan dirêjtir bû. Ji ser û berê xwe hez dikir. Cilên wî her tim paqij û dirust bû. Ji muzîka rojhilatî gelekî hez dikir. Ahengbêjê wî yê xweştirî Muhemed Ebdul Wehab bû. Ew xwedî nasnameya hunerî ya pile û radeya yekem bû. Ev nasname ji Libnanê wergirtibû. Ahengbêjê Libnanî yê mezin Wedî As-Safî ji dengê wî pir hez dikir û her tim ew diparast.

Mihemed Şêxo yê dengşîrîn, mirovekî sitembar bû. Dilê wî tim xemgîn û awaza wî tim kul û keser dagirtî bû. Jîr û zana bû.

Deng û tembûra wî xweş li hev dikelijîn û mirov mest dikir. Lê wek hemû stranbêjên kurd ên li her parçeyên welêt, dostên wî yên hunermend jî hema bêje qet tune bûn.

Mihemed Şêxo ji malbatekê gundî bû. Ew ji çîna cotyar û karkerên hejar bû. Li gorî wî mirovên dewlemend tim berjewendiyên xwe diparastin û ji wan tu xêr nedihat. Ji bo wan maf û têkoşîna neteweyî tune bû. Ji lew re, wî bê tirs kesayetîya xwe ji kar û kirinên wan diparast û dibizivî ku tu xisar û ziyane negihînin yekîtîya kurdan...

Huner û bîranînên wî

(1968-1989)

Hunermendê mezin Mihemed Şêxo 1968'an de dest bi strandinê kir. Xwe fêrî jenîna tembûrê kir û wek ên din dest bi folklorê kurdî kir. Wî piştî tembûrê ji xwe re peyde kir û ji bo hîn bibe diçû ba tembûrvanên navdar ên wek Xelîlê Êzdî, Hesên Tewfo û hwd. Di wê demê de li ser kesên serek, navdar û têkoşer strîn wek kevneşopiyekê bû. Di navbera hunermend û Partiya Komunîst a Suriyeyê de hevbendiyek kurt çêbû. Lewma ew li ser Xalid Begdaşî nestirî. Ji ber vê çendê komunîst jê sar bûn.

Rojekê bavê wî û melayek hatin malê. Wî jî muzîk dijenî û bi lez tembûr veşart û paçek



avêt ser. Mela jî ji hemû deran çû pişta xwe da tembûrê û tembûr şikest.

Wî piştî demeke kurt dest bi stranên nuh kir. Ev stran bi giştî stranên mîrê tembûrê Seîd Yûsîfî û hunermend Mehmûd Ezîz Şakirî bûn. Ji ber ku ev her du hunermend wê demê li rojhilata navîn pir bi nav û deng bûn û xwediyê ast û morkeke taybet bûn.

Hunermend M. Şêxo di 1969'an de çû Libnanê û li wir xebatên xwe yên muzîkê domand. Li vê derê li navendeke muzîkê du salan xwend û xwe baş bi pêş xist. Ew li wan deran jî bo vejandina stranên kurdî û ji bo piştewaniya 11'ê îlonê bi hêz û erka xwe xebat kir.

Di sala 11. 03. 1970'yî de gelê kurd li Başûr bû xwedî otonomiyekê. Ev pêşketin gelek tesîrên mezin kirin û roj bi roj hunermend û stranbêjên nuh derketin. Komîteya hunerî ya kurdên Libnanê, ji bo piştdayîna otonomiyê gelek ahengên baş û rêk û pêk berhev kirin. Navê van hunermendan ev bûn: Seîd Yûsîf, Mehmûd Ezîz Şakir, Mihemed Şêxo, Mihemed Teyîb Tahir, Rifetê Darî, Îzedîn Temo, Remezan Necîm, Şîrîn û hwd... Bi kurtî wê komîteya ku Mihemed Şêxo jî tê de ye ji bo muzîk û ahenga kurdî gelek xebatên giranbûha kirin. Hunermendê mezin heta dawîya sala 1971'an li Libnanê xebatên bi vî rengî domand. Ji ber ku karê xwe yê hunerî bi rêk û pêk, bi zanatî bi kar tîne, 1972'yan de nasnameyeke hunerî ya pileya yekê wergirt. Paşê ji tirsî ku şuştina xwe neçar ma ku vegere Qamişloke û ew gefên kujer, qesas û berjewendîxwazan ji xwe dûr xist.

Hunermendê mezin di bîranîneke xwe de wiha dibêje:

"Ez û çend hevalên xwe yên kurd û aşûrî di 1972'yan de ji bo pêşkêşkirina karekî hunerî çûn Bexdayê. Dema ku karê min hew bû (qediya), min pirsî hunermendê dirêj B. Zaxoyî kir, lê her bê şop bû. Ji bêgaviyê çûm Radiyoya Bexdayê Pişka Kurdî, min li wê derê hunermenda heja Gulbihar û kek Segvan Ebdulhekîm dît. Gulbihar bi mêvanan re dipeyivî û sera peyvên xemcivîn û xemrevîn

rexna li wan dibarandin. Paşê min zanî ku wê mercek hebû ku eger peyvek yan derbirînek şêlû di helbestekê de hebe, divê biguherîne. Piştî ku Gulbiharxanê zora me bir, min pirsî kek B. Zaxoyî jê kir:

- Kek Beşar Zaxoyî niha li Dêra Suryaniyan provaya xwe dike.

Pişt re kemanjenekî çavzêr got:

Ew dê li ahenga suryaniyan çend stranên kurdî pêşkêş bike; wek "Ay Felek", "Narînê Hey Narîn" û Kek Beşarê dengxweş dê "Ay Felek" ji suryaniyan re bistrê...

Bi kurtî min axaftina wî kemanvanî birî, supasiya wan kir û çûm Dêra Suryaniyan û min kek Beşar dît. Wî li wê derê bi koma suryaniyan re prove dikir: Bira, Komeleya Suryaniyan dê mîhrecaneke mezin li Bexdayê û bi berpîrsiya keşe Fîlîpî berhev dike. Keşe Fîlîp, bi xwe okordiyonvan e û solfêjê dide şagirtan... Ez dê sirûda "Ey Felek", helbesta kek Bedirxan Sindî ye, ji wan re bistrêm...

Ay felek bo te dînal im, bo çi nêrgiz çilmisîn

Ew çima bextê me ho ye, em bê dost û bê kes in

B. Sindî

Min jê pirsî: "Çawan rejîma Iraqî dihêle ku tu vê marşê bistrêyî?"

Wî li min vegeand: "Min gote berpîrsê Radiyoya Bexdayê Pişka kurdî, ku ev stran li ser Filistinê hat nivîsîn. Ji lewre mafê min heye ku vê sirûdê bistrêm..."

Me qala strana "Ez Keç im Keça Gundan im" kir û kek Beşarî jî min pirsî: "Erê dîtina te li ser vê stranê çi ye?"

Min şîrove kir: "Stranên ku te bi Gulbiharê re pêşkêş kirin, hemû xweş in û cihê xwe girtin. Lê 'Ez Keç im Keça Gundan im' pir balkêş bû; helbesta wê nerm, xweş û sanahî ye, awaza wê têkûz û coş e, li ser hindê re cilên we yên folklorî jî balkêş bûn. Bawer bike kurdên Soran, Hewraman, Germiyan, Loristan û Şehrezûrê jî ji vê stranê hez dikin..."

Mihemed Şêxo bi xwe jî pir ji vê stranê hez dikir û şewitîyê wê bû..

Gulbihar:

*Ez Keç im Keça Gundan im
Kulîlka serê lawan im
Rehana rez û çeman im
Lawiko ez bêrîwan im*

Beşar:
*Bêriyê tu xwînşîrîn î
Dilrek î û lêv hingivîn î
Bişkur be gava mi dibînî
Bêriyê ez evîndar im*

(B.Sindî)

Bîranîneke Î. Arslan li ser hunermend
M.Şêxo li Kerkûkê:

“Me bazarek mezin li taxa Tepey Mela
Ebdulayî hebû. Pertal û tişt û miştên erzan lê
hebûn. Rojekê bêhna kek Şêxoyî teng bû. Êdî
em derkevin derve da ku li wê piyaseyekê
bikin û tiştêkî ji xwe re bikin. Em geriyan, vir
ve, wê ve me temaşê dikir. Jê re kamîranî bû...
Min jê re qala kalyarên (xiyarên dirêjîya wan
mitrek in) kirin û wî got:

Pepûk û li vê ecebê! Beşîro ez dê ji derdê te
bimirim! Tu dixwazî min dîn bikî?! Xiyarên
yek mitirî! Kî dê ji min bawer bike, eger ez jê
re bibêjim?!...

Me ezberî ji dukanekê kirî, gava ku
xwediyê wê dizanî ku kek Şêxo ji Suriyeyê ye,
êdî buha ji me newergirt û got:

Pare, werî nagirim, nabe! Em biraderê
mîwan e!

Bi kurtî, dukandarî zanî ku kek Şêxo ji
Rojavayê Kurdistanê bû û tişt bê pare dane
me. Kek Şêxoyî wisa got:

Beşîro, her bikene û li ser xatirê min jî her
dem bi belaşî bixwe!

Paşê em veşerîyan malê da ku li
televîzyonê binêrin. Wî temaşê dikir, dipeyivî
û pirsî: Çi deverê heye yan tiştê min li
Kerkûkê nedîtîye?

Ev lê lê ye, hêj lo lo maye, ma te çi dîtîye?
Li Kerkûkê se jî difirin!

Derewên biçûktir bike, da ku ez ji te bawer
bikim. Erê kûçikên Kerkûkê wek te mast û
nan dixwin? De ka ji min re stranîne xweş yê
devera Germiyan lêbide!

Min strana “Amoza Giyan” jê re jenî û
nivîsî. Dû re du stranên kek B. Zaxoyî; “Ez
Keç im Keça Gundan im” û “Ey Felek”, wisa
strana “Aso” ya T. Tahayî jê re nivîsîn...

*“Her erom erom, dil im elerzê, amoza giyan
Lêm be cê mawê, min gerdin berzê, amoza giyan
Amoza to balaberz î, amoza to bo min ferz î”*

(Folklorî Germiyan)

Min jê pirsî:

Dîtina te li ser heyranokê çi ye?

Çi derdekî bê derman î

Ey hawar min nedizanî

Wey te çi bi serê min anî

*Kurko dîno, kurko dîno, kurko dîno, kurko dîno,
kurko dîno, wey...*

(Folklorî Botan)

Mihemed Şêxo, helbesta X. Zebarî ya bi
navê “Kewê Xortê Serê Çiya Bûm”, li ser
awaza heyranoka jorîn “Kurko dîno” li Îranê
got.

Li ser hunermendê dengxweş Mihemed
Şêxo mirov dikare bi dehan bîranîn û
meseleyan bibêje û binivîse. Wî bi dengê xwe
yê nerm û dawidî li têla dilê mirovan dixist û
ew diponijandin û dida ber kul û keseran. Wî
di muzîka xwe de terzeke cuda afirandibû û
ev şewaz di hemû stranên wî de xwe dide der.
Stran bi giştî nerm in, rîtmîzm in, hêsan in û
sehaya wan fireh in. Ew carinan bi qîrîn dest
bi stranê dike û hêdî hêdî ber bi nermbûn û
dawîbûnê ve diherike. Mirov jî pê re sakul
dibe, rihet dibe, sekan dibe. Carinan jî bi
dengê xwe yê barîtonî dest pê dike, guhê
mirov berekaşî wî dengî dike û dielimîne. Û
dawayê dîsa hêdî hêdî bê xebera mirov ew
deng digihîje newaya herî bilind. Pê re jî
hestên mirov hildikişîne lûtkeyan û mirov
dihuzinîne. Newa, dîsa piştî hîlbûna hestan bi
awayekî gelekî nerm ber bi dawiyê ve diçe. Tu
dibêjî qey roj hêdî hêdî ber bi çiyên ve
diqulibe û diçe ava. Pê re jî êvar, çûk, lawir,
xweza, çiya her der dest bi sakiniyekê dike.
Stranên hunermendê nemir wisa bandorekê li
ser mirov datanîn...

Mihemed Şêxo û hilbijartina gotinan

Konê Reş

Kêfxweş dibim, ku ez jî dewla xwe di bîra hunermendiya Mihemed Şêxo de dakim û dilê evîndarên deng, awaz û gotinên wî, bi çend gotinan şad û xweş bikim.

Mihemed Şêxo; ew jî mirovekî wek me tevan bû. Lê di warê deng û muzîkê de, mirovekî ji me cuda bû; Mirovekî bi bûyerên gelê xwe ve girêdayî bû, qet haya wî ji malê dinyê tune bû. Wî temenê xwe tev di ber bîr û baweriyên xwe de xerc kir, bê ku haya wî ji dîrokê jî hebe, an li cihekî ji navê xwe re di nav rûpelên dîrokê de bigere..

Wek guhdarekî stranên wî, ez jî, yek ji dost û evîndarên guhdariya stranên wî me. Ew stranên ku li ser zilana sê bingehan dizivire; deng, awaz û gotin. Mihemed Şêxo bi

zanebûn, ev her sê bingeh bi muzîkê, li gor gewriya xwe û bi gotinan, li gor êş û janên gelê kurd ji xwe dibijartin, bi hev re dihûnan û di nav gel de belav dikir. Guhdarên wî jî, bi sehkirina stranên wî re, di nav pêlên jiyanekê tijî kul, xem, kêf û şahî de dûr dûr diçin û rihet dibin... Ji ber ku stranên wî akam û bandoreka mezin di his, hest û derûna mirovê kurd de dihêle, wî ji qurm ve dihejîne û bi rex du tiştan ve dehf dide; welat û evîn..

Mezinbûna navê Mihemed Şêxo ji vê yekê tê; ku dikare du celebên guhdaran peyda bike, yek jê; ew ên bi kul û jan in, a din ew ên bi kêf û şahî ne. Ango Mihemed Şêxo di stranên xwe de şîn û şadiyê bi hev re kom dike.. Dikare bihêle ku

mirovên şîn-şad li yek stranê guhdarî bikin. Di bawerîya min de ev yek jî vedigere ser bijartina gotinên stranên wî. Wî bi zanebûn gotinên stranên xwe dibijartin û razî nedibû ku her helbestê bistrê. Li gor ku ez yek ji kesên nêzîkî wî bûm, gelek helbest jê re dihatin ku bike stran, lê ew razî nedibû... Helbestên ku dibijartin, bi piranî li dor zilana welat, bûyerên welat û evînê digeriyan. Ta ku wî evîn jî, bi welat ve girêdida, anga li tenbûra kul û êşên welatiya dida, xwe ji welatiyên xwe dûr nedikir, bi reşahiya welatiyan re bû û bi wan re dijiya. Wiha wî helbestên stranên xwe bi zanebûn bijartin û helbestên van helbestvanan gotin, ew ên ku welat ji wan re, evîn bû, hebûn bû û

bi bûyerên welatê xwe ve girêdayî bûn û bi wan bûyeran re dihejiyan û dixiliyan.

De ka werin em ê mêze bikin bê Mihemed Şêxo helbestên kê kiriye stran:

Her wiha Mihemed Şêxo di dor 20 salan de, li dora 114 stran striye, ew stran di gelek kasêtên têvel de belav bûne..

Hem jî, wî stranek bi erebî gotiye bi navê (Zûro Libnan), anga herin Libnanê...

Belê gelek stranên wî yên din jî hene, ez tenegehîştîm bê ji gotinên kê ne. Lê ji stranên wî yên navdar wek ku li jor min nişan kiriye ji gotinên wan camêran in.

(Qamişlo)

<i>Cegerxwîn (1903-1984)</i>	Bilind e Bejn û Bala Te, Di Baxan De, Pêjna Te Nayê, Nalînek Tê Guhê Min, Agirê Derdê Te Îro, Bexçê Gula, Ey Felek Ka Ew Sera, Birc û Qunaxed Di Min, Dil Kuştiyê Awirên Çavê Te Me, Şêrîne Nû Gihayê.
<i>Tîrêj (1923 – 2002)</i>	Feryad û Sed Ax û Eman, Erê Şoxê, Dîsa Li Min Awir Kişand, Em Hemî Pêşmergan e, Wa Keça Tora Banî
<i>Yûsif Berazî (Bêbihar), li Serê Kaniyê ya Sûriyeyê dimîne</i>	Heps û Zindan, Di Xwe De, Rabe Ji Xewê, Çi Bikim bi can, Koçê me Bar Kir, Di Zindanê Dinalim Ez, Ez Bûm Ferar, Welat, Derdan Çi Ez Diljar Kirim, Şêrîn Tu Cîrana Min î, Rabe Pismam, Eman Ez Bûm Warê Xeman, Şeva Tarî, Ez Ji Bi Cî Bim, Yarê Şeh Kir Porê Siyah, Perwîn Keça Nûgihîştî
<i>Mele Ehmed Namî (1906 – 1975)</i>	Pêşkevin Em Serfiraz in Miletê Kurdî
<i>Omerê Lelê: Sax e, niha li Xaxoyê jiyana xwe derbas dike</i>	Xem û Xeyalê Te Ez Revandim, Ay Lê Gulê Gula Min î, Qedera Min Çendî Ciwan e, Yarek Min Heye Bi Navê Jin, Peymana Min Şêrîn Yar e
<i>Sebrî Botanî (1925 – 1998)</i>	Tu Wî Bihuştê Rengîn, Pîrê Xemcivîn, Mixabin Bi Navê Jin, Vê Yarkujê Tîrek Weşand
<i>Xelefê Zebârî: Niha di Radyoya Dengê Emerîka de li Washingtonê kar dike</i>	Dema Min Tu Dîtî Nesrîn, Kewê Xortê Serê Çiya Me
<i>Dr. Bedirxan Sindî: Li başûrê Kurdistanê dimîne</i>	Ey Felek Bo Te Dinalim, Şermîn e Dil
<i>Ehmedê Şêx Salih: li Eyndîwerê ye, rex Cizîra Botan</i>	Çûm Nav Baxê Evînê, Azad e, Ciwan e, Cana Min!, Xortên Me Lê Ne Bêjimar
<i>Kemal Şanbaz: Di sala 1975'an de li Beyrûdê hat kuştin</i>	Gewrê, Min Bihîstî Tu Nexweş e, Yadê Rebenê
<i>Mustefa Atrûşî: Ji kurdên Başûr e</i>	Min Canê Dît, Sê Zerî Hatîn Ber Derî
<i>Dr. Feydelah Xîznewî: Niha li Parîsê dijî.</i>	Bilbilo, Xalxaloka Çema
<i>Ferhad Îçmo: Niha li Qamişloyê dijî</i>	Destê Min Bigire
<i>Mihemed Elî Şakîr: Niha li Serêkaniyê dijî</i>	Eman Dilo
<i>Adil Seyfedîn</i>	Azad e Şêrîn
<i>Beşîr Çaçan (Şêrûn): Niha li Mîrîtiyên Erebi yên Yekbûyî dijî</i>	Tu Ji Min Dûr Ket Şêrîn Yarê

Dema bilbil bo gulê dixwîne

Bavê Felek tê bîra mirov

Tayîp TEMEL

Mihemed Şêxo yek ji dehayên muzîka kurdî ye û heta niha tu kurdan tiştekî berevajî vê rastiye negotîye û heke gotîbe jî me nebihîstîye. Navê rastîn ê Mihemed Şêxoyê ku wekî Bavê Felek jî tê nasîn; Mihemed Salihê Şêxmûsê Ehmed e. Di sala 1948'an de li gundikê Xecokê yê bi ser Qamişloyê ve hatiye dinê. Hîn biçûk bû xwest ku tembûrê hîn bibe. Lê ew rastî astengiya bavê xwe hat. Lê piştî demekê wî xwe gihand hunermendên navdar Hisenê Tofîq û Xelîlê Derazî. Her ku çû stranên wî hêdî hêdî derbasî hemû parçeyên Kurdistanê bûn. Bi taybetî jî piştî derbasî Beyrûdê bû wî dest bi muzîka profesyonel kir. Dîsa di sala 1970'yî de çûna wî ya başûrê Kurdistanê bû wesîle ku ew gelek hunermendên kurd ên navdar nas bike û bi wan re stnanên xwe bistrê.

Herî baş rastiya Mihemed Şêxo dikare vê gotina gerîlayekî kurd ê li serê çiyayên berz û bilind vebêje: "Dema bilbil li ser zinar û darên welatê me jî bo gulan dixwîne bêguman Bavê Felek tîne bîra her kurdekî /ê ku dengê wî guhdar kiriye."

Mîratêya wî hunermendiya wî ye

Kêm hunermendan wekî wî karê xwe bi awayekî pîralî kiriye. Li gorî hunermendên zana; taybetiya Mihemed Şêxo a herî girîng ew e ku bi serkeftî awaz û çêkirina helbestê weke erka hunermediyê daniye ber xwe û ew pejirandiye. Bêyî vê nasnameyê tu aliyên wî yên cuda ku di nava civakê de nav û dengê xwe pê bide belavkirin nîn e. Lewre jî ev taybetmendiyeke hêjayî pesindayîne ye. Ji ber ku hunermendekî/e rastîn encax bi hunera xwe nav û dengê xwe belav bike û xwe nemir bike.

Lê em dibînin ku di vê sedsala em tê de ne de, piraniya hunermendan ji bilî hunermendiya xwe bi taybetmendiyan cuda di nava civakê de dibin xwedî nasnameyê populer. Lê ji bilî stran û awazên wî yên melûl û xweş û tembûra wî ya dilkeser tu tiştekî din ê Bavê Felek nebû. Jixwe ma hunermendîtî jî ne ev e?

Mihemedê Şêxo dema dengê wî ji kurahiya dil tê, bawerî û hêvî ligel keder û dilkeseriya Kurdistanê di dilê mirovan de peyda dibe. Yên ku wî guhdarî dikin derdikevin geşt û seyraneke tije evîn û hezkirina li ser hemû axa Kurdistanê. Ango stra-

nên wî ji bo hemû kurdan gerdûnî ne û cih û dem di strana wî de tune ye.

Her wekî strana wî ya bi navê Nesrîn...

Strana wî ya bi navê 'Nesrîn' ku gotinên wê yên Xelef Zebarî ne gelek xweş e. Dema mirov li wê stranê guhdar dike du tiştên cuda tên hişê mirov. Ew stran dibe ku ji bo keçeke kurd hatibe nivîsîn. Lê, dema Mihemed Şêxo wê stranê dibêje; mirov dibê qey ji bo Nesrîna ku di dema li Rojhilat mamostetî dikir de, nas kir, evîndarê wê bû û piştî evîndariyeke mezin pê re zewiciye nivîsiye. Lê strana wî ya bi navê Nesrîn hema bêje li ser devê hemû kurdan belav bû. Ango strana wî li ser çî be bila bibe, xîtabî hest û dilê civaka kurd dike.

Mihemed Şêxo guhdarên xwe dibe wan cih û warên ku wî li ser stranên xwe çêkirine û hestên 'ev hozanê dilê min e û kul û keserên ku di kûrahiya dilê min de vedibêje' di dilê hemû guhdaran de diafirîne.

Dem û zemanê stranên wî tune ye

Taybetiyeke girîng a wî heye û ev taybetî bi tenê di hozan û hunermendên mezin ên cîhanê de heye. Mihemed Şêxo bi stran û şêwazê muzîka xwe kevn nabe. Wekî tê zanîn berhem û stranên ku tu dem û zemanan kevn nebin, bi hostahiyeke mezin hatine honandin. Ango ne stranbêj û hozanê dem û çaxekê ye. Tişta ku hunermendî nemir dike û her dide jiyîn jî ev taybetî bi xwe ye. Ji ber ku Beethoven, Nerûda û hozanên mezin ên cîhanê jî bi vê taybetmendiye ketine nava dilê hemû gelan.

Damara wî ya welatparêziyê ew qas berz û bilind e ku ew bêyî fikar û tirs bi rihetî dikare ji bo welatê xwe ku wekî gul bi nav kiriye, xwe bide kuştin. Her wiha ew 'gula xwe' nade bi hemû malê dinyayê.

Min bihîstî dil nexweş e...

Stranbêjê mezin ku ji ber keça wî ya bi navê Felek ew wekî Bavê Felek hatiye binavkirin, bi kesera xwe ya mezin di sala 1989'an de nexweş ket. Her wekî di strana xwe ya bi navê Gulê de jî digot 'Armanc û kesara wî azadiya gulê (Welat) bû' lê dil zû nexweş ket û ew di 9'ê adara 1989'an de çû ser dilovaniya xwe.

Xwezila Mihemed Şêxo stranek li ser xwe

Nefela çarpel

Rêwar EVÎNDAR

ava bikira! Ji ber ku ez bawer im tu kes nikare mîna wî jiyan û hestan bîne ziman... Ango kesek nizane mîna wî têgehane bi stranî biafirîne. Dê gelek bi arî xwe bianiya ziman... Ez jî bi hêsanî jî vî karî pak bibûma... Ez bi biska wî û bi berhemên wî sond dixwim gelek wêrekî pêwîst e jî bo behskirina wî...

Gelek balkêş e û ez gelek hestiyar im niha... Ji ber ku ez li wî difikirim lê belê bi rastî ez li xwe difikirim! Ez ê ku Mihemed Şêxo di nav xwe de şîn kiriye... Ew qas mirov nêzikê xwe kiriye... Gelo di jiyana we de tu dengê heye ku hûn, çiqas û çî wext û li çî derê bibihîsin hûn bi şanazî pêşwazî bikin? Belê jî bo min bê şik ev deng Mihemed Şêxo ye...

Ji dengê dayikê, ji dengê yarê, ji dengê şalûl û bilbilan, ji dengê bayê, ji rengê berfê bêtir bandorê li ser min çêdike. Ji ber ku me di stranên wî de jî yarê hez kir, bilbilan di dengê wî de baskên xwe li hev dan, av di dengê wî de herikîn, çiya bi zozanên wî bilind bûn, rê bi wî aramî bûn, gulê bêhnê xwe jî wî stend. Yanî dayînen wî bêdawî ne... Di eviniyê de, di şîniyê de her tim min xwe avêtiye bextê Mihemed Şêxo. Ma dest û deng hew qas bi aheng dibin? Tevî ku jiyana wî axreng bû jî... Dema biska wî deng dide mirov dibê qey damarên mirov di destê wî da ne û bûne tîlên tembûra wî...

Wi gelek hestên zîrek hestên bi êş wisa bi nermahî wisa bi sebir û bi zelalî aniye ziman ku ev jî dide nîşan ew ne tenê hunermend e. Di heman demê de mamosteyekî jiyanî ye... Ger ku jiyan stranek be navê wê bêguman Mihemed Şêxo ye... Temenê wî Newroza wî ye û berê wî Kurdistan e, gul û sosin in, çiya û zozan in, nesrîn û beybûn in, xem û xeyal in...

Ji bo me kurdan Ehmedê XANÎ di warê ne-

tewî de di warê wêjeyî û dîrokî de çî be, Mihemed Şêxo jî di warê hunera muzîka kurd de ew e! Û bi taybetî di warê çandî de payebilind e... Dîsa balkêş e ku hinek jî me Ehmedê XANÎ nas nakin lê belê vî dengê dildar nas dikin (bê şîrove!)

Çendî deng hatiye min û çendî ez gihîştîme wateya gotinan, ez bi dengê wî re me... jî ber vê qasê ez ê herim zaroktiya xwe û vî nîrxê jî-yantîrêj bi bîranîneke xwe bînim ziman. Dema ez piçûk bûm pîra min ya rehmetî behsa "ne-fela çarpel" dikir. Nefel giyayekî piçûk e. Di biharê de axa me ya pîroz şîn dike. Û nefel her tim sê pel in. Pîra me digot ku cihê nefela çarpel hebe di binê wê de xezîne heye. Wê bihar bihata û her bihar dema em diçûn gund em bi awayekî nêçîrvanî li nefela çarpel digeriyan... Ax eynî ax bû lê belê em her bihar dîsa li wan deran lê digeriyan. Carcaran bi eşqa dîtina nefela çarpel em jî mala xwe dûr jî diketin... Heta me digot ku pênc pelên wê hebin dibe an na!

Mihemed Şêxo bi xwe nefela çarpel bû! Lê hê jî xeletiyek heye! Alem dibê qey xezîne her tim binax in... Ji bo me kurdan xezîneya herî mezin çanda me ye. Lê mixabin... Û çand di gotinan de, gotin di stranan de stran di Mihemed Şêxo de veşartî ne... Werin em vê xezîneyê bibînin lê nefiroşin wê biparêzin lê xweyî derkevin!

Ew nefela çarpel bû! Bû dengê Bêbihar di biharê de... Koçbûna xwe di adarê de... Bû doktor di nexweşiya yarê de... Ew nefela çarpel bû!

Her peleke wî li parçeyekî Kurdistanê ye...

* *Ji kerema xwe re tu dikarî piçekî behsa xwe*

Birûsk Şêxo:

“Bavê min 41 salî bû ji derdê Kurdistanê mir”

Hevpeyvîn: Mustafa GAZÎ

bikî?

Birûsk Şêxo: Ez kurê Mihemed Şêxo me. Navê min Birûsk e. Ez li Îranê li Gumbetê Kawis (nêzikî behra Qezwînê ye) ji diya xwe bûme. Ez birayê herî biçûk im. Kekê min û heka min jî li Gumbetê Kawis hatin dinê. Kekê min Birahîm li Elmanyayê dijî, heka min Felek jî li Qamişloyê dijî. Ez bi karê muzîkê re mijûl im, aranjortiyê dikim. Min heta niha aranjortiya 60, 70 aluman kir. Min jî hunermendên wek Seîd Yûsif, Hunermend Şeyda re, Evîna Welat re kasê çêkir. Ez debara xwe bi vî karî dikim, lê bêtir xizmeta kurdî dikim. Ez karekî din nakim ji karê muzîkê pêve.

Min li Sûriyeyê mekteb xwend heta sinifa nehan (bavê min jî heta sinifa nehan li Sûriyeyê mekteb xwendibû) û dûre ez du salan mam û çûm bûm esker li wê derê.

Ez zewicandî me, xanima min jî kurdên Sûriyeyê ye. Keçek min heye, navê wê Felek e. Ez kîbordê bi kar tînim, li ûd û tembûrê dixim.

** Te eskerî kir lê bavê te eskerî nekir.*

Birûsk Şêxo: Bavê min jî ber nexweşiyê eskerî nekir. Çavên wî kêmditîn. Lê min sî heyv ango du sal û nîv eskerî kir.

** Tu bi nota zanî?*

Birûsk Şêxo: Min nota xwendiyê bes min temam nekiriye.

** Te di warê muzîkê de xwe da perwerdekirin? Te dersên muzîkê jî yekî girt?*

Birûsk Şêxo: Min jî Doktor Mihemed Ezîz Zaza ders girt. Ew li Sûriyeyê bû, min li ba wî xwend. Lê ew niha li Başûr e.

** Kekê te Birahîm çi dike?*

Birûsk Şêxo: Ew li Elmanyayê ye di warê muzîkê de dixwîne. Kekê min jî hêla muzîkê de gelekî jêhatî ye.

** Lê heka te Felek çi dike?*

Heka min Felek zewiciye, li Qamişloyê rûdinê.



Keçikeke wê heye. Em nêzikî hev in.

** Ew jî bi muzîkê re mijûl dibe?*

Birûsk Şêxo: Na, ew bi mala xwe re mijûl dibe.

** Diya te çawa ye, çi dike?*

Birûsk Şêxo: Diya min jî li Qamişloyê ye. Diya min tehdâyî û êşayiyê ew xist, gelek zehmetî kişand.

** Emrê wê niha bûye çi qas?*

Birûsk Şêxo: Emrê wê derdora 50'yî ye.

** Dema bavê te çû ser heqiya xwe tu çend salî bûyî?*

Birûsk Şêxo: Ez heft salî bûm.

** Kedeke bavê te hebû ji bo doza kurdan, ji bo hunera kurdî. Ji bo gelek mirovan bûbû nimûne. Gelek însan di bin bandora wî de man. Bavê te bandora xwe li ser gelê kurd pêk anî. Mesela ez carekê ketim girtîgehê, li ber serê min du kasê hebûn; yek a bavê te bû, yek jî ya Şivan Perwer bû. Baş e, Birûsk tu dikarî ji hêla hunerê ve piçekî behsa bavê xwe bikî? Keda wî, kasêtên wî ka çi pê hat? Hûn li mîrata bavê xwe xwedî derdikevin?*

Birûsk Şêxo: Keda bavê min, hûn tev dizanin, ev pirs gelek caran ji min hatiye kirin, mesela Mihemed Şêxo ka ji ber çi ev tişt kiriye, ka ji ber çi wilo? Mihemed Şêxo êşa wî ya herî mezin Kurdistan bû û kurd bûn, bi cî bibin, azad bibin. Bavê min rojekê xweşayî di heyata xwe de nedîtiye. Yanî tiştê ku ez gihîştim ser, ser heyata wî dizanim ji min re tê gotin ji kesên wî, ji nêzikayiyên wî, ji mirovên wî, hin hevalên wî. Yanî Mihemed Şêxo bi hesret bû ku rojekê di nav hevalên xwe de rûnê, di nav dostên xwe de rûnê kêfê bike, eşqê bike. Mihemed Şêxo emrê wî 41 sal bû ji derdê Kurdistanê mir. Mihemed Şêxo digot ne eyb e meriv feqîrê

pera be, ne eyb e meriv feqîr be, meriv ne feqîrê heval be, ne feqîrê aqil be. Kurd tev lê xwedî derketin. Mihemed Şêxo heta niha nehat jibîrkirin û heta heta jî ez dibêjim Kurd nikarin tu carî jibîr bikin. *Kasêtên wî gava ku bifroşin û feydeyê jê bibînin gereke heqê zarokên wî jî neyê wendakirin.*

Ez ê niha kar bikim li ser vê mijarê, ez ê bipirsim ka kî şîrîtên wî difiroşe kî nafiroyê, wargehên wan ji ku ne, tomarkirina wan ji ku ye, kê heq daye wan. Ku bi riya zagonî difiroşin divê heqekî me jî tê de hebe, gava ne hiqûq be wilo bidin alemê meriv aciz nabe. Bi xweşî bidin alemê, kerem bikin meriv aciz nabe. Bes lê bû heq û hat firotin heqê me jî tê de heye.

*** Heta niha çend kasêtên bavê te derketin holê?**

Bîrûsk Şêxo: Sêzdeh kasêtên bavê min derketine holê.

*** Ew sêzde kasêt li ba te hene?**

Bîrûsk Şêxo: Li ba min in, mewcûd in li malê.

*** Tê gotin bavê te beriya ku here ser dîlovaniya xwe li ser gerîla, li ser têkoşîna Bakur kasêtek çêkiriye û dewleta Sûriyeyê dest daniye ser.**

Bîrûsk Şêxo: Dikana wî ya kasêtan hebû, (ew û mihafezeyê hasefiyê jê re dibêjin Mistefa Mîro). Tiştekî wilo ez dibêjim hebû bes dikana wî hikumetê girt. Ji ber çî kasêtê bû, ez biçûk bûm, ez heta niha nizanîm ji ber çî ye, ez dizanîm dikana wî girtin. Mesela dibêjin tiştekî wilo hebû. Rast e.

*** Bavê te li her perçeyî xebat dikir.**

Bîrûsk Şêxo: Ew li her çar parçeyan hebû. Ferq di neqeba kurdan de li cem wî tune bû, wek kurdên Tirkîyeyê, kurdên Sûriyeyê, kurdên Îranê, kurdên Iraqê.

Bavê min carekê diçe Beyrûdê. Wê demê Seîd Yûsif bû, Mehmûd Ezîz bû, gelek bûn li wê derê. Bavê min Mihemed Şêxo di wê demê de gihîşt wana. Pêşî wek stranbêj kar nedikir, bi sazê kar

dikir. Di nav Koma Serkeftin de salekê kar kir. Piştî salekê vegeriya Sûriyeyê, ji wir derbasî Iraqê bû, Li Iraqê şer şikest derbasî Îranê bû. Dema li Îranê bû di dibistanê de kar dikir, mamoste bû. Sala ku derbasî Kurdistanê Iraqê bû, hikumeta Sûriyeyê ew nefî kiribû, berdabûnê



Nesrîn Melekî

ji Sûriyeyê, mihacir bû, çû Îranê. Efû hat ji hikumetê û vegerandin. Bavê min di sala 1983'yan de vedigere Sûriyeyê.

*** Dayika te jî gelek eziyet kişand ne?**

Bîrûsk Şêxo: Eziyet ji gelek tiştan dikişand, eziyeta wê ji gelek aliyan ve bû. Dayika min beriya du salan, ev bîst û heft sal e li Sûriyeyê ye paseport îqama Sûriyeyê didinê, ji umrê min de yanê, 27 sal 28 sal in belkî çêbûye, beriya du salan ji zavê me re got kes li malê tune, lawikê min esker e, tu karibî bi min re bêtî sefareta Sûriyeyê ji ber ku ez ê îqama xwe çêkim, zavê me got mişkile nîn e. Pê re çû wê derê, ji îqamê deh roja qey îqama wê axirîbû piçkî, wê ji wir dibin du şevan dixin zindanê. Wê dixin zindanê, dibêjin "çima te Mihemed Şêxo kir?" Dayika min dibêje; "wa ye Mihemed Şêxo hejdeh sal e miriye herin ji tîrbê rakin jê bipirsîn ka çima te ji ber çî wilo kiriye. Piştî hejdeh salan min bigirin tîxin hepsê..."

*** Muzîkhez ji te, ji dengê te hez dikin?**

Bîrûsk Şêxo: Di warê şixulê min, di warê karê min de gelek ji min hez dikin. Alem dibêje kurên Mihemed Şêxo du heb in, çima nastrên, çima stranên wî nabêjin. Ji ber vî tiştî min rabû straneke wî çêkir, Azad e Şêrîn. Min jî vê stranê re klîbek da kişandin û bi pişt re şand ji televîzyonên kurdî re, ji MMC re, merivek li wê heye jê re dibêjin Rotînda, li klîba min temaşê kir û got min neeciband, stran erebesk e. Min got çilo yanî erebesk e, Erebian stranên wî kar dikin, dixwînin. Welhasil strana min neeci-bandin, gotin erebesk e û klîba min nîşan nedan.

*** Niyeta te ya çûndina Ewropayê heye?**

Bîrûsk Şêxo: Gerek ez sersalê biçim, serê sala bê. Ez ji Qamişloyê naçim derekê, lê ji bo kar ez ê biçim.

*** Di warê muzîkê de hedefa te çî ye?**

Bîrûsk Şêxo: Ez dixwazim di warê muzîkê de bibim stranbêj, ku karibim stranên bavê xwe bi cî bînim, karibim stranên wî bibêjim. Min straneke wî çêkiriye, strana Azad e Şêrîn, min jê re klîbek jî çêkiriye. Ez ê muzîkê bixwînim, ez dixwazim bigihêmerheleyeke pir baş di vî karî de. Ez dixwazim piyano bixwînim a niha. Ez hem dixwazim bibim aranjor, hem jî mamosteyê muzîkê. Min beriya niha li cem Doktor Mihemed Zaza xwend. Ez ê îcar zanîngehê bixwînim.

Têbînî: Ev hevpeyvîn di Netkurdê de jî hatiye weşandin.

Dema mirov vî camêrî guhdar dike "dil" kirasê evîne li xwe dike, dema ev camêr distrê mîna dilê mirov bidin ber qevdek gihayê

Tîprêziya Erebi û Wergera Kurdî: Seyîd Faysal Moctevî / SINÊ

[illegible]

مفتی محمد رفیع الرحمن صاحب مدظلہ العالی

ماہنامہ نگار گنہگار - خیابان دکن، لاہور
 جی ایس آر خیابان، مٹرل حسین عقیق
 محمد شفیع

----- 0 -----

Hacî Eşrefiyan- mala Husên - Memekanî *Mihemedê Şêxo*

Nalîna axa bi şewat: “Mihemed Şêxo”

Mehdî Mutlu

geznokê... Dema ev deng tê guhê mirov dibe êş û jan. Tayek li mirov bela dibe; mîna taya mehên çile... Tayek wisa ye ku dil dikelîne, lê laş dicemidîne... Rondikan ji çavan dibarîne; derd û kulan ji dil dertîne...

Dema dibê; *“dinya bu bihar xunav hate xwar, li ser geya û gul cejna dost û yar”*

Siruşt xwe bi rengên biharê dixemilîne, xuşexuş bi newal rûbar û kaniyan dixîne, evindaran li qadên seyranan dicivîne, sibatoka bê oxir ji xaniyê kurdan dicehimîne...

Dema dibê; *“xem û xeyalê te ez revandim çol û belana te ez gihandim”* dilgirtiyan dike wek perperokan li dora çirayan digêrîne, perê wandişewtîne. Dide ber bayê ecem xwelîşora wî bi ser Cûdî û Şîpan ve diweşîne...

Dema dibê; *“Pêşkevin em serfiraz in mîletê kurdî yan mirin em dê bibînin yan jîna kurdî”*

Hêz dide cotkar û xebatkaran... hêviyên wan ji bin axa bêrehm derdixîne. Şûrê gelê bindest li hember dijminê kedxwar dibiriqîne...

Dema dibê; *“dîsa li min awir kişand yarê bi wan çavên belek/ birca dilê min hilweşand / ez kirme nêw çerxa felek”*

Bi tîrên Tîrêj û bi bijangên mêrkuj aşiş di nav xwîna sor de digewizîne, ji bo nêrîneke bedew mirinê li ber çavên wî piçûk dike ku ew wî nahesibîne ...

Dema dibê; *ey felek ka ew sera û birc û qonaxê di min ka rez û bistan û dar û kanî ew baxê di min”*

Bêhna xwe li feleka kor teng dike, qelenê welatê mîna bûka serbixêlî distîne, qeqeq û dengê kewan li ser lat û çiyayan derdixîne Cegerwxîn pê dihesîne...

Dema dibê; *“destê min bigre pir xweş e cîhan, da em derkevin serê van çîyan”*

Mizgîniya xêrê li ezmanê reş digêrîne, ji bo tunekirîna zilm û zorê şêr û pilingan bi aliyê jor ve, bi çiyayê bilind ve dişeîne...

Dema dibê; *“Rabe rabe pismam rabe mamo ji xewê rabe, rabe xew ji me re nabe”*

Gundiyên li bin siya dara gûzê razane vediciniqîne, tevr û bêrên wan dide ser milên wan tov davê beyarên wan, devê dijmin û

xêrnexwazên wan li wan dijdîne.

Dema dibê; *“heps û zindan kûr û tarî xewa min nayê ji eşq û evîna gulê ketime belayê”*

Dibe fîgana Mem di zindanê de xewa wî diherimîne. Bi wê sewta bi şewat kezêba Zîna qeşeng dipertîne, pênivîsa Ehmedê Xanî li ser rûpela spî diherikîne...

Belê, mirov dikare hunermendê nemir wiha bîne ser ziman ji bo mirov behsa wî bike ne hewce ne peyv û hevokên zêde. Jixwe ew di nav van gotinên kûr de dengê xwe yê *bas barîton* dide sehkirin. Stranên ku dibêje zêdetir ne yên wî ne lê bi deng û şîroveya xwe ew stran kirine yên xwe.

Mihemed Şêxo: Xîzan bû, bêkes bû, nexweş bû lê hunermend bû; Mihemed Şêxo, ne bi tenê hunermendê malbata xwe û navçeya xwe bû, nalîna welatê xwe zimanê gelê xwe bû. Di her kevîr, lat, çiya, mêrg û kaniyên welatê wî de rengên dengê wî heyê; bêhna dengê wî, ji hemû beybûn, nêrgîz, rihan û sosinên welatê wî tê. Û ji her tiştî bêhtir Mihemed Şêxo kurd bû kurdekî Kurdistanî...

Roja wî ya dawîn serî lê derxist. M. Şêxo koç kir. Dirêj bû qama wî. Hema bêje 2 mîtro. Tabûteke ku tê de bi cih be peyda nebû lingên wî li derveyî tabûtê man. Li ser milê deh-hezaran bi aliyê goristanê ve çû... Wek hezkirina wî ya mezin ku di dilê kurdan de bi cih nedibû; qama wî jî, di tabûta wî de bi cih nedibû.

Digot; *“Gava ez mirim gelî zindiyên min neveşêrîn wekû hemiya gorit min çêkin bin siha çiya”....*

Kurdan wesiyeta wî bi cih anîn. Ew weke hemûyan di bin axa sar de veneşartin; ew di şikeftên dilê xwe de veşartin û xweliya bihuştê li ser kirin, li bin siya çiya. Navê wî bi tîpên zêrîn nivîsîn li ser zinar û baniyan...

Gora wî, dilê hemû kurdan e... Dengê wî dengê hemû kurdan e...

mehdi.mutlu@hotmail.com

Dema ku min xwest li ser M. Şêxo binivîsim; tenê meth û sena hatin bîra min û min biryar da ku pesnê hunermendiya M.

Awaza evîndariyê û dengê yekîtiyê; Mihemed Şêxo

Mizgîn Dîlan

Şêxo bidim. Carna meriv ji hin nivîsên ku bi meth û senayan dagirtî ne aciz dibe û naxwaze bixwîne. Lê ji bo kesên ku wek stêrkan in, evîndarê karê xwe ne û karê xwe bi dirustî pir baş dikin, ev yek derbasdar nîn e. Loma jî, min biryar da ku bê tirs û fikar li ser M. Şêxo nivîseke bi meth û senayan dagirtî binivîsim...

M. Şêxo, di nav hunermendên kurd de, bi stîla xwe, bi deng û tembûra xwe kesekî bi tenê ye... dibêje û dibêje... Di stranên M. Şêxo de, hestên ku ji kûrahiyê derketine û gihîştine asîmanan hene. Dema ku mirov guhdariya dengê wî dike, mirov dibîne ku hestên mirov bilind dibin û digihîjin awaza Şêxo. Nizanim çawa? Lê mirov dibîne ku dengê wî gazî mirov dike, ramanên mirov şiyar dike, digihîne warên dûr... Dema dibêje "Xem û xeyalên te ez revandim" mirov dibîne ku wa ye mirov li çol û çiyayan dibeze, xeman bi bayê re berdide û xeyal dibin rastî... Dema ku dibêje "Agirê derdê te îro sotime wek perperîk", awaza wî dibe agir û hebûna meriv dibe perperok... Dişewite dişewite...

Dengê wî wek çiyayan bilind, wek deryayan kûr e... Dengê wî wek çar parçeyan birîndar e, dinale, diqîre digihîje birînan û dibe şîfa. Dema dibêje "Ay lê gulê gula min î / Şêrîna li ber dilê min î / gulê nadim bi malê dinê / li ser gulê tîm kuştinê" rengê evîna wî ya ji bo welatê wî diyar dibe... Em dibînin ku ji bo M. Şêxo gul welat e... û M. Şêxo baş dizane ku tenê evîna ji rengê evîna bilbil a ji bo gulê, dikare bibe evîna welat... Em dibînin ku M. Şêxo evîndarê welatê xwe yê ji rengê gulê ye û ji bo welatê xwe yê gul dişewite, janê dikişîne, têdikoşe... Ew bi taybetî helbestên li ser welatê xwe hildibijêre û bi awaza xwe ya xweş vê yekê pir baş tîne ziman. M. Şêxo, evîndarekî rastîn e... Bedela evînê pir baş



dizane... Helbestên giranbuha hildibijêre, dike stran û dibêje.

Di dengê wî de dîroka têkoşîna gelê kurd a li Başûr tê dîtin... Di stranên wî de xwezaya Kurdistanê bi nav û cihên xwe tê nasandin û em diçin çiya û geliyên welatê xwe... ji çend stranan hin mînak:

"Cana min cana min / tu yî êş û jana min / Kî zane ez kî me / bê te çi ye mana min / Hemrîn û delalî Mihabad û Wana min..." Strana "Kedera Min çendî ciwan e ji rengê gul e"..." Bilind e bejn û bala te / li ser taca te ezman e" û ji gelek stranên din mînakên bi vî rengî...

Em di stranên wî yên bêhejmar de hestên xurt dibînin. Lê carna gazinan ji felekê dike û wiha dibêje:

"Ey felek bo te dinalim / bo çi nêrgiz çilmisîn / ew çima bextê me wa ye / Em bê dost û bê kes in" Lê navê keça xwe datîne Felek! Ez bawer im hunermendê hêja û nemir bi vê yekê dixwaze rastiyeke nîşanî me bide. Rastiya ku; felek em bi xwe ne û em çawa tevbigerin dê wisa were pêşiya me... gelo dibe ku ji ber vê yekê ji xwe re gotibe *Bavê Felek?* Dibe ku ji ber navê keça xwe ji xwe re wiha gotibe û dibe ku ji ber têkoşîna xwe ya bi

felekê re ku tê de bi hunermendiya xwe ya bêhempa biser ketiye ev nav li xwe danîbe.

Rastiyeke ji bo tevahiya hunermendan heye ku çend stranên wan heta gelek stranên wan ên ku nayên ecibandin hene. Lê ji bo stranên M. Şêxo ev derbas nabe. Nizanim ji deng û şêweya wî ye, yan jî birastî tevahiya stranên wî xweş in loma? Di her straneke wî de xweşiyek cuda heye. Dema dengê M. Şêxo tê guhê mirov, mirov diçe bilindahiya çiyayan, pêlên deryayan û dengê ava çem û kaniyan... Bi taybetî jî, di dema rêwîtiyê de, dengê M. Şêxo bêhemdî çavên meriv li derdorê digêrîne, her derê ji nû ve bi mirov dide dîtîn. Tiştên ku me di rêwîtiyên xwe yên heman cihê de nedîtine em dibînin... Yanî hunera wî xîtabî tevahiya hebûna mirov dike û bi xwe re dibe hey dibe.

Pir balkêş e; hunermendê hêja strana bi navê "Gava ez mirim" dibêje ku di wê stranê de wiha tê gotin "Hemû adaran hûn min şiyar kin" û ew bi xwe di meha adarê de wefat dike. Wekî din hin rewşên balkêştir hene ji bo wî. Berî çar salan bi wesîleya salvegera wefata wî di qenaleke Başûr de, bername hatibû çêkirin. Di bernameyê de hevala wî Nesrîn diaxivî û behsa destpêka nasîna xwe ya bi M. Şêxo re dikir. Pir balkêş bû ku wê M. Şêxo cara yekem di xewnê de dîtibû. Nesrîn wiha digot: "Şevê min di xewna xwe de yekî ku bejna wî pir dirêj bû dît. Ez di xewna xwe de difikirîm min digot kesekî wiha dirêj li van deran tune ev kî ye gelo? Dû re sibetirê em çend keçikên xwendekar li dibistanê bûn. Me dît mamosteyê me hat û kesekî bejindirêj pê re ye. Min çawa ew dît, min ew nas kir. Kesê ku hatibû xewna min ew bi xwe bû. Min bala xwe dayê min dît bala wî jî li min e. Hat ba min sekinî û ji min pirsî got "Tu kurd î?" Ji ber ku di dibistanê de kurd tune bûn, pirsê wî bala min kişandibû. Min got belê ez kurd im û min got te çawa zanî? "Got ji çavên te diyar in. Ez kurdan ji çavên wan nas dikim." Bûyereke bi vî rengî jî di pêveka A. Welat, Tûrik de derketibû. Yê ku xwendibin dê were bîra wan. Ew jî dîsa xewn bû û di xewnê de nîşaneyê M. Şêxo hebû.

M. Şêxo... Dengê dilê kurd û Kurdistanê... Awaza evîn û evîndariyê... Bilbilê xemgîn û xemrevîniyê... Strana dilê zindî û kuştiyan... Pêşmergeyê çar parçeyan...

M. Şêxo... Ronahiya xewna dayika xwe... Xewna Nesrînê... Bavê Felekê... Hunermendê bi qasî welatê xwe bedew...

Belê, M. Şêxo hunermendekî bêhempa ye. Wek asîmanan bilind, wek ava çem û kaniyan zelal û paqij e... Evîndarekî rastîn e... Di agirê evîna Kurdewariyê de dişewite dişewite... Lê, şopa evînê bernade û bi dengê xwe, evîna xwe li tevahiya welat belav dike. M. Şêxo Hunermendê kurd û Kurdistanê ye... Lê mixabin temenê wî tîra serpêhatiyên nû yên welatê me nake û ji ber wê jî, gelek bûyerên ku bi lehengiyên bêhejmar hatine afirandin bê nav û nîşan, bê stran û dengê wî dimînin.

Niha dixwazim straneke M. Şêxo ya di kasêta bi navê 'Nesrîn' de ku tê gotin, gotinên wê yên Bêbihar in. Lê Nesrîn dibêje gotinên M. Şêxo ne, bi me bidim guhdarkirin:

Heps û Zindan...

Heps û zindan kûr û tarî xewa min nayê

Ji ber eşq û evîna gulê ez ketime belayê

Gula min vebû bêhn dabû serê çiyayê

Min digo gulê were vir go ez bêtewext nayê

Gula min kesk û sor heyran gula min geş e

Gula min bi xelqê tal e bi min pir xweş e

Dinya li ser me ron heyran wext li me reş e

Dest ji gulê bernadim ku xwîn bimeşe

Gula min rengîn e heyran gul sor û zer e

Heps û zindan tê de ez riziya gulê bê xeber e

Gula min bindest e heyran bi kul û keser e

Dest ji gulê bernadim can didim li ser e

Gula min tu xeyîdî min guneh çî kir

Te ji min re çî gotibû min bi can û dil dikir

Mal û can dabû ser heyran gelek hindik kir

Rêka me gelek dûr bû va eşqê kin kir...

Piştî salên dûvedirêj ji penaberî û zilm û zorê dîsa di sala 1982'yan de vegeriya warê

Xwedîderketina li miriyan

Rizoyê XERZÎ

xwe rojavayê Kurdistanê. Li Qamişloka xew-nên xwe vegeriya û hewl da ku jiyana xwe li wir berdewam bike. M. Şêxo wekî hemû pêvajoyên jiyana xwe dîsa di nava feqîrî û xizaniyê de dest bi jiyana xwe kir. M.Şêxo ji bo ku xwe xwedî bike ji neçarî hewl da ku biçe li şahî û dawetan stranên xwe bibêje û xwe bi wan pereyan xwedî bike. Bêguman gelekî zor bû ji bo hunermendekî wek M. Şêxo piştî salên dûvedirêj ji kar û xebatên hunerî û kurdperweriyê ku çanda dawetan bi hemû rengê xwe yên paşverû qebûl bike.

Wekî mînak di dawetekê de dibû ku xortekî 14 salî jê re bibêje govenda xurfanî sê saetan bê rawestan li ser hev lê xe. Piştî demeke kurt M.Şêxo êdî nema dawet qebûl kirin û bi alîkariya malbata xwe ji xwe re dikaneke kasêfiroşiyê vekir. Navê dikana xwe kir Felek. Lê piştî demeke kurt hêzên ewlekariya Sûriyeyê dîsa feleka wî çep gerandin û dest danîn ser hemû kasê û amûrên wî.

Bêguman jiyana M. Şêxo pir berfireh û zengîn e lê tiştê ku ez dixwazim li vir behs bikim aliyê xwedîderketina kurdan li hunermendan e. Gelo çima em di saxiya Mihemed Şêxo de xwedî lê derneketin. Piştî mirinê gelo êdî tu wate ji vê xwedîlêderketinê re dimîne.

Ez dizanim ku li Rojavayê Kurdistanê tu sazî û dezgehên kurdan tune ne. Lê ez baş dizanim ji ku zêdeyî 13 partiyên kurdan li wir hene. Ji bilî vê yekê li Qamişloyê bi tenê bi kê-

manî 1000 doktorên kurd hene. Bi kêmanî 2, 3 nexweşxaneyên kurdan li Qamişloyê hebûn. Mixabin kesek an partiyek li vî hunermendê xwe xwedî derneket. Mixabin û sed mixabin Mihemed Şêxo di nexweşxaneyê dewletê de mir. Bêguman kesê ku ne ji Rojava be nizane nexweşxaneyê dewletê çi ye û tê çi wateyê. Li Rojava ji ber ku doktor û derman ne buha ne her kes diçe nexweşxaneyên taybet. Tenê kesên hejar û perîşan û yên geza nanê wan di mal de tune be ew diçin nexweşxaneyê dewletê. Bi gotineke tenê ez dikarim bibêjim ku mirina Mihemed Şêxo di nexweşxaneyê dewletê de wê bimîne şaneke şermê li ser rûyê rêxistin û doktorên kurd ên Qamişloyê. Di dema dawîya jiyana wî de ez gelek caran bûm şahidê vê gotina wî: *"De ka em ê vê stranê jî bêjin bê ka çawa dibe"*. Yê ku Mihemed Şêxo di şevbêrkên wî yê malê de dîtibe dema ku ûd dixiste himbêza xwe û stranên xwe bi melûliya rewşa xwe û şêniya gewriya xwe digot, bawer nakim ku êdî tu caran ew tabloya hunerî ji dil û mejiyê wî derkeve.

Erê Bavê Felek zordariya serdestan, îşkence, zindan, koçberî, xerîbî û penaberî têra têkbirina te nedikirin û nikaribûn piştî te bi-tewînin. Lê me bi hemû hêza xwe alîkariya wan faktoran kir û bi wan re em tev li te bûn yek. Te digot ey felek bo te dinalim em bê dost û bê kes in lê te tu caran bawer nedikir ku em ji bi felekê re li te bibin yek û em ji te re nebûn kes û dost. Piştî koçkirina te ji ew meşa bi heybet a ku ji alî gel ve bi xweber hate lidarxistin ji têra axîneke te nake Bavê Felek, siwarê hespê azadiyê, yê ku li hember hemû zordariyan tu caran nelikumî.



Çend stranên Mihemed Şêxo digel notayan

Sedran C. NEWADAR

AY LÊ GULÊ

Mûsîqî: Fîrên E. Şêxo
Reng: Fîrên E. Şêxo

AY LÊ GULÊ

Ay lê gulê gula min î
 Şêrina li ber dilê min î
 Gulê nadim bi malê dinê
 Ez li ser gulê tîm kuştinê

Gulê kesk û sor û zer e
 Nigana alê li ser e
 Êdî reng sipî gewher e
 Şêrin û peymanê min î

Rengê te yê pîr delalî
 Bîlîlî li ser te dinalî
 Te nebînim bi vî halî
 Armanç û kedera min î

Zordar dibê ez gulî nadim
 Ez ê zend û bendan badim
 Ez ê keltî û sera radim
 Azad dibî bi şoreşa min î

Bi xwedê ez pismamê te me
 Bi sûnd û pesindarê te me
 Ser ceng û hewarê te me
 Qelenê te bi xwîna min î

DUNYA BÛ BIHAR

Milovanê 1354

dîn-îa bûn be hata f ca bûn bûn be hata
 bî wî zî yîm zîyîm f dî-îa dî-îa bî yîm

DUNYA BÛ BIHAR

Dunya bû bihar
 Xunav hate xwar
 Li ser giya û gul
 Cejna dost û yar

Neçe seyranê
 Bejn û rihanê
 Soz û qirarê te kanî
 Gula dîlanê

Nehate ba min
 Şeng û zerya min
 Agir berda dîlê min
 Yara min ew bû

PÊŞKEVIN EM SERFIRAZ IN

Gelîya: M. Ebuşîrî Nami
 Asayîs: Mîrwan Şêrî

Pêş-ke-va em ser-î- ra- zî mî- le- nê kur- di
 Yan- mî- rî- nî em dê- bî- nî nî- yan jî- ra kur- di
 Yan- mî- rî- nî em dê- bî- nî nî- yan jî- ra Kê- di waa... mî- le- nê kur- di
 Kur- di waa... mî- le- nê kur- di

PÊŞKEVIN EM SERFIRAZ IN

Pêşkevin em serfiraz in mîletê Kurdî
 Yan mirin em dê bibînin yan jîna Kurdî
 wa mîletê Kurdî

ala rengîn bo te deynim ger ser bîderd im
 ger nekîm bê tu bizane ku ez ne Kurd im
 wa mîletê Kurdî

xwendevan im û xwendegêh im bê al û leşker
 dê bijî paşê bizanî rêçê bibî ser
 wa mîletê Kurdî

Kurdistan êdî menal e lawên te hatin
 Xwendevan xwînfiros in axa welat in
 Wa mîletê Kurdî

Mal û dil û çan bi carek bo te fîda kim
 xwîna xwe paqî dirêjim bin destî nakim
 wa mîletê Kurdî

EZ KEÇ IM KEÇA GUNDAN IM

Gelelîs Ezdîkîs Serê
Awanîs Rihana Rez û Çemanîs



EZ KEÇ IM KEÇA GUNDAN IM

Ez keç im keça gundan im	Delalê tu xwîşêrîn î
Kulîlka serê lawan im	Dil wekî lêv hinguvîn î
Rihana rez û çeman im	Tu'j xortan gava min dibîni
Lawiko ez birîndar im	Bêriyê ez evîndar im

Lawiko evîni şerm e	Delalê bejn rihanê
Gelekî bi tirs û zehm e	Kulîlka heyva gulânê
Evîni guneh e li cem me	Bizane xweşiya jiyân î
Lawiko ez bêrîvan im	Bêriyê ez evîndar im

Lawiko were mala me	Delalê bêje bayê xwe
Min bixwaze sehke kula me	Min bide û dewlet serê xwe
Gustîlkê bike tîla me	Qayîlke delalê dilê xwe
Lawiko ez bêrîvan im	Bêriyê ez evîndar im



Dîroka Wêjeya Kurdî

"Ji bo wêjeya kurdî ya bi sed salan hatiye inkarkirin û talankirin bi vê berhamê nemir bûye û giheştîye formatekê. Di pirtûkê de kesên sereke yên wêjeya kurdî yek bi yek, bi dema ku jiyane û berhemên wan û afirandinên wan tev di nav vê berhemê de cih girtine." (Şefîk Beyaz)
"Ew mîna stêrkek geş û ronîdar bû, di asomanê wêjeya kurdî de. Zanyar, rawşenbîrek agahdar bû, di asoya ziman û çanda kurdî de. Ew parêzerê dîroka kurdî ya kevnare bû." (M. Reşîd Irgat)



Ji erebî pirtûkeke dîrokî wergerê ya nû (M.S.815-1515)

Pirtûka teza doktorayê ya Dr. Muhammed Yusuf Xandur ku li Zanîngeha Beyrûdê Mamoste ye ji aliyê nivîskarê me Dr. Fadil Bedirxanoglu ve ji zimanê erebî ji bo tirkî hate wergerandin. Di pirtûkê de di navbera salên 815 û 1515'yan de şer, talan, qetliamên ku hatine kirin tene ravekirin. Her wiha, rewşa Kurdistanê û gelên ku li herêmê dijîn ya wê demê jî tê ber çavan. Di demekê kin de ew ê wergera wê ya ji bo kurdî jî ji aliyê Dr. Fadil Bedirxanoglu ve bê kirin. Pirtûk 384 rûpel e.

Zezeba Agirê Har Hogir BERBIR

Pirtûka Nivîskar Hogir Berbir a duyemîn bi navê "Zezeba Agirê Har" ji nav weşanên TEVNê derket. Di vê pirtûkê de 14 çîrok cih digirin û her çîrokek serborîyeke rasteqîn bi xwe re rave dike. Her çîrokek bi navê xwe yê xweser, mîna "Zezeba Çarşema Reş Dibariya, Jinek Kurd a Leheng, Rêwiyê Rêya Dûvdîrê, Rojek li Pîran, Zezeba Xewneke Sersem, Şehîdê Werzîşê, Deng Nebihûrîne, Her Lehengek Gulek Bihîştê ye, Dara Miradan, Zezeba Girîneke Bêhêstir, Evîneke Trajîk, "Kes Nikare Roja Me Tarî Bike", Aştî bi Serket û Destana Lawê Rojê" pêk tê. Bi tevahîya çîrokên ku di pirtûkê de cih girti re navê "Zezeba Agirê Har" li xwe girt.

"... Di vê pirtûkê de ew xezeb hatine honandin, lê tenê xezeb na, her wiha hêvî, hêviya rojên xwes jî hatiye honandin. Nivîskar xwestîye ku çîrokan binivîse û bi qasî hêz û zanîna xwe bibe şahidê dema xwe. Lê tiştê ku hatine nivîsandin tenê çîrok nîn in. Di heman demê de serpêhatî û bîranîn in jî. Dê xwendekar bi xwe jî vê rastiye bibînin. Dibe ku heman bûyer hatibin serê gelek ji we xwendekaran. Lewra ew pêvajoyên hîna jî didome... Hinek bûyerên ku nivîskar hilgirtiye dest bîst-sî sal berê qewimîne, lê di mejiyê me de wisa cih girtine ku mirov dibêje qey duh-pêr qewimîne..."

(Ji pêşgotina pirtûkê)



Ji nivîskarê me Ronî War 'GURZEK ÇÎROK'



'Gurzek Çîrok' derket û cihê xwe di nava pirtûkxaneya kurdî de girt. Pirtûk ji 30 çîrokan pêk tê. Çîroknûs Ronî War piştî pirtûkê "Jiyan jê difûriya", "Bê lome be" û "Hemû çîrok in (ji tirkî werger)" niha jî bi pirtûka "Gurzek Çîrok" derket pêşberî xwendevanên kurdî. Pirtûka

"Gurzek Çîrok" ji nav Weşanên Bîrê derketiye. Di pirtûkê de 30 çîrok hene û pirtûk ji 95 rûpelan pêk tê. Di "Gurzek Çîrok" de nivîskar bi stîleke xwes û bi zimanekî zelal psikolojiya lehengên xwe û civakê di nava tevna çîroka de dihone. Pêr, do û îro li hev dibanîne û minakên çîroka nûjen diafirîne. Di van çîrokan de bi ruh, hest, mêjî, hêvî, xem û serpêhatiyên lehengên xwe xwendevan li nav dinyaya civakê jî digêrîne. Lihevnekirina lehengan a bi civakê re û pirsgerêkên wan ên bi hev re dirêse û bi zimanekî zelal di çîrokên xwe yên cihêreng de li pêş çavan radixe.

Pirtûkeke herî kevn a li ser Selaheddîn

Siltan Selaheddînê Eyyûbî

Îbnî Xelikan

Kitêba Îbnî Xelikan yek ji kitêbên herî kevn û biyografiyê girîng a Selaheddînê Eyyûbî ye.

Selaheddîn yek ji girîngtirîn mirovê tarîxa dinyayê ye. Ev fikra mustereke a gelek zana û pisporên rojhilat û rojavayî ye. Mora xwe li mîlennyumê daye. Tevî ku di ser dema wî re 800 sal derbas bûye jî, li dinyayê û Kurdistanê hê jî pir aktuel e. Li dinyaya modern, bi taybetî di lîteratura ewropî de gelek nîqaş li ser tîr kirin, bi sedan kitêb û nivîs tîr nivîsandin, pêşengeh û albûm çêdibin. Dinya, wî bi şeweyên nû û cihê dixwîne, tarîf dike. (.....) Di gelek nîqaşên li ser Selaheddîn û dema wî de, behs dibe ku, her çiqas ne di maneya îro de jî be, dîsa tu statuya kurdan nebû. Kurd tenê esker bûn. Her weha ciyekî ziman û kultura kurdî jî nebûye. Tiştê balkêş ew e ku piştî Selaheddîn bi sedan salan jî dîsa ew rewş nehatiye guhertin. Hê jî bi kurdî, mebesta min kurdiya Bakur e, ne lîteraturek, kitêbek berbiçav li ser Selaheddîn tune. Ne tenê di vê mijarê de bi giştî jimara lêkolînên muteber, werger an telif, di kurdî de jî tiliyên destekî ne zêdetir in. Heta kurdî di hemû qadên jiyana de, bi her şeweyî neyê bikaranîn, wê di bin talûke û tehdîdê de be. Yek ji armancên herî girîng a van lêkolînan ew e ku kurdî bibe zimanê fikrî, platformek nîqaşê çêbibe, bi "zimanê malê." Ji bo ku kurdî bibe xwedî statuyek, divê pêşî kurdîxwêr wê qîmet û girîngiyê pê bidin.

Lêkolînên ku ji zimanê eslî tîr wergerandin, eger karibin piçekî jî rê li ber merhaleyeke nû vekin, armanca weşana wan wê pêk were. Xwediyê van kitêban tenê xwendevan in. Hêza xwendevanekî tîgihîştî jî hêza rêxistin û partiyan mezintir û zêdetir e, ji a hikûmet û devoletan jî ne kêmtir e. Ew hêz û bawerî ye ku ew kultur û ziman gihandiyê îro. Em bi hêvî ne ku xwendevanê kurdî, perdeyeke tenê û jîbirkirinê nakîşîne ser van xebatan. (Ji pêşgotina pirtûkê)

